

# DUGIR

HEJMAR 4, 1996, HER SÊ MEHAN CAREKÊ DERDIKEVE





# DUGIR

HEJMAR 4, 1996, HER SÊ MEHAN CAREKÊ DERDIKEVE

KOVARA KURDÎ LI DEVEYÎ WELÊT  
EV KOVAR LIGOR ALFABE, VEKÎT Û RÊZIMANA  
MÎR CELADET BEDIRXANÎ DERDIKEVE

## XWEDÎ

Kawa förlag

Berpirsyarê giştî  
Dr. Saîd Mele

Birêvebirên kovarê  
Ehmedê Huseynî  
Zagrosê Hajo  
Yehyayê Yûsif

Berpirsyarê hunerî  
S.Rêzanî

Ahonetiya salekê  
150 SKR

Adrês  
DUGIR  
Box 3437  
165 23 Hässelby  
SWEDEN

Tel/faks  
46(0)8-383934

Postgiro  
692357-7

ISSN: 1400-5913

## NAVEROK

- 3 Pêşgotin  
4 Hamid Bedirxan, M.Efîf / Ehmed Huseynî  
9 Nivîskarê kurd, çanda kurdî û pirsra  
nasnameyê, Hendrên  
16 Xwedîkirin û guhdana zarokan di  
civata kurd a kevin de Rezo Osê  
32 Hunermend Xelil Ebdulqadir  
34 Ey êvar pir xweşe, Mela Bekir  
36 Mêrava pîroz, Resîd Beîrê  
37 Zimanê me, Sebri Botanî  
38 Bîranîna Namî  
52 Derdo siyasî ye, Silêman Elî  
54 Xwekustîna nameyekê, Şahînê Bekirê  
Sorekî  
56 Goran bikole (Cibran Xelil Cibran)  
60 Mele Selimê Bedlîsî, S. Borekar  
68 Aliyê çarşemê, M. Elîf Huseynî  
76 Romana kurdî ya Nûredîn Şemîdîn  
(Zeviyên Soro), Azad Ehmed Elî  
72 Kêzika Fîratê Cewerî, Mîsto Mîsto  
79 Dewleta Dostîkî, Fehed Mustefa

## Pêşgotin

Em dê ji kîjan xwînê; ji kîjan birînê, ji kîjan sosret û matmayînê dest bi çiroka te bikin ey welatê persikestî!

Ey welatê kaviîl û goristanan!

Ey welatê kuştin û serjêkirin û wêrana ebedî!

Ey dijminê serê xwe!

Ne derya xwîna te razanê dipejirîne û ne jî pêlên xwe yên hovane ji ser peravên xewna sêwîmayî, vedikişîne.

Xwîn e welato!

Roj bi roj çemê xwîna te mezintir dibe û kulîlkên peyvê li ser termê te diçelmisin.

Ewrên te bê baran in..

Bagerên te bê çinînin..

Berbangên te bê çurisînin..

zeviyên westyayî hildiperikîn bejna şîniya te,

pêjna bareşa giran û sergêjahiya hespên te; hemî rûpelên weryayî yên tenhatî û serhişkiya bihokên te; ber bi derya xwînê de, bê tembîname, bê qublename, diçin. Diçin û hevîrtirşê xewnê di şaneyên xwîna me de tîrştir dikin..

Diçin û têkçûna te di hişê hebûna me kûrtir dikin..

Diçin û bîna mirina te yî rojane di ferhenga mirovatîyê de tûjtir dikin..

Diçin... Govenda te neviya kuştinê ye.

Stîrana te dilsojiya giryanê ye.

Tu yê çawan xwe, çawan me ji vê labîrênta kovanperest rizgar bikî ey keriyê bêşivan!

Peyvên te wisa erzan li ber bê diçin.

Çirên te wisa zelûl bê xaçerê dişikîn.

Sozên te wisa bêkêr. sînorên te asê,

ne tu toza bîranînan ji ser çavên xwe dadiweşîni.

Ne tu jî rûreşîya dîroka xwe fedî dikî.

Û ne jî tu (nema) dibî dijminê serê xwe.

Halan e welato!

Hevkêşa kurdên sedsala bîstan e.. Guman e welato!

nav in, sirûd û êvarên xav in, bêdengî û xweîl û demsalên bêgav in..

Şevistan û rêçên bêbiryar in, bajarên dorpêçkirî, nîveroja kelegirî, û dawîya te her destpêk e. Xwîn ji xwînê derdiçe. Kî jî kînê diafire.

Jidayîkbûna te mirin e.

Mirina te jî di çêşnê tinazîyê de ye!

Dugir

# Hamid Bedirxan Û mirina helbestvanekî

M.E.fif Huseynî

Ehmed Huseynî

**D**i sala 1960 î de, rê ji Helebê ber bi Şamê ve , rêçeke nû çêkirî, dihate qelaştin. Rê, bi renckêşan û bi xwêdan û bi westana mirovan dihate nijinandin; mirovên ku bi giraniya demê, ku bi axînkêşana salan û bi pîkolî û perîşaniyê piştixûz bûbûn. Çend zilamên bejin bilind, kevir û keserên xwe li ser devê wê rêça nûçêkirî, hetanî ku ji wan dihat, bilind dikirin. Dema ku bîna xwe berdidan û xwêdana eniyên xwe bi zendikên şilbûyî, paqij dikirin, dema ku xwarin dixwarin û ava germ ji

galonên zingargirtî vedixwarin, wê gavê, di wê kêlîka serberdayî de, mirovekî çel salî hîn dibû dê çawan dengê kenê xwe bilind bike û dê çawan bi awakî ciwantir û şêrîntir jiyane bîne bîra xwe:

*Em wek ronahiyê bûn...*

*Em wek avan bûm*

*Wek tava rojê li ser rûbarî, bûn...*

Bi şewat hilm li cigarê dixist û bi hêrs dûmana wê dikişand kezeba xwe. Çend ziman jî bikar tanîn. Zimanê N. Hikmet û zimanê Aragon, zimanê S. Şîrazî û zimanê Mûtenebî û Adonîsî, Lê zimanê zikmakî yê ku ji agirê xetîreya Mîdyayê hatiye aferandin , zimanê Siyamend û Xecê, zimanê Herîrî, Cizîrî û Xanî, her û her, di xuşîna xwîna rehan, di jena dil de dihêwirî.

Mirovekî bejindar bû, helbestvan bû, ango Hamid Bedirxan bû!

Wê çaxê, li Sûryayê, helbesta erebî di qonaxeke nû re dibuhurî, di warê nivîsandina helbestê de ziman û formeke nûjen peyda dibû. Yan jî helbesta lêvikî dihat damezirandin. Hamid Bedirxan jî ala nûneriya vê helbestê bi xwe bilind dike. Jiyana xwe, bîranînên xwe, gundê xwe "Şiyê" yê ku di nav darên zeytûnan de û di nav



*Helbestvanê kurd  
Hamid Bedirxan  
di sala 1944an de  
li cîyayê ku niha  
Erdên li gerdê  
Siyê li dayikê bibe  
ji bo mîsanderê  
helbestan, zîwanê  
Erebî, Tirkî, Fransî  
û  
Kurdî bi kar tane.*

*Di 746 Gulana  
1996an de dile wî  
li nexweşxaneyê  
radweste.*

stiranên kurdan ên kevnare de hatibû xeniqandin, herwiha "şikefta xwe" jî ya ku mala wî bû, dirijîne ser kaxezan û pêşkêşî xwendevanên helbesta nûjen dike.

Helbestên Hamid Bedirxanî jî destpêkê ve, bi reng û bi dîmenên dilpakî û perîşanî û bindestiya kurdan, xemilandî bûn. Bîna du helbestvanên mezin û nemir ji laşê helbesta wî difûriyan: N.

Hikmetê ku H. Bedirxan ew di girtî-xaneyê Tirkiyayê de nas kiribû û demekê pê re jiyabû û Cegerxwînê ku ji mêj ve peywendiyên wî û H. Bedirxanî li bin perên pîroziya helbestê ava bûbûn.

Piştî "Kîme ez" a Cegerxwînî, H. Bedirxan jî helbestekê bi heman navnîşanê dinivîsîne û belav dike, herwiha bi navê helbesta Cegerxwînî

"Şeva Hicran" pirtûka xwe ya dawîn diweşîne:

*Ez im ew dilopa ku şaxên*

*zeytûn û hirmiyê avdide*

*Xetîre me*

*û di çirên hejara de*

*gulgenimeke kesk im.*

Lêbelê taybetmendiya dengê H. Bedirxan, dide xuyanîkirin, ku têra xwe bi jiyane hatiye bistirîn û bişaftin, dide xuyanîkirin, ku amadebûna wî li jiyane ji bo nivîsandina helbestê ye. Di hemî qonaxên hebûna xwe de, di danûstendina xwe de, di rabûn û rûniştina xwe de, di ken û girî, di xweşî û şîniya xwe de, tenê, ji bo helbestê, û wek helbestekê dijiya:

Li Helebê Çayxaneyaya Elqesir.

Li Helebê taxa kevnare ya Suryaniyan.

Li Helebê xwendevanên xwendexaneyaya bilind ku helbestên wî ji dest hev direvînin.

Li Helebê bîranînên cihêreng û di derengiya şevê de, di meyxaneyeye biçûk û gelêrî de, qurtek ji meya zelal dihingive peyvên lertzokî; dihingive êşa gel da ku bibe xwîn û dastan û serbor û biserhatî û da ku bibe çîrokên dayik û dapîran, da ku bibe dengê sazband û axîna bajarên ku li ser sînorên xewnê belav bûbûn.

Ji Efrîn û Recoyê, ji cergên Hac Xelîl û Şiyê, gemiya hawarê û bedbextiyê dest bi melevaniya xwe dike û li Amûda tozperest li ber gora Reşîdê Kurd radiweste.

Peşkên serdema dilsoj dihingivin kêlên bêdeng û goristanên berfireh di oxira malkambax de disincirin. Berbangên hêviyê ji bijankên neteweyekî agirperest, diweşin; zindanên Rojhilata Navîn derbas dikin, pelû dibin, dikulkulin, û li Qamişloka rengîn, li ber serê Cegerxwînî, sirûda azadiya xwe ya beravêtî li dardixînin.

Hamid Bedirxan jî bihara li dorhêla me dimije û bi serê pênuşa xwe, hêviyê, evîne, dilşadiyê, xewnê û pencereyên kesk diafirîne, wan ber bi me de dehf dide.

Helbestvanê hizr û bir û hiş û kuç û kolanan bû. Dîroka mirovatiyê bi giştî radixist, û di wê dîrokê de li xwîna karkeran û miletên bindest digeriya. Li mirovê gelemper û nemir; li têkveçûn û şîniyên mezin digeriya.

Naveroka giştî ya helbestên H. Bedirxanî, çinkî di vê cîhana zordest û mêrkuj de li wekhevîyê, li azadiyê, digeriya, vê naverokê guh nedida forma statîkî û ne jî listikên zimên ên ku gelek helbestvan ketine xefkên wê,

dipejirand. Di helbesta wî de, nîşan û amaje û simbol bi awakî ciwan diherikin, dîroka kevnar û ya nû serî hildidin.

Helbestvanekî bîrtûj û deng zelal û helbestine mişt bîrewerî û hişyarî, ne giyanê xwe ji nivîsandinê cihê dikir û ne jî nivîsandin li derveyî giyanê xwe diafirand.

Gelek caran li ser perçekaxezan dinivîsand û piştî hevalên wî ew perçekaxez berhev dikirin û li hevûdû belav dikirin hetanî ku bi navê " Li ser rêçên Asyayê" pirtûka wî ya yekem têt çapkirin.

Di vê pirtûkê de, H. Bedirxan asoyên helbesta nazik û çeleng berfirehtir dike. Evîna xwe diyarî mirovan û şoreşgêran dike û dibêje: Dê pêşeroja mirovan bi kêfxweşîyeke pir mezin di ser dev re here, pêşeroja mirovên şoreşgêr ku H. Bedirxan jî yek ji wan bû. H. Bedirxanê ku beşek ji jiyana xwe û çend salên giranbuha ji temenê xwe di girtîxanan de, bi tenha, perîşan û jar, qedandibû.

Hergav mîna Spartakos û Lorka û hevalê xwe Aragon diqîriya: Da ku mirov bikaribe arezûyên giyanê xwe, daxwaz û xewn û xweza û mebestên xwe pêk bîne, gerek azad be, gerek bi av û nan û dadperwerî be. Lê serdem

serdemê mirovkuj e, xwîna mirovan mîna avê dimije û giyan jî ji zixtên kuştinê nema rizgar dibe helbestvano!

H. Bedirxan li bin esmanê Asyayê radiweste; Asya, oqyanosa şevpestî û goristanan, herêma tirs û belengazî û nezaniyê, wargeha zordest û serbaz û generalan, radiweste û berzûrî pêximberê berbangê dibe, berzûrî rengên teze yên gulgenimên Asyayê dibe:

Li bin esmanê Asya hişyar

Rêçên me dirêj dibûn

De ka em gernameya xwe berdewam bikin

De baweriya xwe ji boyî

pêşerojê veşêre

Ev çirîska ji nişkê ve, çirîska dîlîtiyê  
me ji ser rê nabe...

Di sala 1982 an de, H. Bedirxan helbesta " Li qatîlê Lorka digirim " diweşîne û bi vê helbestê careke dî piştgiriya xwe ya bêmînak bo mirov û hebûnê êşkere û pêşkêş dike, derdên me; êşên me yên veşartî, ji serdemên dîlîtî û hovîtiya pêşîn hetanî kuştina Lorka, ber bi çav dike. Dengê vê helbestê zû bi zû belav bû. Seyrbûn û taybetmendiya vê helbestê, hêsanî û kûrahiya wê bi xwe hiştiye ku H. Bedirxan xwe berde binê hemî waran û

bi hemî tiştan re bipeyive, û hergav  
mebesta wî, armanc û daxwaza wî,  
herwisa astenga wî ew e ku li qatilê  
Lorkayî digere:

Baweriya min bi evîne hat

Pûşkîn

Lêrmantov

Virjil

Ovîdis

Dantî

û Mîlton

Di behîsta windayî de

Li ber devê dojhê

û geliyê Daryal

û Anîyîd

Baweriya min bi evîne hat...

Zeredeşt

û Bûda

û Konfiçyos

û Îsa

û Muhemed

û li qatilê Lorka geriyam.

Di vê helbestê de H. Bedirxan mêranî û

tirsê bi hev re derdîbire û gunehê

kuştina Lorkayî dixwe mirovatîyê,

tîliya xwe ber bi yê xwendevan de jî

nîşan dike û her tiştî eşkere bi nav dike:

û tu yê li nik min rûniştîyî

û bi min re diaxivî

Bohemî

Sîmbolî

Suryalî

Tu qatilê Lorka yî...

Ez.

Tu.

Em..

Ew

hemî, yê ku li hemberî rûdanên rojane

radest û di navê de rawestiyane

qatil in.

De ji xewê

ji xweşiyên xwe şiyar bibin

çinkî em naxwazin ku

Lorka

û Gîvara

û Lomomba

careke dî bimirin.

Bi kurtî, H. Bedirxan dixwaze di vê  
helbestê de wisa bibêje:

Di jiyane de hêzên çep û hêzên rast de  
her û her amade bin, lê mirovê ku di  
navbera herdu hêzan de radiweste; ne  
dûr e, ku ew bi xwe jî bibe sedemê  
kuştina Lorka. Gerek li beramberî  
rûdan û bûyerên cihanê, em bêdeng û  
wek temaşevanan ranewestin, gerek em  
milên xwe nehejin û nebêjin ma yê  
min çi ye!/?





# Nivîskarê kurd, çanda kurdî û pirsra nasnameyê



HENDIRÊN

## II

**E**v û çend pirsgirêk û astengên dîtir ên tozgirtî; eger li ser bingeha herifandineke sazkar; bi nêrîneke teorî û bi têgihîştineke nûjen, neyên wergerandin û çareserkirin; dê nasnameya rewşenbîrê me û tengahiyên siyasî-mêjûyî li beramberî pirs û gumanên tevlihev ên cîhanê; dê hejar û bê peyama bimînin.

Wek serencam, eger em wisa nekin; dê rewşenbîrê me pêrgî namoyî (ixtirab) û tengatiyeke navxweyî ya girêkkûr bibe. Jixwe namoyî û tenhatiya mirovan jî; bi xwesipartina li ser palpişt û nasnameya çandeyî, mirovan ber bi jiyaneke tevlihev û bê berpirsariyê ve radikişîne, ango jiyaneke li derveyî bûneweriya hebûnê; jiyana bê armanc û jiyana mirina amadekirî.

Li vir, jî bo germkirina vê realîteya westiyayî; emê çend pirsên sade; lê pêwîst, li ber çavên çand û rewşenbîrên me, raxînin:

Îro, di nava xirecira bûyeran de; û di nava guhertinên çerxane yên cîhanê de; li beramberî teqîna felsefeyê û ragihandinên ku li ser bidawîhatina dîrokê dipeyivin; li beramberî têkçûna nîrx û prensîpên pîroz ên îdyolojîyayê û li beramberî bikaranîna hemî beşên zanist û tîknolojîya û şaristaniyê; û

namobûn û westana mirovatiyê li hember vê bikaranînê, îro; rewşenbîrên me, yên berê û yên aniha, bi çi awayî; di kîjan sewiyetê de beşdarî wê rewşê bûne? Rola rewşenbîrên kurd di vê pêvajoyê de çi ye?. Herwisa; nêrîna rewşenbîrên me bo xwendin û analîzkirina wan rêbaz û mîtod û hizr û felsefeyan û rûdanan çi bû û çi ye?

Deqên felsefî û teorî û hizr û ramanên rewşenbîrên me; li beramberî wan bîrûbaweriyên wêjeyî yên gelemper; yên mişt aferandin û dahênan; herwilo, wergerandina wî û çawatiya wî; di kîjan sewiyetê de ne?

Bi van pirsên sade lê pêwîst; em dikarin dûrbîniya rewşenbîrê kurd binirxînin.

Digel vê jî, gerek em li nik dengên takekesane; yên ku hewl didin ku cîhanê û Kurdistanê bi mîkanîzîma awez (aqil) bixwînin, û çengek ji tîrmên giran, di vî warî de, bi kar tînin, rawestin.

Bi baweriya min, ev hewldan, bi giştî, xwe dispêre du dangan: Dengê yekem structuralism e û yê diwem jî tevlihevkirina suryalîzm û formalîzm û raportîzmê ye.

Hewldana pêşîn jî ya dawîn çalaktir û kûrtir e, çinkî ya diwemîn şêwexwaz e; tenê di helbestê de peyda dibe; bi rêbaziyeke zelal û eşkere napeyve,

lewra çalakiyên wê kêmtir dixuyin. Bi giştî; ev herdû hewldan hetanî aniha di sînore destegeriyê (girûpiyê) de û li du bajaran (Hewlêr û Sulêmani) tên naskirin, Van herdû hewldanan digel aliyên xwe yên erêtî (pozitiv) jî, çend bîrûbaweriyên nayetî wek hewlêrîtî û silêmanîtî, dirust kirine. Ev sîma bixwe jî vedigere rewîstên herî paşmayî yên civata me bi giştî û rewîsta naskirî ya rewşenbîrê me bi taybetî. Hişmendiyek wisa ji berhemdariya gundiyane ya civata me û ji bi şûndemayîna destegeriyê, tê, û cihana rewşenbîrê me yê naskirî nîgar dike.

Bêguman rewşa taybetî ya piştî sala 1991 ê li Kurdistanê di bin siya herdû partiyên desthilat de, peyda bûbû, digel çend faktorên siyasî, aborî, komelayetî, sincî, psîkolojî ku li vir ne cihê liserawestanê ne, wek faktoreke çewt, li ser wan herdû hewldanan û li ser pêvajoya taze ya rewşenbîrê me, dirust bû.

Lê van herdû partiyên siyasî di demeke pir kurt de dikarîbûn bi alîkariya peran û deshilatdariya xwe wan rewşenbîran bixesînin û hemî dezgeh û hemî dengên rewşenbîrî yên takekes (ferdî) ên ku hewldana tazegeriyê dikirin, best bikin; gem bikin. Herwisa hemî hêz û karîn û germahiya ku di laşê wan rewşenbîran de hebû ji bo alavên ragihandina partiyên xwe bi kar anîn. Ji nişkê ve û piştî demeke kurt meydan û cihana rewşenbîrî ber bi sistî û erzanî û lawaziyê de diçe, ji bo berjewendiyên herdû partiyên têt bi kar anîn. Hemî çapxane ji bo armancên partiyên dest bi xebatê dikin, wek ku çawan bajar û gund di navbera partiyên Kurdistanê de hatin dabeşkirin wisa jî û bi heman şeweyî rewşenbîrên kurd. Bi kurtî, şûnşop û bikaranînen siyasî sincî yên ku ji alî Basiyên Iraqê dihatin pêkanîn; vê carê bi awakî pir sade û kawikane,

bi riya partiyên, û bi xwesipartina li ser diruşmeyên kurdayetî, bêyî rêbazeke ramanî, tenê ji boyî diqdiqandina hestên rewşenbîran, xwe dûbare dikirin da ku cilê ji bin lingên wan bişemitînin, wan bixapînin. Bêguman di vê pîlanê de, herdû partî, baş bi serketin. Wek serencam; berpîrsiyariya vê rewşê nakeve hustê ti alî û ti partiyên; biqasî ku çiyetî û sewiyeta hişyarî ya rewşenbîrê me, wek du regezan, rola xwe ya bingehîn di serkeftina vê prosesê de listiye, çinkî gotara desthilatiyê, navend û alîgirîya partiyane bixwe, hişyarî û strûktûra rewşenbîr û çanda me bi giştî dadimezirînin.

Rewşenbîrê me, di van barûdaxan de, wek gotara dîmagojî ya partiyên me û alavên ragihandina partiyane, eger ne partî be, alîgir e yan jî berdestekî dilsoj bo partiyên e, bi alîkariya bikaranîna çend tîrmên wek modernîzm û zanist û felsefe û hemdemî jiyana xwe ya li ber destê partiyên didomînin, di wextekê de ku yek ji van tîrman di wateya xwe yî resen de, li ba me ne têt bi kar anîn û ne jî têt guncîn, çinkî ne deqên wan ramiyar û fêlosof û rewşenbîran hene da ku wan tîrman biçesipînin û ne jî zemîna van tîrman di hiş û avahiya civat û rewşenbîrê me de heye. Li derveyî vê rastiyê jî; ew çend deq û rewşenbîrên ku peyda dibin jî, bêagahî di tenhatiyê de dijîn û bê maf in û devgemkirî ne, ev deq û rewşenbîr diyar û eşkere ne lewra pêwîst nake ku em li ser wan rawestin.

Bi herhal eger ew realîteya aloz a çanda me ya ku em li ser dipeyivîn bê bandor an kêmtir bandor be jî dîsa pîrsa nûjenî û tazegeriya me yî îro xwe ferz dike digel tunebûna çavkaniyên çanda cihanî. Îca bingeha wan hewldanên nûjen û taze, diyardeya wergerandina deqên balkêş û nemir di çarçewa guheztin û

destewayiya rêbaz û bizavên zimanên dîtir ên dunyayê de û li derveyî navçeya me dimînin. Ma gelo bêyî hebûn û peydabûna wan deq û çavkaniyan bi zimanê kurdî em dikarin bîr û baweriyên rêbazên cîhanî têbigihêjin? Lewra beriya ku em di guheztin û destewayiya nûjeniyê de biramin, gerek em bişên bi alîkariya wergerandinê naveroka teorî ya wan rêbazan binasin. Ma çawan bêyî vê zemîna hişyariyane dê tazegerî bê avakirin madam piştîneya (xelfiyeta) rewşenbîriya me û meydana hişyarî û zaneyariya me li derveyî xwendina Hegel û Marks û Nîtsê, Haydgar, Kirkgard, Sartre, Spînoza, Dreda, Ştraws û Part û Başlar û Delouz pêk hatiye? Çawan tenê bi xwendina Fouco em dê bikaribin straksralîzmê û prosesa kûr û tevlihev a felsefeya bûneweriya dîroka ku bi rewşa aborî û zanistîya Ewropî ve girêdayîye, têbigihêjin?

Di heman wextê de ew pirsên jorîn dikarin pêşkêşî hewldana şewexwaz a ku em li ser peyivbûn, bibin.

Ma gelo tazegerî pirsêke giştî yan jî takekesî ye?

Ma gelo tazegerî bi xwe ne lêpirsîn e? Bi (NA) yê bersivdana van pirsan ne dîtî û nepejirandina yên dîtir e, wek ku Edonîs dibêje nebûna azadî û guftûgoyê ye û têngihîştina tazegeriyê bi xwe ye.

Qirkirin û bindestkirin û nepejirandina bawerî û ramanên ên dîtir, an jî şeweyekî amade û diyar bo dîtina tazegerî û xwendina cîhanê, bixwe; serjêkirin û gurandin û qurmiçandina tazegeriyê ye, têngihîştineke çarçewekirî ye.

Digel vê jî, peydakirin û çêkirina formeke dîtir di çêşnê forma berê de ya ku li ser wêje û çanda çinan û neynika civatan dipeyivî, eynî serencam e.

Tazegerî di çî babetê de be, dixwaze asteke ciwan û kûr û vekirî ava bike. Dixwaze pencereyekê di dîwarê bêbizav û bêdeng de; di dîwarê aniha de bo dîtina rexê dîtir ji dunyayê, veke. Wisa, li dijî hemî formên çêkirî û amadekirî radiweste.

R. Part li ser aferandinê wisa dibêje: "afirandin an çêkirin, bo cîhanê nêrîneke resen e, xema afirandinê afirandina cîhanêke rasteqîn e; di formê cîhana yekem de, ne ku ji bo wê cîhanê bi wêne bike lê da ku wê nemir bike".

Bi vî awayî pevçûna tazegeriyê ji nava xwe û ji derveyî xwe dest pê dike. Pencereyek e bo hejandina dîrokê û bi alîkariya gumanê rehayîyan (mutleqan) sist dike.

Wek ku çawan îro jî ji bo pêşerojê mirov dipirse; Ramboud di wexta xwe de pirsî bû: "ji bo çî em dinivîsînin eger ne ji bo guhertina jiyana me be, ku ne ji bo naskirina cîhanekê ku ew cîhan bi xwe ne cîhana me ya rastîn be?"

Tazeger di çarçewa awez (aqil) û alavên kûr û berfireh de; têramandin e. Ew têramandin jî berhemdariya çandeke zanistî ye ku li ser tîkçûna çandeke kevnare ji dayik dibe. Herwisa têramandina tazegeriyane hemî bîrûbaweriyên sade û remakî (fîtrî) dilerizîne; dihejîne, diderizîne û diherifîne. Lewra tazegerî li hemberî wê pêvajoya ku li ser bingeha bersivdanê ava dibe, radiweste, hewl dide ku pêvajoya têramandina lihevhatî û guncînamêz bi têramandineke nakokiyane û cihê reng; gumanhilgir û vekirî, biguherîne.

Ango, tazegerî ji ber xwe ve ji dayik nabe, çinkî tazegerî serencama proseseke dûr û dirêj e; proseseke dîrokî, komelayetî, aborî, zanistî û şaristanî û psikolojî ye; laşê fizîkî yê berhemdariya civatê ye. Ji bo pêwistiyên dîrokî û ji çesipandina

zimanê ku civat diafirîne, nîşana guhertineke diyalîktîkî ye. Ew proses jî yekalî û yekast nîne, ji ber ku di çarçewa wan xalên ku em li ser rawestiyabûn guhertineke çawayîni berfireh û kûr e. Ev guhertin bi xwe jî awezekî (aqilekî) nû dirust dike; ev awez jî zimanekî rewşenbîrane yî zanistiyane radigihîne, ev zimanê rewşenbîrane jî; neagahî û hestên bi civatê; bi agahiyeke komelane û takekesane, diguherîne. Bi wateyeke di tazegerî, îro, rexnelêgirtin û xwendin û berhemkirina dîrokê ye, li ser bingeha zimanê rewşenbîrî ava dibe. Piştî wê dîrokê bo îro diguhêzîne (ji nû ve durustkirina xwe ya xwe ye û cîhana me ya windakirî ye).

Lê gelo, hişmendiya civata me û awira vê civatê ya li ser gerdûn û jiyane, dikarîbûn, wan guhertinên ku em li ser peyivîbûn, himbêz bikin; daku pirsên suryalîzmê û straktûralîzmê û gotara awez (xîtaba aqil) ligel pirsên me û gotara awezê me, biguncin, û di wê sewiyetê de bin?

Ma gelo çanda me dikarîbû deqine (têkstine) di çesnê deqên Jims Jowis û Gote û Holdren û Briton û Tzara û Bodlêr û Brost, biafirîne; daku em wan deqan bi gotara awez bixwînin?

Ica bîr û bawerî û rêbazên teorî yên ku li Ewropayê peyda dibin, di warê rexnegirî û xwendin û analîziya sosyologî û îpştîmologî û filologî û psîkologî û zanistiya dîrokî de; rêbazine giran in; û wan bixwe avahiya aborî ya kapîtalîzmê durust kirin e. Di vê avahiyê de, gotara zimên roleke bingehîn dilîze.

Bi herhal, tazegerî wan bûyeran û wan nimûnedaran; û deqên paşerojê ber bi afsan û zimanê îro de radikişîne. Erê îro em di cîhana xwe de pêrgî deq û nimûne û şêwe û diyardeyên di çarçeweke çandeyî yî nûjen; taze û

pêşveçûyî, nabin. Ne jî em pêrgî helbesteke nûjen, pexşaneke nûjen û romaneke nûjen dibin.

Tazegeriya Ewropayê ya bilez û aloz, bûye sedema ku em berhemên çandeyî yên di hinavên dîroka xwe de ji bîr bikin. Çinkî her û her me bi awakî ne rewşenbîrane awayê ewrupiyî kiriyê. Çinkî di meydana çanda me ya netewî de hestên bişûndemayîna me ya dîrokî, rehên xwe dajon.

Digel ku çavkaniyên rewşenbîrî û hişyariya kûr a rewşenbîr û hizirvan û ramiyar û dahêner û helbestvanên mezin ên Ewropayê sofizma rojhilat û afsan û kultûra kevnare ya Igrîkiyan e jî, rewşenbîrê kurd îro, berevajî rewşenbîrên Ewropayê, hewl dide ku van alîyan ji bîr bike.

Ji bo çesipandina vê yekê jî, pir kêr li ser ezmûneya Goranê nemir têt peyivîn.

Bi baweriya min, di meydana rewşenbîriya me de; ji nivê vê sedsalê û vir de, pîrsek di vê sewiyetê de, pîrsek ku bikaribe derzekê di mêjiyê me de wek derza ku Goranî durist kiriyê, li ber çav nîne.

Çinkî ezmûneya Goran şiya zimanê ramandinê ji klasîkiyê bo nûjeniyê veke, herwisa wê ezmûneyê şiya şêwe û naverokeke tîr pêşkêşî laşê çanda me bike. Bi vê yekê jî şiya pênasa helbestî û çanda me ji devera me ber bi cîhankirinê de rakişîne.

Goranî, bi palpišta xwe yî rewşenbîrî û xwemalî, bi sîdwegirtina ji ezmûneya çanda dewrûber û dûrtir, karîbûye berhemeke rewşenbîrî yî çandeyî û hemdem û ahengane biafirîne.

Wate, Goranî bi awira xwe ya taybetî bingeha rewşenbîriyeke xwemalane damezirand bû. Ev rewşenbîrî ne bi awayê kopîkirina tazegeriya Ewropiyî a ku piştî Goranî heta îro jî di nav

rewşenbîrên me de berdewam dike, pêk anîbû.

Lê Goran wek dahênerekî rastîn dikarîbû ezmûneya wê tazegeriyê rabigihîne, ango Goranî ew asoya berfireh ji wergirtinê bo aferandin û beşdarbûnê çêkir.

Goranî di ezmûneya xwe yî helbestî de li tenişt nûkirina zimên û gotara xwendinê jî, dikarîbû, komeke bîrûbaweriyên hemdem û xweristî pêşkêşî semta dîrokê û jinê û xweristê û cîhana giyanî, bike.. Lewra ev aliyên balkêş, navika ezmûneya Goranî bo me bi cî dihêlin, dîsa wan aliyan bi xwe jî dahênan û berdewamkirina ezmûneya Goran sist kirin.

Hetanî roja îro jî, rexnegiriya me ya ku xwe dispêre herdû rexên siyasî; li ser helwest û bîrûbaweriyên siyasî yên Goran, radiweste, û wek asteng lê temaşe dike, digel ku rexnegiriya me bixwe jî di heman astengê de dijî. Eger em Goranî bi bîrûbaweriyên wî yên siyasî gunehbar û rexne dikin, mane hemî mamosta û serpereşt û nûnerên helbest û rexnegiriyê, îro ro, dîlên siyasî ne û bi partîtiya teng hatine merbend kirin. Ji xwe ev diyarde, di warê nasnameya rewşenbîrê me yî îro de, zelaltirîn diyarde ye. Lewra dixwazim vê yekê bi pirsekê kuta bikim:

Kîjan rewşenbîrê kurd, îro ro, nasnameya xwe ya rewşenbîrî, ji derveyî çarçewa siyaseta partiyane, bi dest dixîne?

Bêguman liserawestan û pirsra çanda kurdî ya li tarawgehê û pîtsa rewşenbîrê kurd ê mişext û derbiderbûyî, ji astenga giştî ya rewşa çanda me yî li hundirê welêt, cuda nabe. Çinkî hetanî aniha nêrîna giştî ya rewşenbîrî ya rewşenbîrê kurd li derveyî welêt beşek ji çanda hundire û nikare jê cihê bibe ango şiyar û hêza

çanda kurdî li derve her ew şiyar û hêza çanda hundir e. Bi wateyêke dî; du jeografîyayên çanda kurdî nîn in, digel vê jî, vê tarawgehê, vê guhertina cih, gelek deng daqurtandine. Dengên heyî ti dengên nû dernexistine û tarawgehê jî dengine dîtir, neafirandiye.

Lewra em li hemberî çendîn sedem û hokarên alozî rû bi rû radiwestin, û ji bo ronîkirina vê yekê jî, bêguman, em hewcedarî gelek belgeyan in. Digel ku karekî wisa me naçar dike ku em vegerin komek çavkanî û bîrûbaweriyên ku li ser têrma intilîgênsya radiwesin. Lê mixabin, ne ev lêkolîn dikare vî barî hilgire û ne jî ez dikarim beşdarî vê pêdiviya zanistî yî teorî bibim.

Lê bi cegerdarî dikarim bibêjim ku berztirîn astengên çanda me hejariya têrma kurd a zanistî di danasîna têrma intilîgênsya de ye.. Ango rewşenbîrên ku bikaribin, wek pişe, bi analîzê û bi pêşdebirina projeyêke ramanî û felsefî û zanistî û rexneyî û çend aliyên dîtir ên hişyarî û wêjeyî mijûl ,bibin nîn in. Lê em dikarin bibêjin ku rewşenbîrê kurd, wek karekî rojane, mirovekî normal e bi her tiştî mijûl dibe yan jî wek ku pêşiyar gotiye: ((Ji her baxekî gulek)).

Lewra ti rêbazeke zanistî û hişyarî yî sînorkirî bi karnayîne, û ligel hemî cihan jî digunce.

Bêguman gerek ez bibêjim ku çend rewşenbîrên kurd yên xwedan hebûneke taybetî, hetanî aniha berhemên wan ne hatine nirxandin û ne jî lêkolînên balkêş li ser wan berhemên rawestiyane.

Biherhal, aloztirîn dîmen ew e ku ti cudahî di navbera rewşenbîrên derve û hundir de nîn e. Ji xwe lawaziya rewşenbîrê kurd ê li derveyî welêt ji paşeroja wî têt, çinkî ew bixwe bi çandeke giştî hatiye perwerdekirin, ku

bi wê çandê, di serencama dawî de, li derveyî welêt, nikare li ser bingehên tund bixebite.

Mijarên ku li Kurdistanê li ser zimên bûn, li vir, li tarawgehê, bê zemîn û bê xwendevan in.

Herwisa, têgihîştina rewşenbîrê me û asoyên hişyariya wî, li vir, li derveyî welêt, li beramberî vê tabloya tevlihev û kûr a tîknolojya û şaristaniyê, hiştine ku rû bi rû li hember pirseke çandeyî cihêreng raweste, ku rewşenbîrêkî di çêsnê rewşenbîrê kurd de ti carî nikare bersiva wê pirsê wergire û bi destxîne.

Digel vê jî, sistêm û formên jiyane yên tevlihev ên welatên tarawgwhê, bi hemî movik û şaxên xwe; jiyana ku li ser program û dabêşkirina demê ava dibe û li pêdiviyên jiyana rojane digere, wek jiyaneke nû ligel sistêma bê program a rewşenbîrê kurd ê li derveyî welêt, nagunce. Lewra, vê rewşê, rewşenbîrê me vegerandiye destpêkeke dîtir ku ji destpêka pêşîn bi hemî awayên xwe cihêreng e, û ew ji xwendinê bi dûrxistiye.

Li tenişt vê, alavên ragihandinê (Televizyon, rojnamegerî, çalakiyên li ser kolanan, aheng û şevên şahiyê û h d) giyanê vî rewşenbîrê ku hînî jiyaneke wisa nebûye, vala kiriye, zuha kiriye.

Ev û çend hokarên dîtir, bi taybetî avahiya me ya rojhilatî, me di hundirê vê jeografiya nû de ber bi tenhatî û li xwepêçanê de, dehf dane.

Bêguman mebesta min rewşenbîrê kurd ê li Siwêdê ye yê ku dikare bibe nimûneyeke giştî bo rewşenbîrên kurd ên li derveyî welêt.. Digel ku navendeyên çandî, çapxane û kovar û Radyo û çalakiyên çandî û hunerî yên ku li Siwêdê peyda dibin li ti welatekî Ewropayê peyda nabin.

Îca ligor sewiyeta vê çanda ku li Kurdistanê Siwêdê li ber dest e em

dikarin sînorên çanda xwe ya li derveyî welêt destnîşan bikin.

Ez dibêjim Kurdistanê Siwêdê çinkî îro ro wek hejmara van navendên sexte û van komeleyên bêencam li Kurdistanê ku welat e nîn in.

Di çavkaniyê Swêdî de ku li ser berhemên çapbûyî yên sala 1994 an ên bi zimanên hemî penaberên li Siwêdê, hetine çapkirin, dipeyive, wisa dibêje: ((Kurd jî hemî gelên dîtir bêtir xwedanên navendên çapê û malbendên çandî ne, û ji hemiyarên bêtir jî pirtûkan diweşînin)).

Di herman wextê de; divê bê gotin, ku rewşenbîrê kurd jî bo berjewendiyên xwe yên aborî û propogandeyî ji hemî rewşenbîrên miletên ku li Siwêdê dijîn; sergermtir e; sergermtir e da ku bibe endamê yekîtiya nivîskarên Siwêdê, ev yekîtiya ku li vir, li Siwêdê, di sewiyeta komeleyê civakî de ye, û ti rola wê yî taybetî di avakirina çandê balkêş de nîn e. Ya jî vê balkêştir ew e ku hin ji endamên yekîtiya nivîskarên Siwêdê yên kurd di nav rewşenbîrên kurdan de bixwe wek nivîskarîna kurd nayên naskirin.

Bihêral, dahênan bixwe neguncîna ligel jiyane û gerdûn û rewşa bêango (bê me'ne) ya jiyana rojane ye; neguncîna ligel realîteyê ye; realîteya ku ji alî deshilatê û yasayê (qanûnê) bi bersivên xwe yî hişk hatiye çêkirin.

Ango aferandin pêşkêşkirina pirseke kûr e; bi hebûna mirovê dahêner dagirtîye; dahênerê ku di hundirê prosesê aloz de dikare, di hundirê xwe de aferandinê bi karbîne.

Lewra mirovê dahêner nakokiyê hem bi xwe re û hem jî bi rewşa xwe yî civakî re, dijî, û bi vê qonaxa dîr û dirêj a jiyane û dîrokê re, dijî.

Bi xeyala xwe, bi xewna xwe yî resen û gerdûnî; ji destpêkê ve; hewl dide ku vê cîhana ferzbûyî, di hundirê meydana

deq û nivîsên xwe de, biherifîne, û di şûna wê de jiyanêke giyanî yî hestdar û nemir û mehal, ava bike, bihûne.

Lewra gerek tarawgehê rewşeke alîkar bi destê rewşenbîrê me xista da ku ji realîteyê cihê bibe, lê berevajî wê, çînkî avahiya rewşenbîrê kurd li ser palpişteke zikmakane û li ser bersivdanê û li ser guncîna ligel gotara serkeş(setsî) a civakî û realîteya berdest, hatiye damezirandin, ti carî nikare ne ji civatê namo(ixtîrab) bibe û ne jî jê cuda bibe.

Ji ber ku di vê jeografîyayê û di vî cihê nû de; rewşenbîrê kurd bixwe asteng û çeper danîne pêşiya xwe da ku xwe ji ber pirsên tevlihev ên vê jeografîyayê veşêre.

Ango hewl dide ku bi çavên asayîyê (normaliyê) li hemî tiştên seyr û biyan, temaşê bike da ku her û her wê gotara (xîtaba) ron û serkeş biparêze.

Lewra, gotara rewşenbîrê me, bi giştî, li tarawgehê, neşiyaye gotarek gumanhilgir û balkêş biafirîne da ku hemî şêwe û taybetiyên ku tarawgehê dinasînin, bikarbîne. Da ku nivîsandina xwe berdewam bike, her û her hewl dide ku alav û şêweyên xwe yê kevnare di bîra xwe de vejîne da ku bi paşeroja xwe re û bi peywendiyên wê paşerojê re berdewam bibe. Wisa rewşenbîrê me baweriyêke nehişyariyane dirust dike da ku piştî xwe bide hemî pirsên vê jeografîyayê. Ango bi bahaneyên rewşa Kurdistanê û bi dûrbûna ji welêt û bûyeran, derfeta avakirina xwe ji dest winda dike.

Ji alîkî din ve; zemîna aborî ya ku li tarawgehê peyda dibe û bi taybetî li Siwêdê; rewşenbîrê kurd dehf daye ku çand û peyva kurdî wek alaveke bazirganî bi karbîne, vê yekê bixwe jî dîmenên çanda me, li tarawgehê, zelûltir û hejartir, kirinye.. Çînkî vê diyardeya malkambax bixwe hiştiye ku

rewşenbîrê kurd li Siwêdê rewşeke çandeyî yî sext û têkçûyî û beravêtî pêşkêş bike, nehiştiye ku rewşenbîrê me bi awakî normal û bi berdewamiyêke dahênane bijî; ne bi xwe re digunce û ne jî bi rewşa derveyî welêt re.

Bi gotîneke din, vê zemîna aborî wek dadgehê, rewşenbîrê me, li pêşiya çavên me rûtkiriye; rewşenbîrê ku ne dikare bixwîne û ne jî dikare li ser bîngeheke taybetî xwe ava bike; û ne jî dikare pirsan û deqekî rewşenbîrî; hişmendî, û ebediyane, biafirîne.

Lewra, di meydana çand û peyva kurdî ya ku li derveyî welêt hatiye nivîsandin; hetanî aniha; pirseke rewşenbîrî yî cihêreng, hem ku ji pirsên hundirê welêt cihê be û hem jî ku bikaribe sewi-yeta çanda me ya giştî bilivîne, nîn e.

Berevajî wê, îro, li welêt, hewldan û bizavên rewşenbîran bo pêkanîna guhertinekê, hem çalaktir û hem jî xurtir in.

Jixwe rexne û liserawestaneke analîzane yî balkêş; li vir, ku pirsên bîngehî ên çanda me ne; îro ro, nîn in.

Bi kurtî, di bawerîya min de, hetanî vê kêlikê, gotara rewşenbîrî ya tarawgehê, meydana dîdariya rewşenbîrên kurd di warê form û naverokê de, ji wan alavên ku ji welêt bi xwe re anîne, pêk tê. Ango, gotara rewşenbîrî ya tarawgehê ne ji prosesê namobûnê (ixtîrabê) ji dayik bûye. lêbelê ligel vê jeografîyayê di namobûn û tenhatî neguncînê de ye. Bûda dibêje:

((Guman çavkaniya hemî destpêkirinan e... Neman bo wî kesê ku sefera xwe li ser zemînê rawestand... Û li destê çarmêrkî rûnişt... Ey dahênerno! Hûn li kû ne? Ew peyvên ku tu dibêjî; ((hemî tişt wînda bûn)), berhema wî diçe nav dil û awcêzê(aqilê) me.. Em jî hê ciwan in)).

# Xwedîkirin û guhdana zarokan di civaka kurd a kevin de



*Rezo Osê*

Di her wext û zemanî de, lê bêgoman di dema îro de hê bihtir, guhdan û xwedîkirina zarokan erkekî herî giran û giring e li pêşiya dibistana jiyane, û bi taybetî li pêşiya birewer û zanyarên her gelî di civaka wî de, wilo jî di civaka navnetewî de. Loma îro roj guhdana zarokan dikeve pêpelûka pêşî ji nêrdewana şarevaniyê. Ev guhdan û xwedîkirin bi gelek rengan tê naskirin - çex û leystikên zarokan, xwarin û vexwarinên zarokan, çîrok û pirtûkên wan, sînema û awazgehên wan... û hd. Lê gelo, di civaka kurdî î kevna de, di wê civaka gundî, êlîfî û koçeriyê de, di wê civaka gêl û kewden de, zaroka kurd çawa xwedî dibû, û çî guhdan pê dibû?

Mixabin ku em, di vî warî de, nikarin pêr û mêzînen îro roj derbarî vê xwedîkirin û guhdanê pêk bînin û bi wan re bipîvin, ji ber ku kurd îro roj ne xwediyê zaroka xwe ye (mafên Kurdan xwarî ne, zaroka wan bi destên bêgane xwedî dibe - ne xwendin, ne nivîsandin, ne çapxane, ne televizyon... û hd. di destên Kurdan de hene). Bo vê yekê, emê li bingehên guhdan û xwedîkirina zaroka Kurd, di demên dîrokî de, di riya jêmayên gelêrî de, bipirsin û wan ji hev derxin û berçav bikin, da em

zanibin zaroka me bi çî rengî û bi çî awayî diate xwedîkirin.

Di vê lêkolînê de, em li ser bingehên biolojî û xwardemenî ya zarokê, ya berî roniyê bibîne, narawestin. Lê, emê bihingivin reng û şeweyên xwedîkirina zarokê piştî bûnê - ji pêçekê tanî salên bireweiyê.

## Zaroka Kurd di himbêza makê de:

Zaroka Kurd, weku her zarokên demên berê, li ser sînga diya xwe, bi şîrê makanî xwedî dibû. Gelo, diya Kurd çawa zaroka xwe şîr dida?. Belê, ev pirseke bingehîn e ji xwedîkirina zarokê. Nasîn, jihevderxistin û bi cihanîna vê pirsê jî pêpelûka pêşî ye ji pêpelûkên saxî, saxlemî û aramiya laşanî ji zarokê re.

Dêmek, nasîna pergala ku diya kurd, di warê şîrdana pêçeka xwe de, pêk tanîn dergehekî zanîneke gelêrî ji me re ronî dîkin, û awayên guhdana vê civakê berçav dîkin. Belê, diya kurd zaroka xwe, li gor bidestxistina regezên jiyani, saxlem û hêzdar dirakir. Lê xweş dinasî, ku ne tenha şîrdan bo zarokê pêwîst e, lê guhdan jî gerek e.

Di vî warî de jî dê, li gor asoyên têgihistina xwe û peydabûna regezên jiyane di civaka xwe de, hişmend û şiyar bû. Belê, pêçeka xwe ji şilbûn û şewliqandinê diparast û ew xweş dipêça. Piştî pêçaneke wilo, zaroka xwe



dixiste hêlan, landik û dergûşan, û bi ritma (ton) hejandinê re, bi dengekî nerm û dîlovan, zaroka xwe dîlorand, da bi aramî raze û xeweke şêrîn û bê tirs bike. Wilo, zaroka xwe bi serpêkan dixist, û ew dixiste dibistana jiyane.

Vê dibistanê jî bi çîrok û çîvanok, leyistik û mijûlî, serpêhatî û têderxistok, metelok û zargotin, şer û dîlok û stiran - geleporen dema xwe - dest pê dikir, û roj bi roj hiş û gomanên zarokê fereh dikirin, û ew li ser bingehin civakî yî pak û rind, li gor dîtînen demê, ava dikir. Lê, bi van waneyan re dibistana zarokê kutayî ne dibû, loma diya kurd zaroka xwe fêrî mijûlî û karên destan jî dikir. Û gava zarok bîrewer dibû, dikete dibistana civakî. Li wir fêrî kar û leystikên gelêrî dibû.

Lê zarok çawa be zirz û ne tebitî ye, dixwaze razên vê jiyane bibîne û nas bike (dixwaze agir dade, kuştinê bike, bi avê bileyize... û hd), loma gelek caran saw digre û dikeve bin barê tirsê. Û ji bo ku dê zaroka xwe dûrî saw û tirsê ragire û ji wan biparêze, wê fêrî hin tiştên bingehîn di jiyana civaka xwe de dike, ew tiştên ku li ba zarokê, bi wextê re, dibin terz, endaz û di jiyana zarokê de.

Bi vî rengî, bi vî awayî diya kurd, li gor dîtînen xwe, dergehekî gelêrî pir fereh û mezin li pêşiya zaroka xwe vedikir û ew tê re, bi serbestî, derbasî jiyaneke nenas, rewşeke taze dikir. Wilo, zarokê tişteke ji xwe dûr û raz û nenas nedidît. Wilo, fêrî zanîneke gelerî û nasîna dibistana jiyane dibû. Wilo, rayên xwe bi dêrînî diberdan nava zemîne û cihê xwe li ser pêpelûka nêrdewana şarevaniya dema xwe digirt. Lê, gelo li ser cihekî rast û durust, li gor behweriyên şarevaniyê, dirûnişt. û di pêşerojan de desthilatî ravekirin û

guhertina van mijarên dibistana jiyane dibû?

Ji bo bersivdana van pirsan, û ronîkirina berpaleên tox û tarî, ji bo nasîna pileyên bêserûberiya guhdan û xwedîkirina diya kurd ji zaroka wê re, em pêwîstî daneberhev û jihevderxistina rêz û bendên vê xwedîkirinê, hemberî xwedîkirina zanyarî dibin. Wilo jî em dikevin bin barê jihevvejandin û berçavkirina tiştên çak, rind û çê ji yên çewt, qels û bêkêr di dîroka sazîkirin û avakirina vî endamî (zarok) di civakê de, ew şanika ku dê, li gor asoyên dîtînen û nasînen xwe yên saltgîr, wê bi kiras dike.

Bêgoman, di warê xwardemeniya zarokê de, diya kurd di civaka xwe, ya kevnar de pêçeka xwe li ser sînga xwe xwedî dikir. Ev rengê şîrdanê, li gor zanistiyên bijîjkî, yên vê demê jî, rast û durust bû, ji ber ku şîrê makanî saxlemîke bê hempa, hemberî rengên xwarinên bejî, dide zaroka şîra. Lê, ku zarok ji şîr vedibû, kêmasiyeke berçav dikete awayên xwardemeniya wê de, ji ber ku diya Kurd di civaka xwe de ne desthilatî zanînen naskirina normên xwarina zarokê bû, lewra zarok piştî şîrvekirinê ji pûrsandina nanê tîsî, şexelî dibû, qels diket û çîqzirav dibû. Ne tenha wilo, lê reng û awayên şîrvekirinê jî hêlîna xwe di hişê zarokê de bi tundî ava dikir (ew talîşka şîrvekirina bi zirêv, ne tenha li ser zimên dima, lê di hiş de jî şûna xwe digirt).

Diya kurd li gor mercên jiyane û civaka xwe, di warê pêçan, şûstin û veşûstinê de, zanîbû guh bide pêçeka xwe. Tim bihna pêçeka xwe bi qurnefil û bihnokan xweş dikir. Laşê wê bi ava beybûn û hermelê dişûşt, bi kum, lepik û gorên rîsî dikir, ew ji sir, seqem û tavê diparast. Lê, ku ev pêçek bi serpêkan diket, rengê guhdanê dihate

guhertin, û ew zaroka bi serpêkan ketî dibû barê zarokeke ji xwe mezintir, êdî xwe şil dikir, xwe bi toz dikir, xwe gemarî dikir û çav kul dibûn, poz bi lîk dibû...

Rengê landik û dergûşan, li gel awazên dê, li gel wê lorîna naz û şêrîn dilê zarokê xweş dikir, dihişt ku çavên xwe di bin sîbera konê dilovaniya dê de deyne ser hev, û aramiyeke bê sînor şax û perên xwe di berdane nava wê. Ev rengê aramiya zarokê, ne tenha di civakên kevnar de cihekî bilind li ser nêrdewana şarevaniya dema xwe digirt, lê wilo li ser nêrdewana şarevaniya dema îro jî digre. Lê, diya Kurd ev war jî ne bi zanistî derbas dikir, û zaroka xwe di fêxan û qêrînan de dirakir, ji hawar û gaziyeşer û pevçûnan ne diparast. Wilo, zarok tevlî hemî kul, derd, êş û xemên mal û civaka xwe dibû, û ew wêneyên ne çak û rind di jiyana wê de li ber çavan diman û di pêşerojan de, bi zarokê re dibûne girêkên psîkolojî.

Ev rengê xwedîkirinê dûrî bingehên avakirin û sazkirineke şarevanî ye ji zarokê re.

Wilo jî toreya zarokan nîşaneke bi behrîn e. Di çi civakê de peyda bibe, û bi rêzberî bê betakirin, wê ew civak weku civakeke pêşketî berçav bibe. Lê mixabin, ku toreya di civaka kurd, ya kevnar de tenha ma toreyeke devkî, û pareke herî mezin di riya makê re digiha zarokê. Û ji ber ku asoyên têgihîştina zanistî li ba vê makê pir teng û nizim bûn, guhertinên ne bi hişmendî, bi demê re, tevlî wan wêneyên çak û rind dibûn, û ew giranbuhabûna toreya zarokan kêmtir diket, qels dibû û bi rêz û bendên nezaniyê dihate pêçan, dihate neqîşandin û kutan. Bi vî rengî ji kirasê xwe derdiket, bi naveroka xwe beyhûde dibû û ji erkên xwe dûr diket. Êdî rola

êgir û şewatê, germî û peratê, mêrik û ziyane, leyistik û beravêtinê, gumgumok û werandina diranan, çavgirtin û gunehkariyê, destava li ser rê û nexweşiyê\* di hişê zarokê de dibûne girêk, ku di pêşerojan de jî nikaribû xwe ji wan serfiraz û azad bike. Wilo, bi van pîvan û regez û alavên têgihîştinê, lebt û tevgera zarokê, bi toreya wê, dihatin sînorkirin û diketin çarçeveke ne rast û durist.

### **Zaroka Kurd di berpirsariya bavê de:**

Belê, diya kurd gêl, kewden, nezan û ne xwende zaroka xwe bi vî rengî xwedî dikir û guh diyayê. Lê çawa be pişka herî giring û giran, di warê guhdan û perwerdekirina zarokê de, di riya têgihîştin, zanîn û pêşketina wê de, di civaka kurd, ya kevnar de (wilo jî di dema niha de) dikeve ser milên bavên. Dikeve ser milê wî bavê ku zarokeke xav, û ji zanistiyan şûstî ji maka wê werdigre, û gerekî guhdan û perwerdekirina wê, di pêşerojan de dibe, da wê jîr, zana û xwedî bîr û behwerî rake. Ew bîr û behweriyên ku karibin ji çarçeva civaka xwe derkevin û wî qaçilkê zanînen xwe yên saltgir, wê perda xwedîkirina xwe ya makanî, ber bi efraziye de, bavêjin. Wilo, veguhestina civakê ji warê gundîti, êlîti û malbatîyê bi hêla şarevaniyeke zanistî de, dibe erkên bavên - û berî her kesî, bavên zana û xwenda di civaka kurdî de. Lê gelo, bavên kurd erkên xwe, di vê civakê de dinasîn? Û eger dinasîn, bi çi rengî bizav û berxwedanên xwe, di warê hewildanên pêşketina vê civakê de, dikirin?

-----  
\* Bo naskirina van wêneyên ku dê zaroka xwe bi wan perwerde dikir, li gotara ARO "Xwedîkirina zarokan" vegere Kovara Stêr 19/1991 r.42-27

Bêgoman, ev rewş di demên kevnar de, tanî îro roj, cihê pirseke gewre ye, cihê rawestaneke kûr û dûr e, cihê mijûlî û lêkolînê ye. Û da em berê xwe gelekî fereh nekin, em li ser zehmetkêşiyên zarokan di civaka mêran (civaka kurd, ya kevnar) de narawestin. Ew civaka ku zarok zû bi zû, li gor pêwîstiyên dema xwe, dixistin bin barên kum û kolosan, di bin barê hilanîna qelûn û kîsikên tutinê de, di bin barê hilgirtina xencer, rim, kevan û tivingê de, bi barê rûniştina civatên kaçik û odan de, û bin barê karên giran de, çi gavantî be, çi xepartin û avdanî be, çi paleyî û kelpîçbirin be, wilo jî gêre û ritma kadînan be... û hd.

### **Vedana çirûskên zanistiyê di civaka kurd, ya kevnar de:**

Saya Xwedê û serê hozanê bi nav û deng M. Ehmedê Xanî, em dikarin çirûskên çakbîniyeke zelal hemberî tariya reşbîniyê di warê guhdan û perwerdekirineke zanistî, di civaka kurd ya kevnar de, bibînin. Belê, M.E.Xanî, di warê guhdan, perwerdekirin û fêrkirina zarokan de, weku di gelek warên din de jî, erkên (erkên bavan) bi xurtî dane pêş û bizavên xwe di vê riyê de bi çalakî kirin. Lewra "Nûbuhara Biçûkan" danî, û ew weku bernameya xwendina dibistanî pêşkêşî "hicrika kurdî" kir. Wilo, erkên bavan di civaka kurdî de, di dema xwe de, derbarî fêrkirina zarokê berçav kirin, da ew bavê xwenda, vê zaroka kewden deyne ser baskên ilm û xwendinê, û wê bilind bi alî asoyên zanistiyê de bifirîne. Dêmek, bingehên "Hicrika kurdî" (çudabûnek di navbera vê hicrikê û "Hicrika olî" de, di civaka kurdî de, heye) bi vedana çirûskên zanistiyê re hatin danîn. Ew çirûskên, ku M.E.Xanî, di rîya "Nûbuhara Biçûkan" re, di civaka xwe de vedan.

Rola vê hicrikê jî, di wê demê de, rola dibistanên seretayî bû, û bernameya xwendina wê bi xama Xanî bû.

### **Pêdiviya danîna "Nûbuhara Biçûkan" û fêrkirina zarokan:**

M.E.Xanî umîda xwe zarok, ew nîfşê nûhatî, ew mirovên biçûk, ku hîna mêjiyê wan paqij û taze ye, didîti û di rîya fêrkirina wan re pêşketina civaka kurdî didît. Erê, xweş dizanî, ku dibistana jîyanê çiqasî guh bide zarokê û xwedîkirina wê, bê xwendin û zanîn ew kêr û qels dimîne. Çiqasî geleporek civakî û pendiyên gelêrî hêja û giranbuha bin, bê xwendin û zanîn zarok xil û xav dimîne. Çiqasî dengê wê dayika kurd zîz û dilovan be, têt û perdên zanistiyê jê kêr in. Çiqasî civak hiş û gomanên zarokê bi wê guhdan û xwedîkirina saltgîr fereh bike, bê ilm û xwendin hişkî, bi asoyên xwe, sînokirî dimîne. Çiqasî jêmayên gelêrî bi endîşeyî û sihr û wêneyên xwe canê zarokê şîndar bike, û wê fêrî zanîneke gelêrî yî paqij, rast û xweş bike, bê xwendin zarok ker û lal dimîne.

Çiqasî zarok fêrî mijûlî û karên destan bibe, bê xwendin û zanîn bawî û seqet dimîne. Çiqasî zarok di civaka gël, kewden û nezan de, xwedî terz, endaz û yasan be, bê xwendin û tégihîştin endamekî bê çarçev di jîyanê de dimîne. Çiqasî dergehê zanistiyên gelêrî fereh û mezin bin jî, bê ferehbûna xwendin û nivîsandinê zarok tenha werêrek ronahî tê re dibîne. Û çiqasî zarok fêrî zanîn û nasînên dibistana jîyanî bibe, bê ilm û xwendin li ser pêpelûkeke pir nizim dimîne, eger ew pêpelûk di nêrdewana şarevaniya wê dema kevnar de bilind be jî. Bo rakirin û hilanîna van "çiqasî" yan tevan ji meydana pirsê, Xanî dest pê kir û got:

*Bismillahi rrehamani rrehîm  
Mebde'ê her ilmekî navê 'elîm*

R.2

Û “Nûbuhara Biçûkan“ di civaka kurd, ya kevnar de kire kilîta xwendin û nivîsandîne, kire mifta dibistana zanistiyê, da zaroka Kurd bi hişê xwe, ne bi hoşeyên xwe, tiştan ji hev derxe.

Dimîne, em sirincokeke biçûk derbarî pêdiviya danîna “Nûbuhara Biçûkan“ berçav bikin. Ew jî, di behweriya me de, ew e ku piştî M.E.Xanî “Mem û Zîn“ nivîsand, dît ku bû pirtûka eywanan, zarok jê bê par man û tenha di civatên mezinan de, di wê civata ku êdf zor e hişê kesên wê bê guhertin de, tê gotin û bihîstin. Û bi vî rengî beheweriyên wî, bi ferehî di civaka wî de, nayên çandin û ber nagirin, loma xwest karekî bo vê civakê di riya zarokên Kurmancan re jî bike, û vê civakê bi mêjiyê nifşekî nû li ser bingehên zanîneke zanistî ava ke, da ev nifş erkên xwe derbarî civak û gelê xwe nas bike û bizavê, bi hişekî vekirî, di ber de bike.

Belê, Xanî vê behweriyê, di “Nûbuhara Biçûkan“ de, rastûrê dide pêş, gava dibêje:

*Ne ji bo Sahib rewacan*

*belkî ji bo biçûkê Kurmancan\**

*wekî ji Quranê xilas bin*

*lazime li sewadê çavnas bin. R.3*

### **Kêsim û qilafetê “Nûbuhara Biçûkan“**

Vêce gelo, ev “Nûbihara“ ku em wê weku bernameya fêrkirinê di “Hicrika kurdî“ de dibînin, çawa hatiye avakirin?: Bi kêsimê xwe çawa ye?

Naveroka wê li dora çi zîlanê xwe dide hev?...

Bi kurtî, “Nûbuhara Biçûkan“ ji 37 rûpelên destê navê pêk hatiye (rûpelê pêşî qap e, ew dimîne ji 36 rûpelên nivîsandî). Rêzên wê bi tevayî 430 in. Ev rêz tev bi alîkariya 13 pêlawazên bi navkirî hatine hûnandin (pêlawaza 28 rêzên pêşî ne hatiye bi navkirin). Ji

rêzên “Nûbiharê“ 6 xezên dawî (wilo jî rêza pêşî) saf bi zimanê crebî hatine. Piştî navê her pêlawezekê du rêz cindîfî (pendî, hikmet) û şîret û dîtinên Xanî tîn, û pişt re du rêz pergala pêlawazê û danasîna kêşa wê tîn.

Wilo, 28 rêzên destpêkê di şûna pêşgotinê de hatine, şeş rêzên dawî jî di şûna paşgotinê de hatine, û 52 rêz pergalên her 13 e pelawaz û danasîna kêşa wan e. Bi vî rengî M.E.Xanî “Nûbuhara Biçûkan“, weku bernameya xwendina “Hicrika kurdî“, ji 344 rêzan datîne. Û ne dût e, ku ji ber vî qilafet û kêsimê biçûk, gelek vê pirtûkê weku “Fehengoka Xanî bo biçûkan“ didine nasîn!

Gelo, ev behwerî û danasîn şûngirtî ne?

Naveroka “Nûbuhara Biçûkan“ an jî xwe li dora zîlana fêrkirina “zarokên Kurmancan“, vekirina hişê wan li dîtinên gerdûnê û guhertina civaka kurdî, çi bi hêla çandina riştî, çakî û qencyê de be, çi jî bi hêla guhertina civaka kurdî ber bi xwenaskirineke netewî de be, dide hev.

### **M.E.Xanî û mercên avakirina “Hicrika kurdî“**

Bo ronîkirina vê pirsê, emê bihingivin behweriyên Xanî, ku di nav helbestên “Nûbuhara Biçûkan“ de çandine. Û da em dûtî zîlana lêkolîna xwe nekevin, emê ji pêşgotinê û rola ziman zanîne li ba Xanî dest pê bikin û bînin bîra xwe, ku zargotina kurdî dibêje: “Yê zimanekî zanibe mirovek e, yê du zimanan zanibe du mirov e“.

-----  
\* Peyva Kurmanc di danûstandin û zargotina kurdî de bi wateya giştîya gel (reşaya millet) ve hatiye girêdan. Xanî jî ev peyv di vê wateyê de pêk aniyê, û mebesta wî ji gotinê ew e, ku Nûbihar ji tevaya gelê xwe re dinivîse.

Bêgûman, M.E.Xanî oldarekî bi hêz û rêz bû, misilmanekî bi rêk û pêk bû, û li gotî yasayên ola misilmaniyê zanakî bi nav û deng bû. Lê, ne dûrî zanistiyên dema xwe bû, û zanyar û rewşenbîrekî mezin bû. Di warê zimanzanînê de jî, ne tenha zimanê kurdî (bi gelek zaravên wî ve) dizanî, lê wilo jî zimanê tirkî, farisî û erebî jî baş dizanî. Ji van zimanan tevan, di dema wî de, zimanê erebî ne tenha zarê pîroz (zimanê Quranê) bû, lê wilo zimanê dîn, dewlet û zanistiyê bû. Loma, M.E.Xanî li ser mercên avakirina "Hicrika kurdî", bi hûrbîni, rawesta û xwest zanîna xwe, di riya vê fêrgehê re, di civaka xwe de bike "weqfe" û belav bike. Bo wilo, berê xwe da "biçûkê Kurmancan" û bizavên xwe di ber fêrkirin û perwerdekirina wan de kirin. Loma jî, M.E.Xanî pêwîst didît, ku zarokên Kurmancan fêrî vî zimanî bike, da hişê wan li dinyayê û nûçe û bûyerên wê vebe, da li cihanê ne çavmîç û kor bin, lê çavbel û dûrmezyên bin.

M.E.Xanî hewl dida, ku zarokên Kurmancan fêrî Quran û zimanê Quranê bike, lê ev fêrbûn ne armanca wî ya dawî bû, ne hewildana ji bo jibîrkirina zimanê gelê wî bû. Armanca wî vekirina hişê zarokê bû, di riya zimanekî alîkar re, ne şûngir re. Loma dibêje:

*Ne ji bo sahib rewacan  
belkî ji bo biçûkê Kurmancan  
wekî ji Quranê xelas bin  
lazim e li sewadê çavnas bin  
da bi van çend reşbelean  
li wan tebî'et melean  
derê zihnê vebîtin*

*herçî bixûnit, zehmetê ne bîtin. R3.*

Dêmek, peyva "xwendin" ê li ba M.E.Xanî ne bêjeyeke taybetî ye, ku bi misilmaniyê ve bê girêdan, lê gotineke gelemper e, ku bi hemî zanistiyên ve tê girêdan.

Belê, ne tenha Xanî dixwaze zarokên Kurmancan fêrî xwendina Quranê bike, lê dixwaze wan fêrî xwendinê, bi wateya wê ya giştî, bike.

Wilo, Xanî rola xwendinê berçav dike, û fêrkirina zarokên Kurmancan ji zimanê wan re (bi xwendin û nivîsandin), bi alîkariya zimanekî xurtir, erkên xwe derbarî civaka xwe dibîne, da vê civakê ji gêlîtî û kewdeniya wê xelas bike, da hêlîna rewşenbîriyê di nav de ava bike, gava desthilatî xwendina çavkehnîyên bi zimanên biyanî hafî weşandin be. Wilo, Xanî zanîna wan zimanan pêwîst didît, û bizav di ber fêrbûna wan de dikir, da mirovê xwende desthilatî dîtina nexweşên civaka xwe be, û bi zanebûn dermanê saxlemiyê peyda bike û bi kar bîne.

### **M.E.Xanî û bingehên avakirina "Hicrika kurdî"**

M.E.Xanî bingehên vê hicrikê bi du awayan, di "Nûbuhara Biçûkan" de, danîne. Awak jê bi hişmendîya giştî ve, bi taybetiyên têgihiştin, zanîn û mercên pêşketinê ve, bi reftariya mirovan di civakê de, û bi avakirina endamên bi bîr û behweriyên saxlem ve tê girêdan. Yek jî saf bi sîstema xwendin û fêrkirina zimên ve tê girêdan.

M.E.Xanî awayê pêşî, ji bingehên "Hicrika kurdî", di riya 13 cot malikên helbestî re çareser dike. Ew jî me bi navê "cindîtiyên Xanî", ango "pendiyên Xanî" dane nasîn.

M.E.Xanî awayê din jî bi berê zimên û rêzimên ve girêdide, û dîtînen xwe yê felsefî di hebûna jiyânê de, beçav dike. Bi vî rengî, xanî ramanên xwe ji fêrkerên hicrikê re diraxe, û di riya wan re behweriyên xwe pêşkeşî şagiran dike. Lê, mixabin, ku van fêrkeran, bi demê re, ramanên Xanî bi şûn xwe de avêtin, û hicrika ku Xanî dixwest ava bike ji pendî û dîtînen wî bê par ma.

Lewra, em bivê nevé dibin, ku li ser du terman, eger bi kurtî be jî, biaxifin. Yek ji wan: "Hicrika kurdî" û cudabûna wê ji "Hicrika Olî" ye. Terma din jî, "Bername" ya ku M.E.Xanî ji bo vê hicrikê danî ye.

### **Danasîna "Hicrika kurdî" û sistema fêrkirina wê:**

Bêgoman, hicrik rola xwe-ndegehan, di beşê civaka kurd, ya misilman de, di dema Xanî de (wilo jî di demên pêştir û paştir de), dileyist. Dêmek, hicrik cihê xwendin û fêrkirina ola misilmaniyê bû. Şagirên wê jî du celeb bûn. Celebek jê zarok bûn (5-11 salî), ku ji elfebayê dest bi fêrbûnê dikirin, û li gor pergalên hicrikê û zanebûna fêrkerên wê hînî xwendin û nivîsandinê dibûn. Ev e celebê ku Xanî "Nûbuhara Biçûkan" ji bo wî nivîsî. Yek jî dikete warê xwendina feqetiyê û di pêşerojan de berdewamiya xwendina melatîyê dikirin. Ev celeb jî ne warê lêkolîna me ye.

Lê, çawa be vê hicrikê suxtên xwe fêrî tîpên Qurana pîroz dikirin, fêrî xwendina Quranê dikirin, fêrî rêz û bendên ola misilmaniyê û navdarê vê olê dikirin...

Wilo, eger em vê behweriyê bi rewanî bidin pêş, emê gerekî rawestaneke dûr û dirêj bibin, ku me dîrî mebesta me ji vê lêkolînê bixe. Lewra, emê bi kurtî li ser danasîna vê fêrgehê û guhertinê ku Xanî dixwest tê de peyda bike rawestin. Lê, berî vê rawestanê emê pirsekê ji xwe bikin, û hewildana bersivdana wê bikin, da em xwe, di riya vê bersivê re, xwe bi armanca xwe û Xanî bigihînin.

Gelo, çima me du navên cuda li vê fêrgehê kirin, û me sistema xwendina wê bi "Nûbuhara Biçûkan" ve, weku bernameya Xanî jê re, da nasîn?

Ev pirs di serê her kesî de li bersivê digere, û behweriyên başqe dadixe meydana giftûgoyê. Ew jî ew e, ku

hicrik fêrgeha ola misilmaniyê ye, û ti fentazî ji şirovekirina rola wê re navên. Wilo jî, fêrkerê wê Xanî be, çavkehnîyên wê tenha Quran, Hedîs û Sîret in, ew kokên ku nayên guhertin, û destavêtina wan gunehkariyeke mezin bi ser xwediye xwe de dibarîne. Vêce, cudabûna navan ji fêrgeheke bi vî pesnî be, tiştêkî ji kelevajiyê pê ve berçav nake!.

Halo, em dîr çûn, û em bi vî awayî tiştêkî bi serê hev naxin. Û da em hev gunehkar der nexin û bi bedgomanî li hev nemeyzênin, emê li danasîna Xanî, ku di rûpelên buhurî de hatiye nivîsandin vegehin. Belê, "M.E.Xanî oldarekî bi hêz û rêz bû, misilmanekî bi rêk û pêk bû, û li gorî yasayên ola misilmaniyê zanakî bîrkêş û hişmendekî bi nav û deng bû. Lê, ne dîrî zanistiyên dema xwe bû, û zanyar û rewşenbîrekî mezin bû..."

Vêce, gelo çî pê ve ye, ku ev rewşenbîrê gewre taybetiyên civaka xwe, ew taybetiyên ku ne dijraberî ola wî ne, lê dikevîne makecoya vê olê de, tevî ola xwe bike û xweşî û başiyê di nav gelê xwe de, li gor dîtinên xwe yên ola misilmaniyê, biçîne!?

Bi vî rengî, em dikarin bersiva pîrsa xwe di riya raxistina du xalan re bidin, û li zîlana riya lêkolîna xwe vegehin:

1. Sistema fêrkirinê di vê hicrikê de bi hunrên zimên, rêzîmên û hişê kurdî ve dihate girêdan, û armanca wê vekirina hişê zarokên Kurmancan bû, da li nasîn û têgihiştinên gerdûnê çavbel bin, ne çavmiş û kor bin, da weku Xanî dibêje:

*Derê zihnê vebîtin*

*Herçî bixûnit zehmetê nebîtin. R3*

2. Eger em bi hûrbînî li hebûn û pêşveçûna (bi wateya şûnguestinê) vê hicrikê meyzênin, emê taybetiyên civaka kurdî tê de bipelînin, û cudabûneke bi mercên xwe diyar di navbera wê û hicrikên civakên erebî,

tirkî û farisî de bibînin. Û ji ber ku M.E.Xanî taybetiyên civaka xwe, di riya pendiyên xwe re, guhestin vê hicrikê, me navê “Hicrika Xanî”, ango “Hicrika kurdî” lê kir, û ew hicrika ku saf bi ola misilmaniyê ve (dûrî taybetiyên civaka kurdî) hate girêdan, me navê “Hicrika olî” lê kir.

### **Têkçûna “Hicrika kurdî”**

M.E.Xanî “Nûbuhara Biçûkan” di gelek qonaxan re derbas dike. Qonaxa herî giran ji bîr û hişên suxtan re cindîtîyên (pendî, hikmet) wî ne, ji ber ku gelekî renc û kutayî hatine.

Şirovekirin û ronîkirina wan, di “Hicrika kurdî” de, dimîne barê fêrkerên vê hicrikê, da ew jî li gorî jîrbûn û têgihîştina xwe desthilat be, ku hunerên xwe bide der, û şagirên xwe li gorî vê têgi-hîştinê jîr û zana rake. Lê, mixabin, ku “Hicrika kur-dî”, ew hicrika ku Xanî bingehên wê danîn, kirasê “Hic-rika olî”, di riya fêrkerên ne têgihîştî re, bi bejna xwe de berda, tanî roj bi roj ev bingeh jê hatin dûrîkirin, û ji armancên xwe dûr ket. Wilo, fêrkerên vê hicrikê pendiyên Xanî bi şûn xwe de avêtin, tanî “Nûbuhara Biçûkan” tenha weku “ferhengoka” suxtan dane nasîn, û weku qaçilkeki vala berçav kirin.

Wilo, ev hicrik, di riya fêrkerê ne têgihîştî û nezan re giha warê bidestxistina qazencên jiyani, yên beyhude, yên rojane, wek:

“tebbet...bêne mirîşkeke weku bet” û “welma’ûne...bêne lihek sabûne...”, û armanca wê tenha ma jiberkirina Quranê, ne fêrkirina wê. Û cudabûneke gewre di navbera “jiberkirin” û “fêrkirin” ê de heye. Wilo, mîkanîzma “jiberkirinê” “Quranxwên derxistin, ne xwendevan. Belê, di vî warî de mebesta Xanî, di avakirina “Hicrika kurdî” de ne tenha pêk ne hat, lê têk çû.

Êdî dîtin û behweriyên Xanî ziyana herî mezin dîtin, û ketin bin destên talankerên nezan- fêrkerên nîvkewden de.

### **Naveroka “Nûbuhara Biçûkan”**

Erê “Nûbuhara Biçûkan bi tîpên erebî hatiye nivîsandin, lê kirasê kurdî bi bejna wê de hatiye berdan. Belê, kurdî jî di wê demê de bi van tîpan dihate nivîsandin. Dêmek, ew şagirê ku fêrî nivîsandina tîpên erebî dibû, wilo jî fêrî pêkanîna tîpên kurdî (tevî taybetiyan) dibû. Wilo, piştî ku şagiraan elfeba, weku naskirina tîpan kutadikirin, diketin deriyê pêşî ji fêrbûna zimên û rêzimên, û şagirên vê hicrikê bi alîkariya “Nûbiharê”, hem fêrî zimanê xwe dibûn, hem jî fêrî zimanê pîroz (zimanê Qûranê) dibûn.

Êdî, gotin di hişê zarokê de, ne bi wênan ve dihatin girêdan; lê bi wateya wan ve.

Bi vî rengî M.E.Xanî “Nûbuhara Biçûkan” bo zarokên Kurmancan datîne, û li gorî bîr û behweriyên xwe yên olî û netewî ava dike. Lê, mixabin ku di pêşerojan de, fêrkerên ku li ser rêça Xanî meşin, ketin bin gelek barên zor û giran de, û şerê wan, di dîrokê de, bi gelek mercan hate kirin, tanî giha pileya bidarvekirina wan. Û wilo, fêrkerên ne desthilat şûna wan girtin, tanî berxwedana şopnasên Xanî bû zargotîneke gelêrî, ku dibêje “Nîvtextoran can bi der dan, nîvmela dîn bi der dan”. Belê, şopnasên “Hicrika kurdî” fêrkerên “Hicrika olî” weku nîvmela dinasîn, ji ber ku nêvî ji ola xwe pêk ne tanîn, ew nîvê ku bi gel û welatê wî ve girêdayî bû, tanî bûne alav di destên serdestên xwe de û serê xwe ji fermanên desthilatên xwe re ditewandin. Û ola misilmaniyê sertewandinê li ber zulmê gunehkarî dibîne.

Erê, M.E.Xanî naveroka "Nûbuhara Biçûkan" li dora yek zîlanê digêrîne, lê vê naverokê bi du çerxan dilivîne:

**A- Pendiye M.E.Xanî di "Nûbuhara Biçûkan" de:**

M.E.Xanî pendiyên xwe di riya 13 e cot malik ve, bi alîkariya 13 e pêlawazên bi navkirî re, çareser dike:

1. Xanî navdariya mirov bi kar ve, bi westan û lêvegerê ve, bi wê dilopa ku şûna xwe di latê de dikole girê dide, û dibêje:

*Heta tu dewr û dersan nekê tekrar û mesrûf*

*Di dinyayê tu nabê ne meşhûr û ne me'rûf* \* R.4

2. Xanî êş û jana mirovaniyê di qeyd û bendan de dibîne, û di rakirin û avêtina wan de aramî û şahiyê dipelîne. Diyar dike, ku mirov di rewşeke serbixwe de dikare bibe xwedî dan, û desthilat e ku cîhana xwe ava bike, weku wî bilbilê serfiraz, ku bi awazên xwe şahiyê di nava gulistanê de peyda dike, gava dibêje:

*Perde ku rabbitin ji ber 'aridê dilsitanî xweş*

*Dil ji xeman ke bête der bilbulê gulsitanî xweş.* R.6.

3. Xanî dibîne, ku zanîn û hişmendî milkekî giştî ne, ne taybetî ne. Lewre kesê zana weku kehniyê ye, gerek e her kes desthelat be ku jê vexwe. Bo wilo jî pêwîst e, ku ev mirovê navdar dilovan û xwedî sebir be. Dibêje:

*Arifê ku bi qencî me'rûfî bit*

*Dê helîm û sabir û mewqûfî bit.* R.8

4. Xanî gerek û pêwîst dibîne, ku mirov berxwedanê di ber armanc û bîr û behweriyên xwe de bi tundî bike, li wan bi xurtî bikole û li pêkanîna wan bilezîne, nemaze gava ev armanc bi giyanê mirov ve girêdayî bin û di nava mirov de hatibin çandîn. Di vî warî de dibêje:

*Ger dê te meqsûdek hebê, lazim divê lê bê bilez*

*Xesma te me'bûdek hebê, dayim di emrê wî bibez.* R.10

5. Xanî zanistî û gêlitiyê weku zêr û tûncê dide ber hev. Dibîne, ku ew gêlitiya xwe bi zanistiyê biguhere, tûnca xwe bi zêr dikute. Xanî, bi vî rengî, dixwest civaka kurd, ya gêl bi ilim bineqîşîne. Û bidestxistina vê yekê di riya xwendin, fêrkirin û perwerdekirina nifşên nûhatî (zarok) re didît. Dibêje:

*Herçî bi ilmê cehl kir mubeddel*

*Sifrê xwe wî kir bi zêr mukellel.* R.12

6. Xanî mafê pozbilindiyê nade wî kesê binst, ku cirîd di bermala wî de dibin, û dibîne ku ew payabûna pûç, vala û bê bingeh nan nade xwediyê xwe û wî bi kiras nake. Lewra ji mirovê wisa dixwaze ku ne tenha dev ji vî rengê payebûnê berde, lê bi çelengî kar di ber xwenasiyeke rast û durist de bike. Hinga bi dilxweşî û rûspîtayî dikare serê xwe bilind rake, gava xwe bighîne vî warî, û vî mercî bi dest bixîne. Xanî dibêje:

*Ey ku te kibri dayim kirye ji bo xwe merkeb*

*Ewil tu pê bikeyê, paşê bi kêre merkeb* R.13

7. Xanî cudabûneke eşkere dixwe navbera zanistiyê û olîtiyê. Dibîne, ku bîrgeşî û zanyarî di riya xwendin û kar re têne qezenckirin, lê şêxîti û sofîti bi kerametên ve têne girêdan.

Di vî warî de wilo dibêje:

*Şeyx û sofîti keramet û ilme xwendin ilm û e'mel\**

*Xilwet e hucr e terîqat e şerî'et bê xelet.* R.15

8. Xanî bi civaka xwe mijûl dibe, kil û kêmasiyên wê dibîne, û dighe wê

\* Li gor zaravê Nûbiharê dibin 'neckeyî, nebêyî' piştî sivikirina 'ê'.



9 behweriyê, ku civaka çak û saxlem bi kesên xwe vî pesnî werdigre. Lewra, weku dermanê saxlemiya civakê pêwîst dibîne, ku endamên vê civakê hêja, çeleng, rast û rûdar bin, da bi çakrewîştî serkêşiyê bikin, da dûrî wan êş û nexweşiyên ku giyanê her civakê, çiqasî hêja be jî, ji hev dixin û nexweş dikin, nemaze derew, fen û fûn û xwehrî. Dibêje:

*Ger te divêtin tu bibê Mîr û ser û mu'teber*

*Kizb û xilafê mebêj, ger te bikin ker ni ker.* R.18

9. Xanî pêr û mêzîna tiştên kesayetî û yên giştî ji hev cuda dibîne. Dibîne, eger mirov li ser jidestçûna tiştêkî xwe xemgîn bibe û li windakirina wî tiştî poşman bibe, lê bêgoman bi windakirina tiştên giştî (tevayî) re gunehkar dibe, ji ber ku Xanî tiştên giştî (welat jî tiştêkî giştî ye) di pêpelûka evrayî (muqades) de dibîne, gava dibêje:

*Herçî ko ji dunyayê berda şite damen bû*

*Bê şubhe di nêv 'amê efra şite gerden bû.* R.21

10. Xanî kesekî hemberî mirovê zanyar nabîne, û di ser wî re naragire. Nemaze, ku ev zanîn û têgihîştin ne di qaşilkê xwe de winda û dûrî pêwîstiyên gel û civakê bimîne, lê bêne bi karanîn. Dibêje:

*Ger te divêtin ku beraber nebitin kes bi te re*

*ilmê bixûn, hem e'melê tu bike sin'et ji xwe re.* R.23

11. Her weha jî, Xanî li ser xwendina ilmên (zanistiyên) qenc diraweste, û dewlemendiya wî bi giranbuhabûna bidestxistina welatekî dipêve. Belê, ilmê "qenc" li ba M.E.Xanî bê sînor û bê çarçev e. Li vî şeweyê zanistiyê bi

çavekî dûrbîn û hişekî vekirî dimeyêzêne, û desthilatiya olê li ser nake pîvana çeyetiyê, gava dibêje:

*Herçî kesê ilmekî qenc xwendiyê Dewlet e, ger wî bi esil zaniye.* R.24

12. Xanî li buhara dilan vedigere, li kêf û şahiya gel û xweristê dinêre û dozê li her kesî dike, ku di nûbuharê de (di cejna 21 ê adarê de) li gel dîlber û dost û hevalan herin geşt û seyranê. Wilo, Xanî xweşiya vê rojê bi vîna jiyana herî xweş ve girêdide û bi awazekî şêrîn dibêje:

*Di fêsla nûbiharê de di gel dîlber biçin geştê*

*Ji ew xoştir umur nabit, li min ev hal gewî xweş tê.* R.27

13. Xanî, di dawîya şîret û pendiyên xwe de, ji bîr nake ku waneyekê bide fêrkerên "Hicrika kurdî", gava bi wan dide nasîn, ku fêrker çiqasî dilkevir be û di warê fêrkirinê de hişk û zivir be, divê bi şagirên xwe re, di warê têkilîyan de, nerm, dîlnaz û diltenik be. Banga xwe ji fêrker re wilo datîne:

*Mu'ellim bila dil wekî ber bitin*

*Divêtin ku şagir dilber bitin* R.29

**B- Ziman û rêzimanê "Nûbuhara Biçûkan" û wane û dîtînen M.E.Xanî**

Piştî berçavkirina pendiyên Xanî, dimîne ku em li parçê didiwa ji naveroka "Nûbuhara Biçûkan" vegerin, û wî, bi kurtî, dibin sîbera çend xalan de berçav bikin:

1. M.E.Xanî dergehê pêşî ji "Nûbuhara Biçûkan", piştî pêşgotinê, bi danasîna xwedê, pêxember û xelfan dest pê dike, û pêdanasîna navdarên ola xwe bi şagiran, erkê xwe yê pêşî dibîne. Dibêje:

-----  
\*Di nerîna min de malika pêşî ji vî cotê malikan ne li gor kêşa pêlawazê hatiye, ji ber ku ketiye bin barê şaşîtiya çapê de. Lewra, ez rengê rast ji vê malikê re halo dibînim:

Şeyx û sofi keramet, ilm e xwendin û e'mel.

*Xwedê ullah e, qasid resûl e, ey xwedêzan*

*Xelîfê çar in, herçar imam in, ey musulman.*

R.4 Piştê her çar imaman û her deh mizgîndayên buhiştê bi nav dike, û ji şagiran dixwaze, ku bi dil wan nas bikin, gava dibêje:

*Divêtin tu bizanê bi dil navê imaman*

*Muhemmed, Malik û Ehmed, ewê dîtir ke Nu'man*

*Mubêşşer bûne deh kes, ji eshaban bi te'yîn*

*ku dê biçne biheştê, Xudê mizgînî da wan.* R.5

Dîse li pêxemberê ola misilmaniyê vedigere û bi tundî li ser pêwîstiya naskirina wî ya kokane diraweste, û dibêje:

*Li me ferze bizanin, resûlê xo bi tehqîq  
Bi mewlid, hem bi medfen, binasin da û baban.* R.5

2. M.E.Xanî vê danasîna xwe di rûpel û nîvekî de, bi yazdeh cot malik, kutayî dike. Paşê xwe di "Nûbihar" ê de noq dike û li hemî gov û berpâlên gotin û parçên axaftinê digere, çî gotinên ferhengî bin, çî yên rêzimanî bin, çî jî avakirina hevokan be (hevokên saltgîr li gorî hişê zarokan). Wilo, Xanî hemî parçên axaftinê (çî guhêrbar bin, çî neguhêrbar bin) li bêjînga "Nûbuhara Biçûkan" dike. Bi vî rengî ziman û rêzimanê kurdî bi zarokê şêrîn dike, lê li gorî pîvanên ziman û rêzimanê erebî, bi şagîrên "Hicrika kurdî" dide nasîn. Û ji ber ku ev beş bergeheke pir fereh e û dergehekî zor mezin e, emê di bin sîbera çend xalên alîkar re derbasî nava wî bibin:

#### **a. Nav:**

M.E.Xanî bi xurtî li ser navan radiweste, û komên navên şênber (yên mirov dikare wan bi hestên xwe nasbikê û bipelîne) û yên razber (yên

mirov bi hestên xwe nikare wan bipelîne û nas bike, lê bi ramana xwe nas dike) bi ferehî berçav dike. Emê, weku nimûnê li ser du cot malik rawestin:

*Ibni kur e, binti keç e, şehri xezûr e, mam 'em*

*'Emmet met e, 'emame şaş, cedde çî ye, xo pîreda.* R.6

*Menkib û ketfî herdu mil, bal û demîr û gelbi dil*

*Cezl û fereh çî şahî ye, mewti mirin, girin beka.* R.7

Em di vî beşî de li ser wateya ferhengî ji navan re narawestin (weku nimûne: Şehir bi kurdî zava ye, ne xezûr e), lê emê tenha li ser cîwarên wan yên rêzimanî rawestin.

Wilo, navên cotê pêşî ji van malikan, di warê rêzimanî de, bi vî rengê jêrîn tene şirovekirin:

(Kur, xezûr, mam)- ev hersê nav, navên şênber in, canbar in, yekjimar in û bi zayenda xwe nêr in.

(Keç, met, pîreda)- ev hersê jî navên şênber in, canbar in, yekjimar in û bi zayenda zwe mê ne.

Lê (şaş)- navekî şênber e, ne canbar e, yekjimar e, bi zayenda xwe mê ye.

Navên malika dawî ji van cotemalikan, navên razber in, lê koma her navekî ji yên din cuda ye. Wilo:

Şahî: Ji koma navên abstraktîv e (me'newî), bi zayenda xwe, di forma hevbendî de, mê ye.

Mirin: Ji koma navên kirinê ye, bi zayenda xwe, di forma hevbendî de, mê ye.

Girin: Ji koma navên ramanî ye, bi zayenda xwe, di forma hevbendî de, nêr e.

#### **b. Rengdêr:**

M.E.Xanî li du şeweyên vî parçê axaftinê yê guhêrbar radiweste. Yekî ji

wan di bin pergalên rengdêrên  
rengkerên erebî (sifat mişebehe bilfil)  
re derbas dike. Weku:  
Ebkem çî lal e, e'rec çî leng e  
Yekçav e e'wer, ekme h xwe kor e.  
R.13

Şeweyên din jî bi wateya navên  
berhevkirinê (esma eltefddîl), lê bê  
danîna pêpelûkên çeyîtiyeke rastûrê  
berçav dike. Weku:

*Ekyes mirovê têjfehîm, esme' mirovê  
guhbiçûk*

*Eşkem keyo\* hatî birîn, eslez wekî  
eyhem ker e. R.11*

Wilo jî rengdêrên renglêker, yên ku  
dibine navên berhevkirinê jî, ji şagiran  
re dadixe ser rûpelên "Nûbiharê".  
Weku:

Exder çî kesk e, ehmer xwe sor e  
Ezreq hişîn e, cewreb çî gor e. R.12

**c. Cînav** (bernav, pronav):

M. Ehmedê Xanî ji cînavên kesîfî, yê  
foma rast tenha cînavê kesê didwa, yê  
pirjimar (hûn) pêk aniye. Ji cînavên  
nişankirinê jî yekî pêk tîne. Weku:

*Te'alû serî'en, werin hûn bi lez*

*Fe hazhi cennet, eve ha ye rez. R.36*

Hûn- cînavê kesîfî, yê forma rast e, ji  
kesê didiwa yê pirjimar re tê pêkanîn.

Eve- cînavê nişankirinê ye, bi navên  
nêzîk yê yekjimar re tê pêkanîn.

Ji cînavên pirsê jî M.E.Xanî tenha  
cînavêkî, di forma yekjimar û pirjimar  
de, pêk tîne. Dibêje:

*Eyser û yusra çî ne, ew herdû çep*

*Rastê çî ye, eymen û yumna bizan. R.25*

Çî ne- cînavê pirsê di forma pirjimar de  
ye.

Çî ye- cînavê pirsê di forma yekjimar  
de ye.

Lê, M.E.Xanî cînavên kesîfî, yê forma  
tewandî bi tevayî, pêvî cînavê kesê  
sisiya yê mê (wê), pêk tîne; gava  
dibêje:

*Eleyke, li ser te, 'eleyye li min*

*'Eleyhi, li ser wî, we minnî ji min*

*'Eleyna, li ser me, 'eleyhim li wan*

*'Eleykum, li ser we, xesaret ziyan. R.36*  
(Min, te, wî)- cînavên kesîfî ne, yê  
forma tewandî ne, yekjimar in. Cînavê  
kesê sisiya yê mê (wê) bi Xanî re  
derbas ne bûye.

(Me, we, wan)- cînavên kesîfî ne, yê  
forma tewandî ne, pirjimar in.

Wilo jî M.E.Xanî têkilî pênc grûpên  
cînavan nabe.

**d. Jimar:**

M.E.Xanî jimarên bi şagîrên "Hicrika  
kurdî", weku beşekî ji parçên axaftinê  
yên guhêrbar, dide nasîn. Lê tenha li  
ser jimarên bingehîn radiweste, û  
jimarên dehên pêşî ji yê dehta û yê  
sedta cuda dike. Wilo dest pê dike:

*Wahid û isnan çî ne, ew yêk û dû*

*Sê ne selas, erbe'e çar in 'eyan. R.26*

Wilo, jimarên dehê pêşî dibêje, tanî  
dighe:

*Tis'e, 'eşer, herdû neh û deh tamam*

*Sed mi'et û elfi hezar, ey ciwan. R.27*

Lêbelê, M.E.Xanî li ser jimarên mezin  
(milyon...), jimarên carkirî (yeko-yeko,  
yekta, duta,sêta...) jimarên kombêj  
(şeşek, heşteşek,...), jimarên rêzda  
(yekemîn, pêşî,...) û jimarên parçekirî  
(çî yê bingehîn: niv, sêyek, çaryek,... û  
çî yê dehyekî: 0,1...0.01...) na raweste  
û wan bi şagîran nade nasîn (bi ser ku  
parvekirina pêmayên civaka  
misilmaniyê bi wan saz dibin). Weku  
nimûne: "Mehr û heşteşek", "zekat 0,1"  
û...û t.d.

**e. Lêker:**

Beşê herî mezin, giran û giring, di  
ziman û rêzimanê kurdî de (wilo jî di  
piraniya zimanên cîhanî de), nasîn û bi

\* Di Nûbiharê de (Keyu) hatiye, lê ne dîr e ku  
şaştîya çapê be. Ji ber 'Keyo hatî birîn' û 'Ke  
guh hatî birîn' di bin pergalên yek pêl û kêşê re  
derbas dibin. S.Namî dibêje:

- Me 'guyê' (sivikiya 'guh yê') ji ber kir.  
H.Selefî 'Ekşem mirovê guhbirî...' dinivîsîne.

durustî pêkanîna lêkeran û veguestina wan e. Di vî warî de jî, M.E.Xanî hin nimûne ji şagirên "Hicrika kurdî" re, di rûpelên "Nûbuhara Biçûkan" de, dadixe. Weku:

*Hatim eteytu, atî tîm, wî hat, iitî were  
E'teytu me da, xuz bigir, irce' vege,  
izheb here. R.11*

*Ic'el bigêr, isheq bihêr, idrib biqut,  
inzur binêr*

*Iqre' bixûn, i'lem bizan, eyman bi  
me'na bawer e. R.11*

Gelo lêkerên ku Xanî bikar anîne, di çi rengî û çi formê de ne?

(Hatim, tîm, wî hat, da)- Ji lêkerên hîmî ne, saltgîr in, makderên wan "hatin û dan" in, rayên dema buhûrî "hat û da" ne. Kirde (subject) bi lêkerê pêşî re veşartî ma ye, bi yê paşî re diyar hatiye.

(Were, vege, here)- Ev lêker tev di forma fermanî ya erêfî de hatine. Bi kesên didiwan, yê yekjimar (tu) û pirjimar (hûn), re têne veguhretin.

(bigêr, bihêr, biqut, binêr, bixûn, bizan)- Ev lêker jî tev di forma fermanî ya erêfî de hatine. Bi kesên didiwan, yê yekjimar (tu) û pirjimar (hûn), re têne veguestin. Ev herdû grûpên lêkeran, li gorî kirde (subject) "e" û "in" distînin, lê M.E.Xanî "e" di veguestinê de, li gorî pergalekê pêlewazê, rakirine. Di warê pêkanîna makderan de jî Xanî dibêje:

*Işq û mehebbet çi evîn, buxd û 'edawet  
çi nevîn*

*Inhezemû cumle revîn, ixtelesû yanî  
revan. R.22*

("Evîn" û "nevîn")- bi ser ku Xanî ev herdû bêje, li gorî erebî, weku makderan berçav kirine, lê di kurdî de weku navan mane. Rayê afirandina lêkeran jî van navan der nayên. Dimîne, ku ev bêje, bi demê re, ketibin bin barê guhertinê kokane de, û

veguhestina wan weku lêkeran, bê dîtin û nasîna rayên deman e, bê sîd dimîne. "Revîn"- Makder e, rayê dema berê "revî" ye, yê dema niha "rev" e. Lêkerê vê makderê di veguestina xwe de saltgîr e.

"Revan"- Makderê vê bêjeyê "revandin" e, rayê dema berê "revand" e, yê dema niha "revên, revîn" e. Lêkerê vê makderê di veguestina xwe de derhingêv e.

#### f. Parçên axaftinê yê neguhêrbar:

Bê çawa M.E.Xanî li ser parçên axaftinê yê guhêrbar radiweste, wilo jî parçên axaftinê yê neguhêrbar (hoker, daçek, gehandek) bi şagirên "Hicrika kurdî" dide nasîn.

- Di warê hokeran de dibêje:

*Remel zû li rêçûnê, hem herwele  
Nehafet zebûnbûn e, hem hewqe. R.34*

*Te'alû serî'en, werin hûn bi lez  
Fe hazihi cennet, eva ha ye rez. R.36*

"zû, bi lez"- herdû hoker in, rewşa kirinê nîşan dikin û bersiva pirsên: çawa?, çilo? û bi çi rengî? didin.

- Xanî daçekan jî bi xurtî bi kar tîne. Weku:

Eyne li kû, keyfe kû we, tehti li bin, e'la li ser

Summe ji paşî wê bizan, ente tu wî, lî bo mi ra. R.8

(Li, li bin, li ser, ji, bi, bo)- ev tev daçek in, ku desthilatê tewandina nav, cînav û jimar in.

- Gehandek jî li ba Xanî bi piranî têne pêkanîn, nemaze gehandeka "û". Xanî dibêje:

*Şehd û 'esel herdû çi ne, hingivîn  
Ar yû senûn û dereb ew ji wusan\*. R.25*

(û, jî)- du gehandekên yekta ne, ku bi erkê bi hevgerêdana nav, lêker û hevokan radiabin. M.E.Xanî "Nûbuhara Biçûkan" ne tenha di van qonaxan re derbas dike, lêbelê wê bi gotinên ferhengî jî têr dike, û ji bîr nake ku

perda fedîbûna civakî ji fêrgehê û ji nav şagirên wê rake, û di warê binavkirina organên laşê mirovan de vê perdê biqetîne. Wilo, organên nêr û mê di laş de, bi regekî perwerdeyî, bi şagirên "Hicrika kurdî" dide nazîn, û xweşiya hevghandina mêr û jinê ji wan re diyar dike. M.E.Xanî, bilî van waneyan, felsefa heyînê jî nêzî hiş û ramanên şagirên "Hicrika kurdî" dike, û bi fermendarî, dûrî dūdiliyê, regezên jiyane bi wan dide zanîn û şeweyên candariyê ji wan re diyar dike, gava dibêje:

*Bizan çar in 'enasir, ax û av ba û agir hem*

*Mewalîd in eve hersê, nebat û me'den û heywan.* R.28

Halo, M.E.Xanî gav bi gav û qonax bi qonax bi şagirên "Hicrika kurdî" re dimeşe, tanî wan dighîne warê fêrkirina avakirina hevokan. Di vî warî de jî dibêje:

*Li nezheb we nel'eb we ne'ikul me'en*

*Biçin da bileyzin, bi vêkra bixun.* R.36

Wilo, M.E.Xanî bernamêya vê hicrikê bi dawî dighîne, û paşgotina xwe bi 3 cot malikên saf bi zimanê erebî datîne. Cotê dawî ji wan:

*Usellî e'la şafi'î Ehmeda*

*Fela tense ya şafi'î Ehmeda.* R.37

Û tarîxa danîna "Nûbuhara Biçûkan" bi têderxistinok dinivîse, ku dibe 4 ê cemada paşî sala 1094ê koçî.

Gelo, mebesta me ji vê raxistina rêzimanî çî ye?. Lê, berî em bersivê bidin, emê berê xwe bibin serî. Belê, me bi vê helebezê hin ji naveroka "Nûbuhara Biçûkan" berçav kir û li ber xwendevan, rexnegêr û lêkolînavan raxist. Lê, em dîse bivê-nevê pendiyekê ji yên M.E.Xanî dibin, da xwe bi armanca xwe bigihînin û bi behweriyeke bê dudilî bêjin, ku "Nûbuhara Biçûkan", weku bernamêya

"Hicrika kurdî", bi xama Xanî hatiye danîn. Xanî pendiya pêşî (waneya destpêkê ji fêrkeran re) di "Nûbuhara Biçûkan" de bi vî rengî dibêje:

*Heta tu dewr û dersan nekî tekrar û mesrûf*

*Di dunyayê tû nabî ne meşhûr û ne me'rûf.* R.4

Mixabin, ku fêrkerên vê fêrgehê, bi demê re, tenha beşê pêşî ji malika pêşî (heta tu dewr û dersan nekî tekrar) pêk anîn, û avakirina "Hicrika olî" bi vê pêkanîna seqet ve hate girêdan. Loma, fêrkerên vê hicrikê serê şagirên xwe bi rotikên xêzeranî dax didan, da yan wan hişkor bikin, bê ku zanibin sûd ji vê xwendinê çî ye, da li fêrkirin û perwerdekirina zarokan guhdar bin. Lê, bernamêya Xanî ji "Hicrika kurdî" re ew bû, ku dewr û ders ne tenha bêne vegerandin û jiberkirin, lê wilo jî bêne veguhestin (mesrûfkirin), da şagir, berî hertiştî, rêz û bendên zimên bi dest bixe û veguhestinê li ba Xanî ne tenha naskirina rêz û bendên rêzimanê erebî ne, lê wilo jî ji bo nasîna yên rêzimanê kurdî ne... û ev e mebesta me ji raxistina naveroka "Nûbuhara Biçûkan" bi vî rengî. Hinga fêrker desthilat e, ku dergehê zanîne li ber şagirên xwe veke û wan bi hişkî zelal derbasî nava gulzarê zanistiyê bike.

Têbîniyek:

Dimîne, em têbîniyeke dawî bêjin. Ew jî ew e, ku nasîna bend û rêzên vekirina dergehê her karekî, her pişekî fêrbûn e, û mifta her fêrbûnê jî elfeba ye. Elfebaya xwendin û nivîsandinê jî nasîn, bilêvkirin û pêkanîna durust e ji tîpan re. Lê, gelo çima M.E.Xanî "Nûbuhara Biçûkan" bê mifte pêşkeşî "Hicrika kurdî" kiriye?. Ango, ne tenha elfeba ji "biçûkêt Kurmancan" re, bi regekî cuda ne nivîsiye, lê wilo jî di

\*Ji bo ku helbest ji gurd nekeve 'Arî û' bûye 'Ar yû'.

“Nûbuhara Biçûkan“ de ne daniye. Û bernameya fêrgeheke seretayî bê nasîna tîpan nabe. Dêmek, rast e M.E.Xanî “ferhengokek“ ji şagirên hicrikê re daniye!!.

Eger, em bi hûrbînî li ser vê pirsê jî rawestin, emê bibînîn, ku rêz û bendên fêrkirina elfebayê, di vê fêrgehê de (di warê pratîk de), xwe dispartin akamên “Nûbuhara Biçûkan“ û li gorî pêl û kêşa pêlewazên wê pêk dihatin... û hîna pêk tên. Belê, her 13e pêlewazên “Nûbuhara Biçûkan“ vê behweriyê bi cih tînin, lê emê tenha li ser nimûnekê rawestin, ku dibêje:

*E' rec lengî ye, hem e'wec xwehrî ye  
I'nayet we nesret çi ne, arî ye. R.34*

Hicrik jî, tanî îro roj, şagirên xwe li gorî vê pêlewazê fêrî bilêvkin û veguhestina tîpên elfebayê dike, gava fêrker li pêşya şagiran dibêje:

*Elif fethi en, kesri in, demmi un  
Bê fethi ben, kesri bin, demmi bun\**

Bi vî rengî em dikarin bêjin (weku di civaka kurdî de tê gotin), ku “kesê tilha xwe bixe guhê xwe, zane wê çi stranê bêje“. Lê mixabin, ku qedere nehişt Xanî stirana xwe bêje, nehişt ku çirûskên umîda M.E.Xanî, di pêserojan de, bibin ronî û behrîne bi geşî di nav civaka gelê wî de bela bikin.

### Çend pirs:

Halo, me keleka xwe (li gorî zanebûna xwe) gihande kenêr û gotara xwe bi dawî anî. Lê, em xwe, bi vê dawixistinê re, gerekî berçavkirina çend pirsên rastûrê dibînin, belkî hişin ji yê me vekirîtir karibin wan, di meydana giftûgoyê de, ji me re ronîtir bikin, û karibin van bedgomaniyên nedesthilatiya civaka mêran (civaka kurd, ya kevnar) di warê guhdan û perwerdekirina zarokê de, di riya

berhemên kevnenivîskarên Kurd re, rakin. Pirsên me jî bi “Nûbuhara Biçûkan“ û naveroka wê girêdayî ne:

1.M.E.Xanî 13 cot malik di bin siha şîret û pendiyarî re derbasî “Hicrika kurdî“ dike. Têgihîştina van malikan serdestî hişê zarokê ye. Dimîne, ku M.E.Xanî pendiyên xwe ji fêrkerên vê fêrgehê re nivîsandibin, da ew di riya xwe re ji şagiran re şirove bikin, wan têbigihînin û li gor wateya van pendî û dîtinan şagirên hicrikê perwerde bikin. Gelo, M.E.Xanî asoyên hiş û têgihîştinên zarokan ne dizanîn, tanî xwe bisipêre fêrkerên nenas û nedîtî?!

2.M.E.Xanî fêrkirin û perwerdekirina “biçûkê Kurmancan“, di riya hicrikê re, barê xwe didît. Lê, gelo çima behweriyên xwe bi zelalî ne dane pêş û rastûrê ne dane zarokê?.

3.M.E.Xanî doza “tekrar û mesrûf“ kirina dewr û dersan li şagirên hicrika xwe dike, bê ku serçivkên veguhestinê rêzimanî bi wan bide nasîn û pergalên van veguhestinan ji wan re şirove bike. Çima M.E.Xanî dergehên şirovekirin û pergalên veguhestinan di “Nûbuhara Biçûkan“ de ne vekirin, û wî bi xwe şagirên fêrgeha xwe tê re derbas ne kirin?.

4.Di gelek waran de pêwîstiya pêkanîna sînonîmên (hevuate, muradif) erebî hemberî gotinên (bêje) kurdî nîne. Weku nimûne:

*Qeswere'w deyxem û dilhasî şêr*

*Haris û leys û esed ew jî wusan. R.26*

Çima M.E.Xanî zarokê dixê bin vî barê gotinên (li vir navên) ne gerek de?

5.Sedemên xwesipartina M.E.Xanî ji fêrkerên fêrgeha ku wî dixwest ava bike, di “Nûbuhara Biçûkan“ de, nayên diyarkirin. Gelo, çi hiştiye ku dilê Xanî li fêrkerên vê fêrgehê rûne?. Û çi garantî li ba Xanî hebû, ku “Nûbuhara Biçûkan“ weku wî dixwest, wê bibe

mišta fêrkirin û perwerdekirina  
"biçûkêt Kurmancan"?

6. Gelek çaran, di warê psikolojiya  
zarokê de, alavên dijraber roleke  
pozîtîv di bijartinê de dileyizin. Wîlo,  
talî, şêranî bi zarokê xweş dîke.  
Spehîtayî, kirêtiyê di çav zarokê de reş  
dîke. Sivikatî hemberî giraniyê bi  
zarokê asan dibe, û...

Gelo, heye ku mebesta M.E.Xanî ji  
pêkanîna hin gotinên (bêje) biyanî yên  
zivir û ziwa pêşêrînkirina ziman û  
zaravê kurdî be li ba zarokê (li ba  
şagîrê "fêrgeha Xanî")?

Di dawî de, em bi hêvî ne, ku  
lêkolînan, rexnegêr û zanayên me wê  
karibin wan dîtinên kevn ku "Nûbuhara  
Biçûkan" bi wan hatî pêçan, wê karibin  
wî qaçilkê ku li dora "Nûbuhara  
Biçûkan" hatî avakirin bişikînin û wê  
karibin behweriyên me bi jêmayên wan  
pirtir bibin.

### Çavkehnîyên lêkolînê

1. Nûbihar M.E.Xanî - lêveger û  
rastkirina Mele Ebdilselam Nacî  
Cezîrî. Şam
2. Nûbuhara Biçûkan M.E.Xanî -  
vejartin û pêşkêşkirina Hemdî  
Evdilmecîd Selefî. Çapxana El -  
Reşîda. Bagdad.
3. Rêzîmanê zîmanê kurdî bo kursê  
II. Berhevkirina Zagrosê Haco -  
destnivîs.
4. Kovara "Stêr" 19/1991 R.42 - 47  
- ARO.
5. Rêbera rêzîmanî: E.R.Ekrawî ç.I  
1980.
6. Ferhenga kurdî nûjen. A.S.A.  
Gewranî - Urdu - Emman 1985
7. Ronîkirina astengên rêzîmanê  
erebî - Nîgara Namî û Nîsrîna Osê -  
Konsultant.
8. Konsultantê bilêvkirina durust, li  
gor xwendina hicrike, Samiyê Nam

Helbest

# Kulîlka evînê

Diya peyman

Wek tîreke bê armanc

Hatim rasta çavê te

Ber bi jêr de

çûm û çûm

Ez ketim dilê te

Li devereke pîrr germ

nema xuyabûm

Bûm sûlav

Hatim, cergê te ez vexwarim

peşk bi peşk

Ta ku ez windabûm

Min qurm vedan

Di laşê te de

Min şax sipartin hev

Wek tevîka pîrê

Di rehên xwînê de belavbûm

Wê gavê kulîlka evîna min

Bi navê te bişkivî.

18 05 94

# Hunermendê kurd

Pêşengeh

1975 - li navenda kultûrî li Latakyayê/Sûrî

1977 - li navenda kultûrî li Palmêrayê/Sûrî

1982 - li navenda kultûrî li Hisiçayê/Sûrî

1982 - li muzexaneyê Helebê/Sûrî

1991 - li galeriya Joschen Heleb/Sûrî

1992 - li navenda kultûrî ya Espanyayê/Sûrî

1996 - li Herford/ Elmanya (hevbeş)



## Xelîl EBDULQADIR



Xewn meydana kêfxweşiya min e; bi alîkariya wê xewnê mirovatiya xwe belav dikim. Xewn şivanek vekiriye; bi alîkariya wê hestên xwe werdigirim da ku hemî tiştên ku di hişê min de genîbûne, biteqînim. Ti carî rol ji bo mirovê hunermend, da ku dîmenê rawestîne, nehatine nîgarkirin. Lê her û her xewn derbasî vê cîhana mişt sosret û wêran û êş, kiriye; lewra bi qaçaxiya xewnê hatiya sûc-darkirin. Yê ku belg û ferhengên zorbazan



çirandine, hergav hunermend e. Lewra tablo bi xwe di hinavên hunermend de hişyarî û raperîna zemînê ye, tablo wî dehf dide da ku xwe berde kûrahiya hinavên xwe, û da ku ew tablo bi xwe jî tenhatiya wî bimije.

**Ji ber ku min bi xwe peyivîn winda kiriye; lewra jin pitepit û** xirecira min e. Rengekî gulgulî û bo keskekî bejî gumeguma hetavê ye. Lerza zemîna bêav û babelîska ji pirsê ye. Rûyê wê tarawgeh e û piyê wê çeqlekî yasemînê ye. ku çavên min dest bi hêsrana dikin bêriya wê dikim, û bajar jî termekî bédeng e; ez dê çawan li çavên germ ên di çeşnê germahiya hetavê û xweştama nên de, bigerim?

**Ez bi xwe li zimanekî windayî ku şîniyên kesên di tabloyên min** de berhev bike, negeriyame, Dudilî û lertz û bêzarî ye. Xwekuştin



jî wek bejna wêranê ye; wêrana ku hev-rêtiya me dike. Ez dê çawan bikaribim, bê poşmanî, şîniyekê bi mezinahiya zixtan pêşkêş bikim?

**Da ku vî warî ji** lawaziyê rizgar bikim, çirayên zaroktî û bêrêkirinê vêdixînim. Bi avê nîgar dikim da ku xwîn û xweşî biherikin, bi avê stiranana dikim werzên qolinca zayînê. Rûyê yara xwe nîgar dikim..., çûka ji rengên zuhayiyê, wexta ku berbi min ve tê, bi bîna ewran dagirtiye.

*X.Ebdukkadir*

# Ev êvar pir xweş e

## Meha Bekir

Bi hatina xwe, tu xoxê surdar dikî  
Tu dil bi ser dil de dizingînî  
Tu bi çavên xwe, heyva ku te soza  
wê dabû min, hildigirî  
û tu derewan dikî  
Tu zemînê wek şahidekî hildigirî  
ku çendîn tu li jêr lingên min dinalî  
û giyanê min ji te re dibêje:  
Yê ku bêtirîn ji te hez dikir...  
bêtirîn.

Ev êvar pir xweş e..  
De bila destên te dilbijandinên ji  
şekir û pûngê  
û ji şîr û pitepita guharan, qezenc  
bikin.  
Ew jî bi qiriktalî, ji te re, li ser mirin  
û çilmisîna ronahiya morîkan,  
dipeyivî  
û da ku tu dengê xwe hetanî dawiya  
wî derbikî  
û tu xemgîniya welatekî biherifînî;  
welatekî ku çendîn li ser min  
giriya  
û lingên min jî çendîn li te digerin û  
tiliyên xwe dibarînin.  
Ev dem pir xweş e

Da ku dilê xwe hetanî dawî ji te re  
vekim  
û wêran kuta bibin û destên xwe  
wisa berdayî bihêlim  
Bê tirs  
çinkî dê te hilbijêrin  
Dê ber bi te de bîn  
Dê bî gulgenimên dilovan  
nixumandî bin  
û bi xezalên ku hê derbasî dibistanê  
nebûne  
û bi kevirên ku ne di çeşnê keviran  
de ne  
Ev êvar êvareke pir xweş e  
Da ku tu bêrîkirina qelaçan bibînî;  
ku çawan çavliwêman te dikin,  
ku  
çawan dibezin bêyî ku bizanibin ber  
bi kuderê ve  
Da ku tu tenhatiyê vemirînî..  
Da ku tu bi kêfa xwe çinîne bikî  
Hemî bixûran ji te re vêdixim, û xwe  
davêjim ber dilê te,  
rengê bi pey min bikevin: Avgîra  
kevnare,  
çirên di temen de derengmayî,  
berx,  
çêçik,  
û keleh jî  
dilsojiya xwe ya li hember dayika  
min ji bîr dike;  
bi pey min dikeve bêyî ku wê  
agahdar bike  
Kevok bi pey min dikeve  
Guh nade birînen giyanê xwe  
û tiliyên kelemî  
Aho bi pey min dikevin, guh nadin  
zengilan...  
Renge hînî çolistanên te bibin û ji  
wan venegerin  
Stêrk bi pey min dikevin; da tu  
nameyên wan li wan vegeirîn,

û pişt re  
tu ji ber pencereya min winda dibî  
Tiliyên te esmanekî dîtir ji bo min  
dihûnin,

û bazinê kê xweşiktir

**Demek e pir xweş e**

Da ku tu destê xwe têxî destê min û  
tiliyên me pirtir bibin

Da li te mikur bêm: zemîn bûm, pir  
winada bûm, lê mabûm zemîna te

**Demek e pir xweş e**

Ku tu giriyê zemînê bibihîzî; zemîna  
ku li ser te digirî,

zemîna ku berzûrî te dibe

Tu jî ligel rengan û text û bixçeya ji  
genimê ciwan, lê vedigerî

Tu bangî wê dikî

Li hemberî te radiweste û hetava  
melûlî ji rûyê xwe paqij dikî,

hetava ku

bi payedariya dilê wê re nagunce  
wexta ku ji tevan re dibêje: ji we hez  
dikim...

**Ev dem demek e pir xweş e**

Da ku tu werzan rapêçî,

Da ku tu tiriye Mûşê ji tayê rizgar  
bikî

**Ev dem demek e pir xweş e**

De wer, û çavên min rondikan bi ser  
hemî pizotan de dibarînin û êşa  
xewnên narîn dibînin, di navbera du  
jenan de ji bayê ku ji te tê, nimêj  
dikin

**Ev dem demek e pir xweş e**

De bila destên min bigerin, de bila  
giyan li wê tabloya ku di çarçewê  
de dihêwire, çarçewa ku ji tirsra  
dîwêr hêstra te nabêje, vegerîne

**Demek pir xweş e... pir xweş e**

de wer û ji Qeresyê re bibêj:

Tu ya min î!

Tu ya min î!



# Mêrava pîroz

Reşîd Bettê

Li rojhilatê te Cûdiyê sernixwîn e  
û li roavayê te dixwiyê keleha Mêrdîn  
Başûrê te xemilandiye bi sinsila kevnar  
e  
û di pey re rasteçol e heta bi Şingala  
êzîdiyan  
Bakurê te pêçayîye bi kevanê çemê  
Dicle  
Tu yî navika Tora ji kevir û kils  
pêkhatî  
Li kêleka te dimîne dêra filehan  
Dêremera bi şêhr û şahî  
Ka êzîdî û ka batizmî, li kû man zêw û  
şahî?  
Pêşî filehtî hat, paşî misilmanî  
lê zerdeştî bûn pêşî tev bi temamî  
wêran nebû avahî, nerabû mirovanî.  
Hezar sal in ku li cem hev in  
Mizgeft, kilise û nawîsên rûhanî  
Îro wêran û kavi e ji ber şerê çekdarî  
Mêrava pîroz û Tora kevnare!  
Ka êzîdiyên te yên bi wesfê mêranî



Li ku ne filehê te yê di dest de senet û  
hostayî  
Îro sernixwîn e Mêrava pîroz  
Wêran û bêxwediye Tora kevnare  
Kils bûye kevir û xwîn bûye av  
Xewa serê banan bûye kabûs  
Dijmin bûye agir û pêt, pê de diçe  
Kurd ardûyê êtûna dijmin û tor kurha  
bêbinî  
Nema dixwiyin bizinên belek,  
Tiriyê merzone êdî bê tam e  
Nayê dengê kewê gozel.  
Xemgîn e, sernixwîn e Mêrava pîroz,  
Tora kevnare.

# Zimanê me

## Sebrî Botanî

Hawar bi navê yezdan

Wey, li rewşa me kurdan

Derdê me pirralî ye

Karê me tirralî ye

Werin em hev bibînin

Zimanê xwe bixwînin

Zimanê bav û kalan

Rûmeta hemû malan

Kevnar û xurt û pak e

Kurmancî kak û mak e

Gencîneya peyvan e



Celadet dergevan e

Werin da em xwe fêrkin

Zimanê xwe jî têrkin

Kurdê kurdî nezanê

Ew zû diçe nemanê



Ya ku ji bo me qenc e

Nivîsa kurdî merc e

Xweş û nerm û şêrîn e

Zimanê Mem û Zîn e

Hemî roj û şevên xwe

Pê şêrîn kin devê xwe

# Salvegera 20an a koçkirina

## Seydayê Mele Ehmedê Namî



Çendîn weşana naveroka vê bûyerê dereng be jî, lê dîsa, şeva ku di 12/ 11/ 1995 an de li bajarê Qamişloyê ji alî kovarar û nivîskarên kurd ve ji bo jiyandina salvegera bîstan a koçkirina Seydayê Mele Ehmedê Namî hatibû li darxistin, wek bûyereke rewşenbîrî, nirx û ango û giranbuhayiyên xwe, bi vê derengxistinê, winda nake.

Me dixwest bi vê kurtegotinê çend têbîniyên pêwîst, ragihînin:

- Kovarên beşdar ên ku, di şeva Namî de, gotarên xwe bi zimanê erebî xwendibûn, ji weşanê, mixabin, bêpar mane.
- Gotar û nivîsên ku li vir hatine weşandin "ji bilî helbestan" hin gubertinên vekîti di wan de çê bûne.
- Nivîsên ku ji alî rêziman û rastnivîsê de nedihatînin nejinandin, dîsa, me ew pêdiviyê weşanê nedîtî.

DUGIR

## Gotina malbata seydayê Mele Ehmedê Namî



Samî Namî

Êvara we bi xêr!

Şeveke weke vê şevê ji min re bûbû xewnek û mabû keserek di jiyana min de. Loma, min pir dixwest û hêvî dikir, ku şeveke halo bibe rastiyeke, û ez bi çavên xwe bibînim. Min, weke ku dixwest bîranîna pêncsaliya koçkirina bavê xwe pêk bînim, lê nehate milê min û dost û hevalan. Hêviyên min mane bi bîranîna dehsaliyê ve, lê ew jî weke pêncsaliyê bi sarî derbas bû. Ez mame li benda pazdesaliyê ve, lê wê jî bi bê his û dengî keserên min pirtir û hêviyên min melûltir kirin. Wilo, bîstsaliya koçkirinê hat. Ez bi tirs bûm, ku ew jî weke yên berê, sar derbas bibe, êdî ew keser ji dilê min dernekeve û ew xewna min nebe rastiyeke. Lê, saya Xwedê û serê xortên hêja va ye, em bîranîna bîstsaliya M.E. Namî di vê şevê de pêk tînin. Bi vê bîranînê jî Namî, di demê de, zindî dibe. Zindîkirina wî jî di riya çalakiyên rewşenbîrên Kurd re, yên ku Namî yek ji wan bû, rû dide.

Erê, berî M.E.Namî ristevan be, ew nûnerê rewşenbîriya kurd bû, nivîskarê kovarên Ronahî û Hawar bû. Lewra, ez xwe şad û bextiyar dibînim, ku rewşenbîrên Kurd, xwedanên kovarên

kurdî û nivîskarên wan barê vê bîranînê hilgirtin û ev şev li dar xistin. Ez bi navê xwe, bi navê malbata M.E.Namî spasiya beşdar û amadevanên vê şevê dikim. Hêvîdar im hûn bi xweşî û şadî, ne tenha vê şevê, bi hev re bidomînin, lê nûnerên rastiyeke bin ji rewşenbîriya kurdî re. Cihê behwerî û serbilindiyê bin, ne tenha di kar û barên xwe de, lê wilo jî di têkilî û danûstandinên xwe de... Û dîsa sipas.

## Kurtejiyana M.E Namî



Nîgar Namî

Bi reşkirina hin rûpelên bêzar, em ne desthilatê ronîkirin û berçavkirina pileya rewşenbîriya Namî ne. Lê em xwe, bivê nevé, derbarî danasîna kurtejiyana wî dibînin.

Hozanê Kurd, Cegerxwînê nemir, di dîwana Pîrîsk û Pêtî de pesnê Namî di helbesteke xwe de bi vî rengî dide:

*Namî, me ji nameya te zanî*

*Seyda yî ji bo melayê Xanî*

Belê, Namî navnîşanê torevaniyê bû, ku mele Ehmedê kurê Mehmûdê kurê Evdulla li xwe kiribû û nivîsandinên xwe bi vî navî dixemilandin. Di jiyane de jî bi navê mele Ehmedê Namî dihat naskirin.

Mele Ehmedê Namî di sala 1906 an de li gundê Erbetê, qeza Nisêbinê çavên xwe li cîhanê bel kiribûn, û ji sînga diya xwe Xedra Firşik bûbû. Namî destnivîsek bi navê Çiko li bir im li şûn

xwe hiştiye. Gelek bîranînên xwe di vê destnivîsê de diraxe. Wilo jî li ser kurtejiyana xwe radiweste. Tê de dibêje:

*Di sala 1906 de, heyva gulânê li gundê Erbetê hatim dinyayê. Pênc pêhisiyên min li wî gundî agadar bûne. Ango, bi bîna gul û sosinan, bi dengê şalûl û bilbilan, bi dîtina roja jîndaran, bi hingivtina (destdana) berê dayikeke Kurd û li tamkirina şîrê bustanê wê dayikê tamdar bûne.*

*Paşê, ez bi dergûşeke darî ji darên çiyayên Kurdistanê li ser erd û di bin azmanê wê de, bi destekî kurdî, hatime hejandin... di himbêza dê û bavê dilovan de, bi delalî, hatime xwedîkirin...*

*Ez pêncsalî bûm bavê min havîna sala Berfa giran (Berfa sor) li bajarê Mêrdînê çû rehma Xwedê û li wê hate veşartin. Dema bûme heftsalî diya minî dilovan bi dilşadî û xweşî bi destê min girt û ez birim xwendinê...spartim seydayê gund... Lê, sed mixabin, piştî destpêka xwendinê, pir li min nebûrî diya min jî dest ji min kişand, çû rehetê, ser da xewa şêrîn, xewa yekcarî, bê hişyarî.*

*Piştî mirina diya min, metika min ez û mala min ji gundê me yê kevin Erbetê rakirim û birim gundê Girhesin, yê ku mala wê lê bû. Piştî ku min dê û bavê xwe, yên dilovan bi yekcar wînda kirin û ji nav heval û hogirên xwe derketim û çûme gundê biyanî nenas, ji metika xwe pêve min kesek nas nedikir. Hertim bi kul û derd bûm, diljar û perîşan bûm. Şev û rojên min, pirê wan, bê xew û xwarin derbas dibûn. Min baş dizanî, ku metika min hê ji dê û bavê min ji min re dilovantir e, zîziya dilê min agadar bû.*

*Metika min hê ji diya min bêhtir qedrê ilm û xwendinê dizanî... ji min re tim digot: 'Kurê min, dive tu bixwînî. Her*

*xwendin e ku insanan serfiraz dike. Xwendinê gelek jar kirine serdar, xwendin bi dest herkesî nakeve'.*

Bi vî dengî, Namî cih û warên xwe di bin barê jiyana zor û sitem de, bi metika xwe re, diguhertin. Wilo, ji Girhesin xwe guhestin gundê Letîfiyê. Ji wir xwe li gundê Kertiwênê girtin. Piştî xêzvezbûna şerê cihanî yê yekemîn berê xwe dan gundê Darê, serkaniya xwendinê. Li wir Namî li xwendinê vegera. Piştî Quran xitim kir li Kertiwênê vegera, lê metika wî nehişt payiza wê salê bê xwendin di ser re derbas bibe, gava ew şiyande Darê û ji nû ve bû feq. Namî dibêje:

*Min dest bi xwendina kitêba seydayê Xanî Nûbihara Biçûkan kir. Piştî ku min kitêba Seydayê Xanî Nûbihara Biçûkan timam kir, min dest bi xwendina kitêbên şerîetê kir.*

Namî sala 1920 an di gel seydayê xwe mele Brahîm û çend feqehên hevaldersê xwe, ji Darê çûne bajarê Mêrdînê. Çûna wan ne ji bo xwendinê bû, lê heryekî destek çek ji xwe re çêkirin û li seydayê xwe mele Ubêdulla vegeran. Destûra xwe jê xwestin, ku herin nav Aşitan dibistanekê vekin. Wilo, Namî û çend hevaldersên xwe, bi serkêşiya seydayê xwe mele Brahîm berê xwe dane Girê Siwêr. Li wir cih girtin û xwendina xwe kirin. Piştî pênc salan Namî vedigere Tilminarê. Ji wir dadikeve Amûdê. Çend roj derbas dibin, dîse hildikişe gundê Kercosê. Ji wir diçe Êstilê. Li Êstilê mirina bavê seydayê xwe mele Brahîm dibihîze, tê serxweşiya wî, lê seyda nema dil dihêle ku bi şûn de vegere. Piştî du salan ew û çend hevaldersên wî bi seydayê xwe re diçin gundê Tilşêrê û dibistanekê li wir vedikin. M. E. Namî li gundê Tilşêrê cih digire, dest bi jiyana xwe ya civakî, torevanî û kurdewariyê dike. Rola



rewşenbîrî bi kovarên Ronahî û Hawar  
re girê dide.

Dibe yek ji dostên nêzik ji rewşenbîrên  
dema xwe re û di nav wan de mîrê  
rewşenbîriya kurdî di sedsala bîstan de  
Mîr Celadet Bedirxan. Wîlo jî dikeve  
nav kom û komelên Kurdewariyê. Piştî  
demeke dirêj, xwe ji gundê Tilşêrê,  
diguhêze bajarê Qamişlo.

Dawîjiyana xwe, bi malîtî, li wir  
berdewam dike. Di 11. 12. 1975 an de,  
piştî nexweşîke dûdirêj diçe ser  
dilovaniya Xwedê.

Xwedê wî bi dilovaniya xwe şa bike...  
û spas bo guhdariyê.

## Bîranîna Namî



Seydayê Tîrêj

Sivik rabe dilê xemgîn silavê min bi  
dûr mek

Ji Qamişlo tu rê bigire here Taxa Qidûr  
Beg

Li ber kêla serê Namî tu rûnê ey dilê jar  
Bi wî dengê xwe yî zîz tu bikî qîrîn û  
hawar

Bi qasî berk û darên Cûdî û Şingal û  
Torê

Silavê min tu lê ke ku bila rabe ji gorê  
Dizanim ew bi hesretiya welat çû ji  
neçarî

Eva bîst sal buhirtin ew di gora teng û  
tarî

Ji xwer carek binêre li çar hawêrê  
gerdûn

Qiriktalî demên reş ku çîqa dîtin hemî  
çûn

Eva roja me ya rohnî ji hêla reş bi  
derket

Şiyar bûye ji tamara xewê bê çarê  
milet

Divê em ranezên îro bikin kar û xebatê  
Veger cy Ehmedê Namî ji riya çûn û  
nehatê

Dem û dewra te ye Seyda tu bigrî xam  
û defter

Bidî ber şîr û helbestan li meydanê her  
û wer

Bi wan şîrên xwe yî taze li ser pozê  
neyara

Wekî bilbil bikî qîrîn li ser lat û zinara

Keç û xortan tu serxweş kî bi marşên  
xweyî di cengîn

Berî bidine neyaran ew digel wê ala  
rengîn

Berî nedine hevûdû ew bi ceng û kuştin  
û şer

Çiko dersa neyar e ew ne dost e hem ne  
rêber

Şerê xwe bi xwe ji me re dike zîyanê  
qet ne kar e

Ku ev xwîn tê rijandin tev ji bin destê  
neyar e

Çi bêjim ez gelek heyfa mi tê li xwîna  
ciwana

Hezar ax û keser Seyda ji destê van  
nezana

Li ber çoganê tazî û eyran û tirk û laz  
in

Di meydana şeg û holan wekî gogê  
dibazin

Divê em haj xwe kin îdî gelek şerm e  
mexabin

Divê ku em nebin alet di destê pîs û  
dijmin

Riya rast û dirust û qenc bira her kes  
dibînî

Riya xwar û xerab û şaş me ji hevdu  
dûrdixînî

Eger em guh nedin dijmin bi rastî em  
bibin yek

Bi sîh û pênc melyonê kurd emê gogê  
bibin şeg

ji hev re em nebin sersot di dev maşka  
 neyara  
 Bi koça miletê xweyî kurd emê  
 bigihêjine wara  
 Zeman dostê me ye îro ku em çî bikin  
 dikarin  
 Di bin destê neyaran de çima em dîl û  
 jar in  
 Emê gazina ji kê kin tim ji dostê me tê  
 serê me  
 Emê çawa xwe azad kin ku dijmin  
 rêberê me  
 Gelê bindest li dinyayê bi dilzozî xwe  
 parast  
 Ji kurda ez bi hêvî me ji rêça xwar berf  
 bidine riya rast  
 Ku daxwaza me pêk bê em nemînin  
 bend û kola  
 Ji karwanê dem û wextê nemînin em li  
 çola  
 Li dinyayê bibin em jî xwedanê tac û  
 şewket  
 Dema ku em herin gorê nemînin dil bi  
 hesret  
 Di esmanê welatê me stêrka me xuya  
 be  
 Bela ala me jî îro di nêv ala dera be  
 Çiqa bêjim xelas nabin kul û derd û  
 xemên dil  
 Bi zincîrê me ew barê giran berdaye  
 ser mil  
 Tu car milet ji bîr meke xebata bavê  
 Samî  
 Hezar rehmet ji dev Tîrêj li ser gora te  
 Namî

## Helbest



**Dildarê Mîdî**

Seyda li te mizgînî ku em dara berû ne  
 Bahoz li me dide û ji cih em neleqandin

Qurmê me ji rengê sekehan çûye di  
 xakê  
 Lewra evî bayî ji me yek nehejandin  
 Çendî bi barê berf û bahoz kom be li  
 ser me  
 Yek çiqî û katik ji me qet nayê  
 şikandin  
 Hingê kelem pir bûn lê îro em teht û lat  
 in  
 Çerxa felekê va li ber me hate tewandin  
 Pir şa be Seyda êdî tu carek mebî  
 xemgîn  
 Kula di dil de vaye bi topa tê peqandin  
 Ew jan û evîn derbû birîna ku di navê  
 bi bîna barûdê bi carek hate kewandin  
 Vaye li alîkî ji welêt em bûne komar  
 Navê me di neqşa cîhanê tê neqîşandin  
 Him li aliyê dîtir binêre li deşt û zozan  
 Bejna çiyê çawa bi xwînê tê xemilandin  
 Tehtan diguvêşin îro deştan diverêşin  
 Hembêzdikin wan bi hêsanî têne  
 mijandin  
 Lo Seyda tu meyza bikî li rewşa cîhanê  
 Doza me îro bi çî rengî tete bijartin  
 Hindik maye ez xweş bawerim  
 peyman a Lozan  
 Ji ser masê rabe bi destan bête çirandin  
 Ev ne hidik e qet li ba min çawa dibînî  
 Kelha sîtemê hino hino tê herifandin  
 Xweş xweş tu binêrî bi hûrî li nava  
 dijmin  
 Şerm û fehêtê wî bi carek tê  
 hilweşandin  
 Êrîşê dibê bi firokan ser komê leşker  
 Her kes dibînê kito kito tê şewitandin  
 Ma qey ev çî ye ne hêza şoreşgerê kurd  
 e  
 Dûvê bahozê kirin qîç û ew vegerandin  
 Ez hêjî dikarim bibêjim bubhure Seyda  
 Xama min zuha bû li vir ew hate  
 sekinandin

## Mele Ehmedê Namî û şevbiwêrkên Qudûrbegê



### KEÇA KURD

Di pey qonaxa Xoybûnê re, piştî çira canpakiya Celadet Bedirxan di bîra qederê de vemirî, qonaxeke nû dest pê kir. Di rewşeke nû de, nemaze di pey sala 1957an re, pişkojên têkoşerî û xebatgêriyê li ser sînga xebatgeran dipişkivîn û di kuncikên tarîşevan de bi destên hişyariyê çira pêketin.

Di nav tevgera wê serdemê de du nifşan karê welatperwerî dikirin:

1- Nifşek ji xortên xwendevan û rewşenbîrên dilêr, ku xwîna wan li nav mista wan bû... û bi serfirazî bûnc pêşengên tevgera kurdaiyê û barê mezîni kar hilgirtin û çira xwenasîn û hişyarkirinê bi duhnê bîr û baweriyên kurdperweriyê di mala her kurdekî de pêxistin...

2- Nifşê diduyan: Bavên xortan, ew kes bûn, ku zaroyên xwe ji pêsîra xakperwerî û xebatgêriyê têrşîr kiribûn û kurdîti di xwîna wan de çandibûn û hê jî diçandin. Vê civata han ji rûbarê Xoybûn û ji kehnîya Celadet vexwaribû û bi wê avê dara bîr û baweriyên xwe di zeviyeke nû de av dida. Melbenda serekî ya vê tevgerê bajarê Qamişloke bû, di asmanê wê de li nav bahoza sitemkariyê, keskesora xebatgêriyê ji herdu rexên Ceqceqê ve kevan girtibû û dibin vî kevanî de, nemaze li Tara Qudûrbegê zengilê dilovanî û hişyariyê di guhê her maleke xewaro de, lê dida. Û di hundurê vê xebatgehê de destek

melayên mizgefta welatnasî û xebatgêriyê bi can û bi şevbiwêrkin taybetî ji bo, vekolîn, xwenasîn, helbest û dîroka Kurdistan, li dar dixistin. Ji vê civatê ev kesên han tene bîra min:

Seydayê hêja Mele Ehmedê Namî, Mele Tahir, Mele Ehmedê Şûzî, Mele Hesenê Hişyar, Mele Ehmedê Tûj, xalê min Mele Silêman û destek ne mela jî, ji wan: Evdê Têlo, Ezîzê Zazî, Eliyê Zazî û bavê min Emerê Evdile.

Li gel ku ez biçûk bûm jî, lê dostaniya min bi çendekan ji wan re hebû, wek: Mele Ehmedê Namî, Mele Ehmedê Şûzî, û Evdê Têlo... Seydayê Namî yek ji endamên wan şevbiwêrkan bû. Li gora ku min ew nas kiribû, ew mirovekî hest tenik zimanxweş bû, gotûbêjên wî ji ewrên hezêkirinê dibarîn û li ser gula hevaltîyê xunav digirtin. Bi herkesî re, bi biçûk û mezinan re ji bergeşa xebatgêriyê dixwar. Hevalekî dilovan û gelekî li bavê min nêzîk bû. Ji bo bavê min ew dihate mala me û bi min û Berzo re jî civat digirt û bi zarê xwe yî şêrîn tevna rewşenbîrî û kurdaiyê çêdikir. Guh dida wan helbestên Berzo, yê lawaz û seretayî û gava carekê Berzo çend malik ji helbestên xwe li ser tembûrê bi awazên kurmancî ji Seyda re gotin, gula Namî, geş bû, çeng nebûn pê bifire. Wî dixwest Berzo di dilê xwe ke. Piştî rojekê diduyan hunermendê hêja Mihemed Şêxo hate mala me û dev li ken got: 'Seydayê Namî tirsêk kire dilê min, wî hişt ku çogên min bişkin, hingî wî pesnê Berzo da. Min got: 'Seyda te ji pêşî ve bigota ku Berzo ye, ez neditirsam, min got ka ev hunermendê mezin kî ye?!'

Du caran bi Seydayê Ehmed Namî re, cara pêşî û ya dawî, wek du kat û du nivîstokên pîroz di nav gurzegulên bîranînên min de heta sax im, dê her bimînin.

Min rengên "alê" ji helbesta Cegerxwîn û bi têgehiştina zarokî nas kiribûn, belê min li tu cihan ala pîroz nedibû. Cara pêşî ku ez çûme mala Seydayê Namî li wir min ala Kurdistanê dît, li wir çaxa ku di zîndanên de neynokên xebatgêran hildikirin û tirsek bêhevta hebû, li nav dilê mêzerekê bi tevî ala Kurdistanê hatibû çinîn û bi dîwarê xanî ve hilawistî bû. Namî di wê civatê de bihayê serfirazî û naveroka rengên alê bi hevrişmê gotina xwe ji min re bi dar ve kir.

Cara dawî, ku di pey re, Seydayê Namî bi pîrî li pey Xwedayê xwe çû. Gava ez ji başûrê Kurdistanê vegeheram, ew nexweş bû, wê şevê ez bi bavê xwe re, çûme serdana wî. Ew ji nav cihê xwe rabû, çeng bû devê derî, destê min weha bi germî girt û berneda, wî dixwest ji germiya destê min dilê xwe ji rûbarê şoreşa kurdî tijî ke, bi kelgermî ji min re got: 'Tu li ba min muqedes î, tu du car muqedes î, carekê ji bo ku tu çûyî û te ziman û edeba kurdî xwend, û careke din tu muqedes î, ji ber ku te hevpişkî di şoreşa kurdî de kir'. Ev gotinên ha ji kûrahiya dilê wî derdiketin. Dilovaniya Namî ji kêşa wî re hiştibû, ku pîrpirîka canê wî rojê sed carî di agirê kurdaiyê de bişewite. Xwendin û nivîsandina ziman û helbestên kurdî li ba Namî û hevalên wî karekî pîroz bû, ji lewra em dibînin, ku şevbiwêrkên wan herşevî bûn û ji berhemên wan şevbiwêrkan, wan civat û tevgeran, ev herdû pirtûkên Namî bûn:

1-Agirê Sînema Amûdê

2-Daxwazname

Herweha nivîsên mele Hesenê Hişyar, ku rûpelên pirtûkên wî bêjimar in û ji hemî rengan gul û bişkojên welatê xwe kom kirine. Û wê ez dizanim ji kesên wê civatê Evdê Têlo jî li ser dîroka Kurdan û kelepurîya Kurdan dinivîsî,



herweha helbestên Mele Tahir jî gelek hene. Kesên di wê civatê de û di wan şevbiwêrkan de hevpişkî dikirin, hemiyan xwe bi xwendin û nivîsandina helbesta û mêjûya kurdî mijûl dikirin. Şevbiwêrkên wan jî bi vî rengê xwarê bûn. Ji piştî nîvro karê wan dest pê dikir. Civatên berdîwaran hebûn û yek ji wan civangeha li nêzîk mala me bû, ku dîwarê qapanê bû. Ew lê rûdiniştin û dengûbas kom dikirin û ji wan kesên di vî civatê de xuya kiribûn bavê min Emerê Evdîle û xalê min Silêman bûn û navê "îzaa berhêtko" li vî civangehê kiribûn.

Li şevê civîna taybetî dest pê dikir û her yekî ji wan çeltêkê got û bêjan vala dikir. Hin bi nizm û nermî û hin bi hişkî li derya meqerisiyê siwar dibûn, pêl tevlihev dibûn, nimz û bilind dibûn, ta li dawîya şevê şapa gotinan li zevîka rastî û dilovaniyê radiwesta. Destê biratiyê dihejandin û li nav kolanên Qudûrbegê li ronahiya çiriskên hêviyan belav dibûn, da şeveke din li ser çengên daxwaz û hestîna nû, da li civaneke nû çira şevbiwêrkeke nû pêxin... Li dawiyê du pêşniyarên min hene:

1- Hêja Osman Sebrî: Ez dibînim ku me kêmahiyek mezin li beramberî wî kiriye û ya rast ew e, ku em şevbiwêrkekê ji bo vî mirovê xebatgêrî pîr hêja li dar xin

2- Em karekî bikin, da em bikaribin bi dilovanî rewşenbîr û nivîskaran di bin sîwana berjewendiya ziman û toreya kurdî de, kombikin.

# Ehmedê Namî Şivanê derdan



## KOVARA ZANÎN

*Ga dimire, çerm dimîne, mêr dimire nav dimîne.*

Bêguman, dema ku mêr an çî mirov be, di jiyana xwe de, tiştêkî hêja bike, wê navê wî bi wî karî ve bê girêdan. Gelek kesên hêja hebûn ku di jiyana xwe de pir westiyar, dijwarî û taliyê jiyana wan vegirtibû. Lê dîsa jî, ev kes di cihê xwe de ranewestan, jiyana xwe ne wek kesên normal berdewam kirin, lê bi danekî pir hêja û giranbûha xwe bi cî kirin. Lewra navê van kesan jî, di mêjîyê her mirovî de ma.

Ev kurtegotina jorî min di hejmara yekê de, ya kovara me kovara Zanînê de belav kirbû, dema me gotar li ser seydayê Palo nivîsîbû. Ev gotinên han li bejna seydayê me yî nemir Ehmedê Namî jî tî.

Seydayê Namî weku me li ser xwendiyê û me berhemên wî di kovarên kurdî Hawar û Ronahî de dîtine; mirovekî ta bi hestiyên xwe kurd bû. Dêrdên gel û welat ti carî ji bala wî nedîçûn, ta ku di malîkek ji malîkên xwe de ew xwe dike şivanê derdan. Di hejmara 30î, ya kovara Hawarê de, helbestek bi navê "Diljaniya Haco Axa" nivîsiye û van gotinan tê de dibêje:

*Haco tu bi navê kurdewarî  
Razayî li benda efwa barî*

*Emrê te meger gîhabû şestî  
Nazdarê welat tu zû nivîstî  
Namî bes e, ey şivanê derdan,  
hêja bi xweşî dikî xeberdan.*

Helbet kovara Zanînê nemedî di derheqê wî seydayê canfida de nekir, ev seydayê welatperwer û xwediyê marş û sirûdên niştîmanî û neteweyî û di hejmara 7an de li sala 1993an gotarek hêja bi destê dostê Zanînê mamosta Elî Şemîn belav kiribû. Ev çend malîk ji wê sirûdê ne:

*Birayên delal hûn werin xortino  
Buhuşa welat de 'm herin merdino  
Eger hûn neyên van e keç em meşin  
Bese koletî serfiraz de 'm bijin  
Welat çav li rê bendewarê me ye  
Civan herine pêş dem û dewra we ye*

Çend rawestgehên berbiçav di jiyana seydayê Namî de hene, ez dixwazim wan ji we re bibêjim:

-Seydayê Namî hiş û bala xwe dabû fêrkirin û pêşketina keçên kurd, ev kesên ku nivê millet in. Ji ber vê wî rabû dibistanek li ser girê Tilşêrê ava kir. Mirovên paşverû, yên di wê demê de pir enîrîn û êrîşî seydayî kirin, ta hinan ev gotinên beloq gotibûn: 'Namî, konê şeytên li ser girê Tilşêrê vegirtiye'.

-Rawestgeha diduyan û ya herî hêja ev bû, dema seydayê Namî berî mirina xwe ev gotina dilbiêş gotibû: 'Hêvîdar im ji xortekî kurd, roja welat azad bibe, ew bilez bê ser gora min û mizgîniyê ji min re bîne, da ku êdî ez bi xweşî li goristanê razim'

Bêguman wê gelek rawestgehên hêja yên ku mirov serê xwe li ber wan bilind dike hebin.

Berhemên seydayê Namî ev in:

*Daxwazname, Agirê sînema Amûdê, Ferhengê kurdî-erebî û hin tiştên din.*  
 Bi van çend gotinên seyda ezê gotara xwe bixemilînim:

*Welatê min, bi te ez bûme dîndar  
 Evîna te ji lawîni kirim jar û birîndar  
 Gelek wek min di vê rê de fenabûn  
 Hemî jî bêgoman şêrê çiya bûn  
 Nebe xemgîn weke Namî ciwanî bê miradî  
 Bijî herdem welatê min bi şadî .*

## Dil bi êş im



**Salihê Heydo**

Halaneke pir xurte ku ez îro dibînim  
 Lewra dil bi êş im  
 Jana wê gelek dijwar û kûr û pir yeman  
 e

Cergê diguvêşim  
 Xîzîn bi mi ket îro ji cawbir û erînan  
 Wek topê qumêşim  
 Rengê ard û hevkingê bi destêr tême  
 hêran

ez di hundirê êş im  
 Herdû gawirên kevra li ser min va  
 digêrin

Hestî diterêşim  
 Heyanî di hêranê de jî hildipekim ez  
 li rûyê qerêş im  
 Ev halê min e her ku serî rakim ji bo  
 heq

şûrê xwe dikêşim  
 Bi kuştin û bi qirkirinê mi zora herkesî  
 bir

Ez tede li pêş im  
 Her carekê fermanek li cîhanê ku rabe  
 Tim jê ez bi bêş im  
 Doza min li dara bi stirî geryaye îro

Rengê hevremêş im  
 Di nav çavê neyaran de wekî durî  
 diyarim

Şojin û dirêşim  
 Doza min li piştê min di tûr de pê  
 digerim

Rengê derewêş im  
 Parsê dikim ez pê pê li her deryî  
 dixînim

Daxwazê tewêş im  
 Dosta qewirandim îro digotin de siktir  
 Qey rengê kelêş im  
 Berjêr diçim û dîsa li jora xwe dinêrim

Yan jî ez li kêş im  
 Nawestim ebed çavê min jî qet naşikin  
 jê

Bi gavên xwe li pêş im  
 Çendî jî ku dijwarî bibînim paş de  
 naçim

Çimkî xwedî kêş im  
 Behwer bikî pir nêzîk e ku rojê bibînim  
 Ewran biqelêşim

Ev îbek û merwend û zilindara ku min  
 xwar

Ji nava xwe verêşim  
 Da agir û burkanê dil û canê xwe  
 derxim

dijmin bitevêşim  
 Ez kurd im li kurdistanê şînatime îro  
 ne ji erdê Hebêş im  
 Heyanî ku ez negihême encamê diceng  
 im

Şerqê difelêşim  
 Tevna ku neyara li dora min honaye îro  
 ez wê vedirêşim



**Kovara Pirs**

Guhdarên hêja!  
 Dema we xweş be. Bi navê kovara  
 Pirsê, em bo amadekirina vê şeva  
 rewşenbîriyê spasiya we dikin.

Pêkanîn û vexwandina kovarên kurdî  
cihê serbilindiyê ye, nemaze ku zîlana  
vê vexwandinê  
bîranîneke rewşenbîrî ye -bîranîna  
bîstsalîya koçbûna rewşenbîrê Kurd  
M.E. Namî ye.

Em pir kêfxweş in, ku îro bîranîna  
seydayê Namî bû sedema karekî  
hevbeş. Em weke kovar hêvîdar in  
û amanede ne, da karên hevbeş  
berdewam bibin.

Di roja rojnamegeriya kurdî de, kovara  
Pirsê û çend kovarên xwişk şevê li dar  
xistibûn. Di wê şevê

de kovara Pirsê çend pêşniyar berçav  
kiribûn. Emê îşev jî hin ji wan  
pêşniyaran bînin zimên:

1. Lihevrujîstina berpirsiyarên kovaran  
bo peydakirina atmosfêreke baş ji bo  
avakirina bingehin saxlem yên dan û  
standinên kultûrî.

2. Damezirandina hin komîteyan, wek:  
komîta arşivkirina çalakiyên torevanî.  
komîta bikaranîna durust ji termên  
kurdî re.

Bila bîranîna seydayê Namî bibe  
sîmbola karên rewşenbîrî, yên hevbeş,  
bo daxuyakirin û pêkanîna  
erkên rewşenbîrên kurd. Sipas

## Helbest



Seydayê keleş

Namî te ji nameya xwe da me  
Bi pêş ve dida te hunera me  
Îşev te di bîra xwe de fînin  
Rewşen te dida her devera me

xort vane li ristên te bi kêfîn  
Wan guftûgotan ruhnî dida me  
Rast e tu li cem me pir buhayî  
Serdar e li koşik û sera me  
Rêka te vekir bo me xelas e  
Em tê ve diçin tim kedera me  
Rabe ji gorê seydayê namî  
Hişyar me bike ji vê xewa me  
Ta kengî ji vê xewê şiyar bin  
çûna te gelek zerar giha me  
Milet va ji hev tev bûye perçe  
Dijmin jî wiha tişteke neda me  
Îro jî tevlihev em ne xwedî ne  
Serhişk û ezî bûye bela me  
Em tev de li hevdû berizî ne  
Qet qet va dibî bend û bera me  
Lêdan û bi kuştin em diçin hev  
Dijmin vemrand find û çira me  
Ser rake ji axa Tel Şîrê  
Beyhûde diçin kar û keda me  
Seyda de rabe em dest bidne hev  
Wê gel guhbîdî şop û gera me  
Ger em ku bi hev re rast û rind bin  
Wê gel xwe bidî ber vê siha me  
Dema we gelek tarî û reş bû  
Dijwarî diçûn sal û meha me  
Mizgîn me li te seydayê Namî  
Cenga Xelîcê fêde dida me  
Şah çûye û Sovyêt herifîne  
Berken me bi van tev çûne dam e  
Bayê me ji dûr ve vaye xurt e  
Zordaye bi pêş ve sefîna me  
Vaye dûrima me ber bi xêr tê  
Hêvî li me ronî bî reşa me  
Dûr naçî wê kurd hemî xelas bin  
Wê pir xweş bibî çax û dema me  
Wê rojê emê namê bidne te  
Namî de bixwînc tu nameya me  
Sed rehmet li gora te bibarî  
Divim tu nema bixwî xema me

## Bûyerek ji dîroka winda



Rezo Osê.

Di dîroka miletê Kurd de gelek bûyer û serpêhatiyên winda û jibîrkirî û sergom hene. Lê di demên dawî de ronakbîrên Kurd ev bar hilgirtin û xwe kirin berpirsiyar, ko bûyerên miletê xwe nema bispêrin hiş û gomanên dema pêş. Ewê wan biparêzin û nehêlin winda bibin û wê nehêlin destên nepaqij bi wan bileyizin. Yek ji wan bûyerên dîrokî, yê bi kul û derd, bi êş û xem di 13.11.1960 de bi serê kesên bajarê Amûdê de hat, Agirê Sînema Amûdê. Ew agirê, ko zimanên xwe avêtin gul û kulilkên her malê. Ew agirê, ko bi şûn xwe de bêhna biraştina goştê zarokên Kurd, wek agirê Eleqemşê, di nav rûpelên dîrokê de hişt. Yek ji wan kesên xwe berpirsiyar dîtin, da ev bûyer jî wêku gelek bûyerên din winda nebe û bê ser û şop nemîne seydayê Mela Ehmedê Namî bû. Lewra di rojên pêşî de, berî hilm û bêhna şewatê ji pozan derkeve û berî hêstirên çavan ziwa bibin, pirtûkek bi navê “ Agirê Sînema Amûdê ” li ser vê bûyerê nivîsand. Pêşgotina vê pirtûkê jî bi destê nivîskarê hêja Bavê Nazê hatiye pêşkêşkirin. Di pêşgotina xwe de Bavê Nazê dibêje: ‘Li bajarê Amûdê bi xwe du şewatên bi nav û deng çêbûne. Şewata pêşî di salên sihî de, dema ko balafirên Fransizan Amûdê bombe kirin, bi bombardemanê bajar hate şewitandin. Tevî ko daniştivanên

Amûdê mîna hemû gelê Kurd di wê demê de rûpelên lehengî di dîroka şerê serxwecbûna gelên Sûriyayê de bi xwîna xwe nivîsandin jî, lêbelê pozê dîrokvanên Ereban neşewitî û gotinek li ser vê têkoşînê nenivîsandin û herçî miletê Kurd jî wek hercar hemû tiştê xwe çî edeb û çî dîrok be, dispêre hişê kesên, ko bûyerê dibihîzin, yan bi çavê xwe dibînin. Loma jî piştî mirina van kesan bûyer jî bi wan re dimire. Şewata sînema Amûdê, ya diduya ye ko bi destê dijmin li vî bajarî qewimiye. Ev li gor şewata pêşî ne pir dûr e. Hîn bi hezaran kes hene, ko şewata sînemê bi çavên xwe dîtine. Ta niha jî şopên vê bûyerê li Amûdê mane. Lê ji bextiyariya me re dema şewata sînema Amûdê seydayê Namî nivîsek bi awayê rêportajeke fereh li ser vê şewatê dinivîse. Bi çapkirina vî eserî şewata zarokên Kurdan di dîroka miletê wan de ciyê xwe digire.

Pirtûka seydayê Namî Agirê Sînema Amûdê jî çend pêşberan ava bûye. Pêşbera pêşî pêşgotina seydayê Namî ye, bi navê Pêşberiya Çîrokê ye.

Di pêşberiya çîrokê de Namî ne tenha li ser bûyer û serpêhatiyên winda ji dîroka miletê Kurd diaxife, lê wilo jî li ser mamoste û zane, li ser hozan û hunermendan, li ser torevan û ristnivîsên winda ji vî miletî disekine. Wilo jî li ser kesên ko bi zimanê miletên din nivîsandine û şûnmayên wan ketine tûrikên van miletên bêgane. Loma Namî dibêje: Dema min dît, ko çîroka Agirê Sînema Amûdê yek ji serpêhatiyên mezin e, ko di welatê me de çêbûne tê hijmartin, min nexwest ew jî winda, bê ser û şop here.

Seydayê Namî ne tenha rexnê li wan hozanên Kurd, yê bi zimanên bêgane nivîsandinên xwe pêşkêş kirine dike, lê wilo jî rexnê li wan Kurdên, ko qezincên mezin û hêja gehandine



miletên din û milletê xwe ji bîr kirine û xwe jê şuştine dike. Di pêşberiya xwe de dibêje: (Mamostê û zaneyên me her bi navê milletên din xwe dan nîşandan û ji wan re xebatên hêja û bê hijmar kirine. Milet û welatê wan bê par mane, carekê ji krema xwe re negotîne em Kurd in û gelê cîhanê bi gel û welatê xwe agah nekirine).

Loma Namî dibêje: (Birano! Ev tişt bûn, ko ez bive neve kirim ji bo nivîsandina vê çîrokê).

Ev çîrok bi 'bingehên serpêhatiyê' dest pê dike. Di vir de Namî xweşik ronî dike, çawa daneheva alîkariyê bo gelê Cezayir pêk hat. Lê piştî, ko civandina alîkariyê bi têkrajî, rû sipîti û camêri li bajar xelas bû, ji nû ve xelayên nû hatibûn bîra hinekan û ew bûne sebebê ziyana mezin.

Bingehên şewata Sînema Amûdê bi (bîrhatinên mûdir ve tîr girêdan û di wan re xweş xwiya dibin, gava mûdirê nahiye mamostayên dibistanan dicivîne û pêşniyarên xwe bi wan dide nasîn: Ez dixwazim rojekê sînema Şehrezad kirê bikim û kara wê jî bidim ser perên, ko berê hatine civandin ji bo vê alîkariyê) Loma her mamostayek bi dilpakî fermanê dide suxteyên xwe: Kesê peran neyêne û neçe sînemê, nema tê xwendinê. Bi vî rengî suxteyên dibistanan hêstirên xwe bi ser dê û bavan de barandin, da nexê çûna sînemê bidin wan, da ew jî bi vî nerxî, para xwe bixin ser azadiya Cezayirê.

Piştî vê berçavkirinê Namî vedigere rewşa peydekirina nexê bilêta sînemê, nemaze ew zarokên jar û belngaz. Û bi renekî wênevanî van rewşan berçav dike. Piştî berê xwe dide pesindan û pênasîna avahiya sînemê, da ji vê pesindanê pîrsa xwe deyne ber çavan: (Çawa bihêlin xaneke dewaran bibe sînema?). Lê bi ser vê yekê de jî qeflên bi rojê filmê 'Gunehkariya nivê şevê'

dîtin. Tenha qeflên êvarê ji zarokan ketin bin barê vî navê bêqidoş û agir li wan di bergeha sînemê de leyist. Hinga ti çare ji pêvî hawar û fixanan nema. Loma 'dengbilindên bajêr ketin kolan û cadan, kirin qêrîn û hawar...'. Ji hawarên herî bi şewat, yê ko gelên bajêr tev li sînemê civandin, hawara: 'Agir ket sînemê, agir ket koza berxan, koza berxên ciwan, sîneme şewiti!'

Piştî ko Namî 'koma ademîzadan' bi jin û mêran li agir dicivîne, 'xortekî ciwan û hêja, hunermend û canpola, mêrxas û xîretşinas', ji navê koma bajêr derdixc û dide ber çavan, çawa 'peywend û zincîrên jînê qetandin, wekê şerekî xeyidî û teyrekî bazî, ko xwe berde ser nêçîrê, êriş berda kûrangiha êgir, kûrangiha mirinê, hundurê sînemê...' û gelek zarok ji agirê dijwar parastin, tanî canê xwe bi canê, yê mayî re buhuştî kir, gava hasinê sêndera deriyê sînemê, piştî ko sincirî, bi ser de hate xwar. Ev xortê canfida Mihemedê kurê Seîdê Deqorî bû. Piştî vê keft û leftê tevî 'agirvemir gehîştin', 'lê piştî çi?'. 'Berê şewat bû, paşê bi avê hatin kelandin'. Wilo şîn û qêrînan xwe berdan ser bajarê Amûdê û dengê 'dengê elahû ekber û dengê naqosan ji nivê şevê ve hate birîn'. Bi awazî digotin: 'Şîn...şîn. Ka şîna ji vê mezintir gelo?'

Agirê sînemê vemirt û daxemirt, lê agirê cerg û hinavan gurtir bû, çiko xelk bir bi bir diçûn û dihatin, di hundurê sînemê de li heriya ax û xwîn û goştê şehîdan temaşê dikirin... Her makek bi barîn li berxa xwe digere, belê 'hin derdiketin û dihatin naskirin û hin jî derdiketin, bi reng û nîşan nedihatn naskirin. Û hin parçê jî derdiketin, mîna parçên kûmirê'.

Bi vî rengî gewd û qet û parçên 280 zarokan li hev dicivînin û bi şîn û girî, bi darbest û tabût berê millet dikeve

goristanê. Seydayê Namî li ser vê bûyerê berdeyam dike û rewşa tirban dide ber çavan, çawa teka tek, yan dido dido, yan jî bi kom kulîlkên şewitî hatin veşartin û bingorkirin. Hinga dikeve pesinê serxweşiya gel, lê tawankar û sersebebên vê bûyerê ji bir nake, loma dikeve rengê bersivdan û lêpîrsîn û lêkolînan de, ta di dawî de digehe gotina rast: 'Gelo îcar berpîrsiyar kî ne?'. Dîsa em nizanin, çiko rastî nayê gotin û tirs heye. Ez xulamê wî me, yê zengil bike stuyê pisikê. Lê gelo ji gilî çî derdikeve, eger dad nebe?.

Cihê sînema bêqidoş bû 'Gulîstana Mezargehê' û peykerek tê de hat danîn. Peyker bi vî rengî ye: Sê xwendevanên dibistanê di nav pêl û pêtên êgir de ne, piştî wan li hev e û ala Cezayir di destê yekî ji wan de ber bi pêl dibe.

## Mij



Tengezarê  
Marînî

Dem...  
Ji demê derdikeve  
Em di himbêza tirsê de pîkol dikin,  
şîna te,  
bi ser dîwana pêxwasan de..

mij da.

Dilana bêreng  
Li birçîbûna tazî siware.  
Mirin  
te li civata xwe beşdar dike  
Li ser...  
xewnên te stiriyan pal dane.

Makê xwe bi zer û reş pêçaye,  
nimeha ye.

Hozanê min!  
Dîrokê çend sîxur  
çend sultan  
li ber tîfika xwe nivandine  
Rex tê  
Şev tê  
Dem tê

Hertişt melûl dibin.

Hertişt vedimirin.

Tu...

di nêv tiraf û tirafê de mest dibî.

Şev...

di serxweşiya bêdengiyê de qîran  
dilûsîne.

Hê.. ê... ê

Tu...

li pîvanê têkçûna xwe tekûz dixemilîni  
Xwekujgcha bedew di valahiyê de..  
dizûre.

ji xwe dîr nakeve

Dengbêjo!

Tu xewnan di dengê xwe de diçîni?

li...

Rexpelikên xwe dilnihayî dimîni?.

Belê...

Tinazyên min bûn,

yên bê xuşexuş li ber hev

V

E

T

I

L

E

H

A

N

hertiştî bidire hozano!

Em berdewamiya tinazoka ne

Dema tu dîtî, çemekî bê dergeh lemand

û...

reşbîniyê nalîneke bê dawî...

kenand.

Dengbêjo!

Tu xwe bi ser gavine\_ mîna hilma min  
î \_

bê pehnî de xûz dikî.

Xwelî

hêviya rojane ye.

Zîzbûna te kedî bûye.

pêjna min kenarekî bi qîram e.

De bêje dengbêjo û binehwirîne

De bêje dengbêjo û bibilîne

Tevnepîrka te di nêv...

mijankên zerî û esmeran de cot dîke.

şîret zilike,

Bê sûnd, girî dispêre xuda

De bêje, bêje

Serma amade ye.

Keser li pey hev rêz dibin

Bila şima bi landikên xwe ve  
biwerivîn

Bila mendal ji ber dengên xwe  
birevin

Bila biwerivîn

Bila birevin

Bila veçirin

Kûmir...

ji giyan re bûye berpâl û dûman bûye  
navmalî

Û...

te jî, Zerdeştê min,  
ez bêba hiştîme.

Gulvedan e...

di rûpelê dawî de kizirî ye,  
dengê mirinê dîke.

Û... Ez û tu

Li vir taveke tî ne

Bêhiviya zivistanê ne,

Bê nîfir li xwe mîkur tîn  
stiranvano!

Hekîmo!

Ma bextê me ye,

Tu bê zar û ziman ketîyî!?

Bênder e

Cencera xwe bide nav û

“ Lê lê, lê wayê  
nazikê lê wayê “

Şervaniyo!

Şûrê ji tîrêjên rojê

kete kalanên ewrên zivistanê

tê de nûsî.

Sîrûdên pêkenînê ne

De lêxe lêxe...

Sîwaro:

Pîlpîlokên gemkirî di şûna simên hespê  
te de

pîkol dikin.

Laş e,

Asoyên xwe xelek bi xelek bêpenc,  
bê xwedî...

berdide.

Hozano!

Çîtikên nivîsandinê, di destên kop de,

li ser rûpelên tarî...

dikin zîqezîq

Aramiya xewê ji çavên

sira bayê sibehê

direvînin

Dem e,

xewnên xwe di nav mij û moranê de ji  
qudûm êxistin

û...

Bi hev re

tîpên nazik, bi rengê mirinê, dilorînin.

Dengbêjo!

Li ser...

Lêva Firat mistek ramîsan,,,

dîpijin.

Bablîsok

bi nermînî tiliyan diqurçîne

De bêje dengbêjo, bêje.

Ji stirana xwe sil nebe

Bila stûnên jor bihingirin,

Bila

Li ser xemlîsiya şevê

Em bimînînin pîrseke vekirî....

# Derdo Siyasî ye



Silêman Elî

**D**erdo dengê xwe ji dengê kesî nizimtir ne dikir, ma bavê wî ji bavê kê biçûktir e? Wî dikir qeb-qeb, mîna bilbilan dixwend. Bixwe wî jî gelek caran, li ser bextê yê gotî, nizanî bû bê çi dibêje û gelo tiştê dibêje di wexta xwe de ye yan na. Lê Derdo endamê partiyekê bû û di


partiya xwe de seriyekî mezin bû jî, loma ne dibû dengê xwe kêr û nizim bike, nexasim li ber hevalên partiya "Cirnexweşan". Di baweriya Derdo de ew "du-sê zarok in, bi êgir dilfizin".

Wan zarokan kezeba Derdo reş kirine, ji serêşiyê pê ve tiştêk ji wan nayê. Bê ew Xwedê nehiştî navên evqas nivîskar û kitêban ji kû tînin?! Rebenê Derdo ji pênc sinifan pê ve ne xwendiyê û di wan pênc salên xwendinê de ji şagirtan hemiyan bêtir çê dixwarin û guhên wî ji yên hemiyan bêtir dihatin guvaştin. Rebeno navên Marks û Lenîn bihiştine (ev nav mode ne û şerm e mirovê siyasî wan nizanibe), Gorkî û Gorbaçov jî nas dike; navên merivên xwe jî dizane, lê pepûko çî dizane bê Marks û Markîz mirovek e yan dido ne? Heger li civatan behsa Osman Sebrî dibe, Derdo jî serê xwe dihejîne û dibêje: "Erê bi Xwedê. . . mêrekî çê bû". Lê feqîro ji kû zane bê kengî Osman Sebrî "Kî ne em" ya "Mem û Zîn" nivîsîne? Ma ev karê wî ye heyran?

Ev ne karê Derdo ye. Derdo karê xwe baş dizane. Her ku sekretêrê partiyê belavoka şeşmehane\* derdixe û dighîne destê wî, ew zûka-zûka sernavên herdû nivîsarên wê (kêncaran di hejmarekê de bêtirî du nivîsaran çap dibin) dixwîne û berî dide civatan. Li wir li benda fersendekê disekîne ji bo bêje: -Erê! Me jî behsa xebata miletê "Nîkaragua" kiriye, heger hûn bawer nakin va ye belavok. Ya jî: -Me di hejmara filan salê de behsa cimhûriyeta Mehabadê a sala... sala ... a ku li Îranê çê bû, kiribû.

Derdo gelekî ferqa partiya xwe ji partiyên din nas nake, lê bi bawerî û yeqîn dizane, ku partiya wî xeta rast dajo û partiyên mayî giş yên ne rast dajon.

Rojekê partiya Cirnexweşan (Derdo ev nav li wan kiriye) beyanek bela kir, dawa mafê kesên bênifûs kir. Qerebalixeke mezin ket wêlêt û gelek xort hatin girtin, tu dibêjî qey bombe bûn hatin belakirin, ne beyan. Derdo û partiya wî helwesta xwe veneşartin: "Ev xwedênehişt qey dîn bûne li ber hukmatê radibin, ji kirasê xwe derketine haho! De herin, bera ne sedî, maşele hezarî ji we bigrin di hebsan kin, ma ev kar e? Partiya me jî ev zêdeyî bîst salan e doza heqê ecnebiyên bênifûs dike; lê wek wan pelik-melikên vala li dîwaran naxe, ma carna kesî ev hawe kiriye ji bo Xwedê? A de herin bera dîwar nifûsan bidin we. Hezar carî em dibêjin bi nermî, bi bala



fireh, em welatparêzên Sûriyê ne, em ne tevgerêk infîsalî ne, divê em ji hukmetê re îsbat bikin ku heqê me heq e û em xêra welêt dixwazin..."

"Zarokan" kirin û bi serê Derdo de teqiya. Îcar ev çi bû? Derdo qet bawer nedikir ev bela were ber deriyê wî. Her car muxaberat yan polîs dihatin cem wî dikanê, tiştêk ji wan re gerek bûya, hesinkarê me bilez û bêpere ji wan re çê dikir. Bi wî re dikeniyar, jê re digotin: "Tu zilamekî baş î!". Dilê Derdo ewqasî bi rehma Xwedê şa dibû. Lê îro, nizanim çima, pê re nekeniyar! Cîp hat û li ber dikanê sekinî û sê barûte jê peya bûn, Derdo wek her car bişirî û pêrgî wan bû, lê wan bê pirs bi çepilê wî girtin, avêtin hundirê cîpê û yekî ji wan jê re got: "Îrkeb ya menyek ya 'crsa..."\*\*. Ricif ket dilê Derdo û zimanê wî ne geriya heya cîp gîha meqerê muxaberatan û li ber sekinî.

Derdo li cem wan dirêj nekir. Piştî seetekê ew tevî hurmet û rûmetê bi rê kirin û serdarê meqerê dawa lêborîne jê kir: -Ezê guhê xortan bifirkînim, ji bo careke din bi nezaniya xwe zilamekî wek te welatparêz û şerîf bi hesabê wan zarokên oportonîst hesab nekin û bêrûmet nekin.

Derdo paşê ji xelkê re got: -Wan ez bi şaşî birim. Gava min jî ji Ebû Besam re xwanê kir, ku îşê me ji beyana van zarokan tuneye û em ne pê re ne, wî qedrê min girt, çay ji min re xwest û paşê bi min re derket heya ber derî jî.

Xortê ku piştî Derdo derbas bû, dengê Ebû Besam bihîst, li pey Derdê me dibêje: "Ya hêk Ehزاب ya belaha...Tifû..."\*\*\*

\*Organa komîta merkeziya partiya (?) şeş mehan carekê der dikeve, lê hin salan herdu hejmar dibin yek û bi hev re der dikevin.

\*\*Qûnde, qewad siwarê

\*\*\*Yan partyên wilo yan na...tifû!

# Xwe-kuştina nameyekê



Şahîne Bekirê  
Soreklî

**D**i vê sibeya yekşema adara 96' an de nameyekê xwe avêt nav ava çemê Danûbê û nema hat dîtîn. Du rojan berê karmendekî postexaneyê bajarê Augsburg, Siegfried Hubert, ew di çav xwe re kiribû û xistibû beriya xwe. Karmend bi kêmasî çar caran zêfên li

ser navê Fraulein D. F. hatinê rêkir veğerandibûn welatê ew jê dihatin ji ber ku çî jimar û navên kolanan li ser wan nebûn. Li gel wê jî name, ev bûbûn çar-pênc car, di nav zerfeke nû de car din dighiştin postexaneyê wî bajarê almanî. Daku li ber kesekî din wê nexwêne, Siegfried di şefaqa vê rojê de li gel segê xwe derket seyraneke li kêleka çem, li nêzikî avê name jî beriya xwe hanî der û li ser îskemeyekê danîşt, bi armanca ku wê bixwênc. Bi çirandina kêkeja zêfê, vekirina rûpelê û xwendina "Meine sehr Geliebte D. " re bayekî qebe ku ji nişka ve kes nizane ji ku hat kaxez ji nav tiliyên wî hanî der û bi firan xist. Hema bi çend metroyan jî wî wê de nameyê xwe bi ser ava çem de berda, peyvên di xwe de dan helandin û wenda bû.

Di êvara eynî rojê de peyakî li Australya xwe avêtibû nav ava çemê Parramatta. Di nexweşxaneyê bajarê Sydney de nameyekê bi van peyvên li jêr di cizdanê wî de hatibû dîtîn: Delala min, di şevreşiyê de bang li min meke. Guhên min nema dikarin pêlên dengê te di tarîtiyê de ji hev vereşînin. Eger di nav sepeta te de dilê te beza lêbixe û ber bi yê min biqaqije xwe çê ke nav ava çemekî xwe digihîne deryayê. Giyanên me dê rojekê di binaniya ava wê de xwe bigihînin hev û ew gihîştina hev û din re bibin beşekî ji ava bi gemara mirovan hatî kujtîn. Berdîlgirana min, mêjiyê min bi mûyê ji ber kulavên odeya bavê min manî hatiye dagirtin, canê min bi çardeh hezar rêzên ji hemî aliyên cihanê bi çolê ketinî hatiye sînorkirin û giyanê min ber bi qederê radikişe. Di kûraniya şevên jiyanê de bi şopa ezê xwe dikevim da ku rastiya wî ji binê kûlika van rojan derînim lê hew diniherim roj helatiyê û rîsê ji ber teşîrêşên dunyaya me mayî xwe berdaye nav giyanê min û ez jî wek hemdemên min bi pê wan qaçilan xistime ku mirovên sedsala me xwe pê mijûl dîkin. Di nav tamarên mêjiyê min de hespine lîwankirî hene ku dixwazin bidin xarê û xwe bigihînin dera kesek negihîştêyê lê sindifan ew di nav dîwarên serê min de qeyd kirine. Xwe dispêrim tengearmancan û dibêjim xwe, roj bi roj ber bi pêş biçê, hemî jiyanê meke yek gewremebest. Wan volkanên di mêjî û dilê te de razanî vemejîne, yan erê, dawiya te dê bibe wek ya bi saxî hatinê sûtandin.

Rinda min, nameyên te yê xortaniyê di quncêkî garaca me de, di nav naylonêkî reş de veşartî dinalîne. Ev bîst û pênc sal in, dibêjim, ezê wan di dawiya hefteyê de ji nav wan textikên kifîkî azad bikim lê hefte dibin heyv û

meh dibin sal û dem bigerim û hew bibînim ku mişkan ew ji xwe re kirine zad  
dibe jiyaneke, û c, yan şîdariyê peyvên tê de helandine û nameyên te jî  
ditirsim rojekê li wan

wek te bi her bayê qedera xewnokî ketine. Çelenga min, xortekî bîst û sê salî çar  
şevan li nik te şilf û tazî di nav lihêf Graz de hat êşkencekirin da ku sozên xwe  
neşikêne û tu qîz li diya xwe vegeirî, û salan rapê hev kirin û rojekê jî rojên wan tu  
bi girî hatî pêrgîna wî û te gote, xweziya wî û ne segbavekî ji mirovan tu kiribûya  
jin, û te ew bi van peyvên birîn kir û benê ku hûn kiribûn yek qetiya û jiyane  
dîwarekî qalîn xist navbera we û we hev wenda kir. Bedewa min, li şikeftê  
digerim ku mirovan ji min biparêze û min ji wan, li çiyayekî digerim ku min  
bigihîne ew bilindiya ez li pê, û ji dîwarên girtîgeha civakê dipirsim, çima weqa  
çax jî bo va razana bêyî kelk, çima ewqas kat jî bo va xwarina ku dibe pîsîti, û  
qîrîneke ji asîmanê heftan dikeve nav guhên min yên jî dengan aciz bûnî, dibêje, tu  
xuda nînî. Çima jiyane weqa kurt e, rojên wê bi bêsûdbûnê dagirtî ne, mirovên di  
nav de weqa bi sînor û bêyî sînor in ?!

Şêrîna min, dixwazim bi vî zimanî, bi van gotinan, bi vê kurtenameyê xwe  
bigihînim canê te, lê bila di hucreyên mijiyê te de guman xwe nelipitînin, meke ji  
min re behsa evîne. Eşqa di dilê min de wekî deryaya Atlantîkê ye, bêyî ser û bin  
e, heye ku îroj evîndarê te bim, lê mebe xwedîya min. ez ji xwedîlêderketinê westa  
me, naxwazim kesek li min xwedî derkeve, bila hema li segan xwedî derkevim.

Kevnehevala min, ji min hez bike di wê êvara em tê de rastû hev tîyên de û jî bir  
bike di şefaqa ku em tê de xêtir ji dixwazin de. Meke ji min re gotina eşqa ebedî.  
Bimre her tiştê ebedî.

Xweşikî min, Têye bîra te dengê zengilên kilîseyên Viyena, kulîlkên li dorhaliyên  
ew kelaya li ser girê Graz?! Wîne bîra xwe, wekî ku ez deng û kenê te tînim bîra  
xwe, hêstirên te, tama xuha giyanê te, bêhna bin çengên te, û ew germahiya nav  
çaqên te ku min bi nexweşiya mîlankoliyê dixin, ew lîvên te, ew ciwanmemikên  
te û tevahiya tuyê te.

Hingiva min, te digot em ê yekemkurê xwe wek Saşa bi nav bikin, te digot, û  
şoreşê xewnên me yên pozbilind bi her leheya xwe xistin û bi rê ve ava leheyê  
miçiqî û di nav qûma şeharê ya mezin de şoreş jî tîna mir. Û bi encama vê yekê  
şorşgêrên bejî hatin holê û dahol û zurneyên gundiyan, tenekeyên zarokan û  
hacetên mûzikê yên japonî çîhê sîmfoniyên Beethoven girtin û çanda şoreşê ket  
sikranê û şoreşa çandê di zikê dayê fetisî.

Ya ez jê pir hez dikim, çîqa çak bû ku me çî gustîrk nedan hev dîn, ku evîna me bi  
bûyîna çî Saşayan nehat kujtîn. Dûrbûn û wendabûna me hêzê didin va evîna di  
nav dilên me de vêkefî. Kujerê evîna me dê zewac bûya. Hîva min, di nivê şevê de,  
dema tu jî ber xurexura mîrê xwe direvî derve, li stêrkên di paş ewrên Ewropayê  
de xwe veşartinê bigere, heye ku tu yekê jî wan bibînî. Kincên li xwe biçirînc, xwe  
ji bandora salan li giyanê te kirinî biadzînc û ber bi stêrkê bifire, da ku em di nav  
şewqa wê de xwe li ciwantiyê vegeirînin û di nav agirê wê de bişewitin, da ku em  
qederê bikujin û nemînin, û eger em li dû nemanê dîsan vegeirîyan nav rotîna  
rojane, nizimtiya jiyînê û geroka mirovan, li ber yezdan bigere ku bila hebe, û eger  
hebû, bila diyariya pêşkêşî me kiribû di katê de ji me bigire, da ku em nebin dilên  
jiyînê.

# Goran bikole!

Cibran

Xelîl

Cibran

Wergêr Zagrosê Hajo

z di bin siha newala jînê re diçûm.  
Newal bi qoq û hestûyên miriyan  
gnijinandî bû. Di şevê ko mijê stêr  
nixumanawoûn û tirs ber bi guhê  
bêdengiyê ketibû, di wê şevê de ez bi  
tenê bûm. Li wir li ber keviya çemê  
xwîn û hêstiran, çemê weke marekî reş  
dişêliha û weke xewnên tawanbar  
dibezi; ez rawestam û min li piste pista  
şevreşkan guhdarî kir û li netiştekî  
meyzand.  
Wext bûbû nivê şevê û qeflên giyanan  
ji govên xwe derdiketin. Gurme gurma  
linge kî ji paş ve ber bi min ve hat. Ez li  
xwe zivirîm, da ez bibînim, lê çî  
bibînim! Min dît gava ko bertelaşekî  
têbayan bi heybet li ber min hilkişaye.  
Min kire qêrîn!

- Tu çî ji min dixwazî? bi çavine beloq  
meyzand û bi aramî got:  
- Ez ti tiştî naxwazim û ez her tiştî jî  
dixwazim.  
Min got:  
- Dev ji min berde û bi riya xwe de  
here!  
Dev li ken got:  
- Riya te riya min e. Tu bi kû de herî  
czê bi wir de biçim û tu li kû rawestî  
czê li wir rawestim.  
Min got:  
- Ez hatime li tenahiyê digerim, de dev  
ji min û tenahiya min berde!  
Êdî got:  
- Ez tenahî bi xwe me, vêca tu çima  
ditirsî?  
Min got:  
- Ez jî te natirsim.  
Wî got:  
Hêca tu natirsî nexwe tu çima weke  
çêteke li ber şeka avê, dilerizî?  
Min got:  
- Ba li cilên min dide û ew dihejin, lê  
ez, ez nalerizim.  
Bû tiqtiqa kenê wî, dengê kenê wî weke  
dengê bahoze bû, û wî got:  
- Tu tirsonek î û tu newêrî ji min bitirsî.  
Tirsa te du car e, lê tu dixwazî wê di  
bara sixtekariyê de veşêrî, lêbelê ew  
sixtekariyêke ji tevna pêrepindê teniktir  
e. Ev yek min dikenêncê lê ew min tore  
jî dîke.  
Piştê ew li ser latekî rûnişt, min dît  
gava ez jî bêyî vîna xwe dirûnim û li  
dême wî yî bi heybet dinerim. Piştî  
kêlîkekê, ko ew di çavê min de weke  
hezâr salî bû, wî bi tinazî li min  
meyzand û pirsî:  
- Navê te çî ye?  
Min got:  
- Ebdile (Kolê Xwedê) ye.  
Wî got:  
- Ev koleyên Xwedê çiqasî gelek in û  
çiqasî bela serê Xwedê bi van koleyan  
gelek e! Tu çima navê xwe nakî Axayê  
şeytan û belayekê bi ser belayên  
şeytên ve nakî?  
Min got:



- Navê min Ebdile ye û ev navekî li ber dilê min şêrn e. Roja ez bûm bavê ew



nav li min kir û ez wî bi ti navên din naguherim.

Wî got:

-Jixwe bela serê zaroyan diyariyên bavan in, û yên xwe ji danên bavan rizgar nekin ewê koleyên miriyan bin ta ew bi xwe jî bimirin.

Min serê xwe xiste ber xwe de û ez li ser gotinên wî fikirîm. Min wêneyên xewnên di tentêla rastiye de anîne bira xwe. Wî dîse pirsî:

- Tu çi karî dikî?

Min got:

- Ez helbestan dinivîsim û wan diraxim. Dîtinên li ser jiyane jî ez di nav xelkê de bela dikim.

Wî got:

- Ev pişekî kevnî e, dev jê hatiye berdan û ew ne sûd û ne jî zerarê digehêne kesî.

Min got:

- Ma ez çi di şev û rojên xwe de bikim, da ez sûdê bigehênime xelkê?

Wî got:

- Kolana goran ji xwe re bike piş. Tê saxan ji laşên miriyan, yên ko li dora xaniyên wan, li dora dadgehên wan û mizgeftên wan ketine ser hev de rehet bikî.

Min got:

- Min laşên miriyan, li ti deran weke tu dibêjî ketine ser hev, nedîtine.

Wî got:

- Tu bi çavekî şaş dinêrî. Tu xelkê li ber bahoza jiyane dibînî, çaxê ko ew dilerizin êdî tu goman dikî ko ew sax in, lê ew mirî ne. Ti kes peyde nebûye, da wan veşere. Ew li ser rûyê erdê avêti ne û bêhna genî bi wan ketiye.

Min got û pêre hin tirsî min çûbû:

- Êdî ezê çawa sax û miriyan jî hev nasbikim, heke herdû li ber bahozê dilerizin?

Wî got:

- Yê mirî li ber bahozê dilerize, lê ye sax pê re dibeze û naraweste ta ew neraweste.

Wî bi ser çengê xwe de palda û pê re maskulkên wî, yên levbadayî xwiya kirin. Ew weke qurmê mirxê tijî niyaz û jiyana bûn. Piştî jî min pirsî û got:

- Ma tu bi jin î?

Min got:

- Erê, û jina min levhatî ye û li ber dilê min buha ye.

Wî got:

- Ev çiqasî guneh û xirabiyên te gelek in! Zewac koletiya mirov ji hêza berdewamiyê re ye. Heke tu bixwazî azad bibî, rabe here jina xwe berde û jiyana xwe bi tenê bidomêne!

Min got:

- Sê zarokên min hene, yê mezin dileyize û yê piçûk gotinan dicû û wan nabêje. Ma ezê çi ji wan bikim?

Wî got:

- Wan hîn bike, da goran bikolin! Bêrekê û merêkê bide wan û dev ji wan berde!

Min got:

- Ez bi tenê nikarim bijîm. Ez hînî şîraniya jiyana di nav jin û çêlikên xwe

de bûme. Heke ez dev ji wan berdim wê hingî şahî jî dev ji min berde.

Wî got:

- Jiyana mirov di nav jin û zarokan de bixwe tenê kuleke reş e, bi rengê spî boyaxkirî ye. Lê heke her bê zowac nebû, de êdî rabe zeriyeke nûhatî ya keçên cinan ji xwe re bêne!

Matmayî min got:

- Cin nerast in, tu çima min dixapênî?

Wî got:

- Tu çi xortekî bodîle yî! Ti rastî ji ya cinan pê ve nîne û yê ne ji cinan be, nexwe ji dinyayeke bi şik û tevlihev e.

Min got:

- Ma keçên cinan xwînsêrîn û spehî ne?

Wî got:

- Xwînsêrîniya wan nabuhure û spehîtiya wan naçilmise.

Min got:

- Cinekê şanî min bike, da ez behwer bikim.

Wî got:

- Heke te karîbûna cinê bibînî û bihingiviyê, min nedigote te wê li xwe mehr bikc.

Min got:

- Çi sûd ji cina ko nayê dîtî heye?

Wî got:

- Ez sûdeke hêdî hêdî ye. Wê nemana bûnewer û miriyan jê werc, ewên li ber bahoze dilerizin û pê re namesîn. Kêlîkekê berê xwe ji min guhert, lê dîse vegeza û pirsî:

- Ola te çi ye?

Min got:

- Ez bi Xwedê behwer im û rûmeta pêxemberên wî digirim. Ez hez ji qenciye dikim û hêviya min bi duwarojê re heye.

Wî got:

- Nîşên berê ev gotin ji xwe re li hev anîne. Lêpelînê jî ew gotin xistine nav lêvên te. Lê rastiya tîşî ew e, ko tu ji xwe pê ve bi ti kesî behwer nakî. Tu rûmeta ti kesî nagirî û ji meylbaziyên wê pê ve tu hez ji ti tîştî nakî û ti hêviyên te bi sermediyê re nînin. Ji destpêkê ve mirov îbadeta Xwedê dike,

lê ew li gor meylbazî û daxwazên xwe wî bi navên cuda bi nav dike. Carekê navê Baal lêdike, carekê navê Jupiter û careke din xweda lê dike.

Pîstre ew kenî, dêmê wî di pişt perda tinazî û pêkenîne re xwiya kir, wî bi ser ve kir û got:

- Ev xerîb in, ew îbadeta xwe dikin, ev "xwe", ya kelaşekî genî ye.

Bîstek derbas bû di nav re ez ji xwe re li gotinên wî vegeam û min li ser hizir kir. Ji nişkê ve min di wan de wateyên ji jiyane xerîbtir, ji mirinê kambaxtir û ji rastiye kurtir dîtî. Berî ko hişê min hate serê min, , da ez sir û nehîniyên wî nas bikim, ez di nav dêm û xisletên wî de winda bûbûm û dilê min rabûbû ser piyan. Min ji kel got.

- Heke Xwedayê te hebe, tu bi wî Xwedayê kî, bêje tu kî yî?

Wî got:

- Ez Xwedayê xwe me.

Min got:

- Û navê te çi ye?

Wî got:

- Xwedayê dîn.

Min got:

- Tu li kû bûyî?

Wî got:

- Li her derî.

Min got:

Û tu kengî bûyî?

Wî got:

- Di her heyamê de.

Min got:

- Tu ji kê hînî hikmetê bûyî û kê nehîniyên jiyane û bingehên heyîne ji te re gotine?

Wî got:

- Ez hekîm im. Hikmet xisletek ji xisletên mirovên xizan e.

Lê ez dînekî bi hêz im. Ko ez dimeşim zemîn di bin lingên min de dirêj dibe. Ko ez dirawestim koma stêran bi min re dirawestin. Ez hîn bûme kenê xwe bi mirov û îblîsan bikim. Piştî ko ez bi şahên cinan re û lehengên şevê re rabûm û rûniştim, min sirê heyîn û neyîne nas kir.

Min got:

- Tu di nav wan newalên kûr de çi dikî  
û çawa şev û rojên xwe derbas dikî?

Wî got:

- Beyanî li ser rûyê rojê ez keştevaniyê  
dikim, nîvro ez naletê li xelkê dikim,  
êvarî ez tinaziyên xwe bi xweristê  
dikim û bi şev ez li ber "xwe" diçime  
ser kabokan û ez îbadeta "xwe" dikim.

Min got:

- Tu çi dixwî, çi divcxwî û li kû dirazî?

Wî got:

- Ez û dem û derya, em narazin, lê em  
laşê mirovan dixwin û xwîna wan  
divexwin.

Rabû ser xwe, destê xwe li ser sînga  
xwe li hev badan, piştê li nav çavên  
min meyzand û bi dengêkî kûr û nerm  
got:

- Oxir be, emê careke din hevdu  
bibînin! Ezê çime cihê dêw û lehengan.

Min ba kiriyê:

- Kêlîkeke din ji wextê xwe bide min,  
hê pirseke min î din heye!

Hinek ji bejna wî di nav mijê de winda  
bûbû. Wî bersiv da:

- Xwedayên din wextê xwe ji ti kesî re  
vala nakin. De emê hev bibînin!

Ew di nav perda şevê de ji ber çavên  
min winda bû. Ez bi tirs, şê û matmayî  
bi xwe û bi wî re mam. Çaxê ko min  
berê xwe ji wî cihê guhert, dengêkî bi  
pêl ji nav latên bilind hat, digot:

- Emê hev bibînin! Emê hev bibînin!

Roja din min jina xwe berda û zeriyeke  
ji keçên cinan ji xwe re anî û piştê min  
bêr û merek da her yekî ji zaroyên xwe  
û ji wan re got:

- Herin ! Çi cara we yekî mirî dît, win  
wî bin ax bikin!

Ji wê rojê ve ta niha ez goran dikolim û  
miriyan diveşêrim, lê mirî gelek in û ez  
bi tenê me, ti kes jî bi min ve nayê.



Ji romana  
**PERÎK**



Selim  
**BEREKAT**

## Mele Selîmê Bedlîsî

**E**ger min ji te re nivîsand, ez dê tiştêkî bi dilê te binivîsînim Yabo. Ew kesên ku li bakur derbasî mala me dibin \_ mîna ku aniha, piştî ku şeş salan ji te bi dûr ketime, derbasbûna wan dibînim \_ bi desmalên ku wekî şaşikan li ser serê xwe girêdane, û bi ebên xwe ku keviyên wan avêtine ser destên xwe, ew kes\_ di dawiya şevê de \_ dê neçin ku; tiştê pêwîst ji te **nebihîzin: “Kurd ti carî naşikên”**.

De wisa ji wan re bibêj Yabo, û li cigareya xwe yî sorbûyî ku tu pif xweliya wê dikî da ku bi ser nermika destê te yî vekirî de bikeve, temaşe bik: “Xwelî” . De vê peyvê bibêj û xweliyê bi zimanê xwe daqurtî. Tama xweliyê xweş e. Tama xweliyê xweş e Yabo tîrşahiyeke sivik, ziman zuha dibe û piştê av pê dikeve. Û her bibêj “Ti carî Kurd naşikên, çinkî xwedanên êşa xwe ne” .

Peyva “xweliyê” bê tinazî dúbare bik Yabo, çinkî serdanvanên te xweliyê dînasin. Kes ji me nîn e ku devê birîna xwe bi xweliyê negirtibe. Paçan dişewitînin û devê birînan bi xweliya wan asê dikin: Mezin û biçûk, nîş bi nîş. Û tu jî, Yabo, qerfê xwe bi peyvê neke, na herê bibêj, û li cigareyên xwe yên dadayî temaşe bik, mane Mele Selîm jî, gava ku şikestî û têkçûyî; di destpêka sedsala bîstan de xwe avêt bextê kunsilxaneyê Rûsan, wisa dikir.

Tu ji mêvanên xwe re li ser dijwariya têkçûnê dipeyvî; ku çawan vî Melayî nikarîbû li navçeya Bedlîsê cebilxaneya ji çek û mirovan bi dest xîne da ku wan ji Tirkan rizgar û serbixwe bike. Tu poşmaniya xwe yî kûr û berfireh li ser kuştina wî, sêdarkirina wî li meydana bajêr, bilind û diyar dikî; piştî ku Tirkan êrîşî kunsilxaneyê kirin. Lê Mele Selîm, Yabo, di wan çend rojên ku xwe avêtibû bextê kunsilxaneyê berî ku Tirk êrîş bikin, Kunsilê Rûsî hînî sûdeyên xweliyê dikir.

**W**exta ku Mele Selîmî xwe avêt Kunsilxaneyê; Kunsilê Rûsî bi rêzdarî pêşwaziya wî kir; rêzdarîyek daku ligel bejna mirovê ku ji têkçûneke dijwar hatibe, bigunce. Her ku bi hev re dicivayan \_jixwe di rojên pêşî de her seet bi hevûdû re dicivayan\_ perdaxine ji ava leymûndiz û şekir pêşkêşî wî dikirin, Mele jî her ku perdaxa tîrş, bi sê qurtan, ligor sineta pêximber, dadiqurtand; destê xwe datanî ser nava xwe yî ku dişewitî, û bi peyvîne kurdî sipasiya kunsilî dikir.

Navê wî berî wî ghiştîbû kunsil, lewra wek penaberekî pêşwaziya wî kir. Çend rojan bi hev re nepeyvîn, rastî hev dihatin; sipasiyên Melê jî; bo Kunsilê ku dilê wî bi şikestineke bêçare dijeniya, yên mirovekî têkçûyî bûn. Nemaze dema ku yê Kunsil leşkerên Tirk li hawirdor avahiyê bi çûn û hatin û bi tiving û bi nêrînen dizî li pencere û dergehyan, didît. Lê çawan Mele Selîmî yê Kunsil hînî sûdeyên xweliyê dikir ; ez bixwe vê yekê nizamim, digel wî zimanê lal ê ku di navbera wan de bû jî; dîsa ew hîn dikir.

“Destê xwe vek” Mele ji kunsil re digot, û bi destê zilamê rû Qirxizî digirt, Kunsilê Rûs mista destê xwe vedikir û bi bişîrîn di bin berçavka xwe yî girover î piçûk re lê temaşe dikir, jina wî ya bédeng jî; di kursiya xwe de; kursiya bi destikên textînî û bi cawekî şîn rapêçayî, çavdêriya wan dikir. Wexta ku nermika destê Kunsilî baş vedibû Mele Selîmî tayek ji zendika sakoyê xwe dikişand û di navbera herdû tiliyên xwe de, dişewitand, wexta ku vedimirî xweliya tê diweşiya destê yê Rûsî yê ku hê jî li ser bişîrîna xwe bû, Kunsil li xweliya di destê xwe de temaşe dike û piştî li rûyê Melê; bêyî ku çîrokê têbigihêje yan jî lê bipirse. Piştî, xwe ber bi jina xwe ve dizîvirîne mîna ku şirovekirina tişteki jê bixwaze; lê jina wî ya \_ pir \_ sipî di çarçewa bédengiya xwe yî dûr de, dimîne ; bi dudiliya ku li ser dîmenên wê nedixuya , hiriya lawirekî bi şekê hestîni yî mezin şeh dikir.

**H**ivdeh peyan, derbasbûna Mele Selîmî bo Kunsilxaneya Rûsan a li Bedlîsê, bê metirsî, amadekirin; bi tivingên xwe, Mele Selîm ji Tirkên Toranî \_ piştî eşkerebûna têkçûnê \_ hetanî sûra kunsilxanê, diparastin, û herhivdeh peya, li çola berfireh û rût li ber sûrê daku bişên Melayê xwe di dergeh re derbas bikin, hatin kuştin.

Erê Yabo! Mele Selîmê Bedlîsî jî wek Mîrên te yên dîtir, bi piştgiriya teqneke kurd biryara xwe ya ku hêzdar nikarin wê bidin, da. Ji Bedlîsê li

Erzrûmê, li Amedê, li Botan û li Cizîrê, li darêjgehên mezin ên çemên ku ji bakurî Torosê diherikin, temaşe dikir, wek Mîr Bedirxanê ku beriya wî bi sedsalî serî hilda bû.

Lê vê carê Yabo, ne Firansiyên Galî \_ û ne jî kurên Arthurê Brîtanî yên ku hin ji xelkê rehên wan vedigerîn "Lansîlot" yarîkê jina wî \_ wek ku çawan li dijî Mîr Bedirxanî, bi bahaneya parastina filehên herêma Botanê, xebitîbûn, li dijî Mele Selîmî nexebitîn çînkî ti kes neditirsand, lewra ji Kunsilê Rûs, yê hêmin re, sudeyên xweliyê şirove dikir, mîna ku dê birîna xwe yî mezin, bi hemî xweliya ku dê jiber şewatên zemînê bimîne, dagire; ew bixwe dizane, ku zîlamê li hember rûniştî; xwedanê berçavkên tenik, ti tiştî ji kurdiya wî; ji zîmanê wî, ji bilî tevger û bizava destên wî, têngahîje, herwa dixwest ku bizava destên xwe jî kêmtir bike, çînkî guh nade ti tiştî ji bilî çavên Kunsilê Rûs yên ku êşa wî dibînin, bi kurtepiştî: "Xwelî, de hema çî ta be ji sakoyê xwe bikişîn û bişewitîn, tu yê xweliyê qezenc bikî, temaşe bik", dibêje û sakoyê xwe yê qesebkirî yê ku berdaye ser şerwalê zaxoyî bi destê xwe nîşan dike; şaşîka xwe ya ku bi dismaleke zer î dîsa qesebkirî rapêçayî ye, diedilîne, û berdeyam dike: "hema tayekî ji kû be bila bibe, û bişewitîn", û berê xwe dide jina kunsilî ya ku di bin ebrûyên xwe yên kej de lê temaşe dikir: "Keçê hiriya vî lawirî gelekî neşikîne, çînkî kêç zû tore dibin". Û dibişire. Piştire, hêdî hêdî, bişirîna, ku telihevî û dudiliya wî, di hindurê vê kunsilxaneyê de, dinixumandin, vedimirî.

**D**ê Mele Selîm çî bike? Dipûnîje Yabo. Bi zerîkê ji satila sifirîni destnimêj digire. Li ser sakoyê xwe nimêj dike; çînkî baweriya wî bi xêliyên kunsilxaneyê nedihat. Bi dizî; bi lêbûrîn li jinîkê temaşe dikir, ewê jî, bi lêbûrîn, mîna ku çarenûsa wî ya zelal bîn bike, lê dinêrî. Digel vê jî Kunsilê bêdeng û hêmin; di navbera çax û çaxekê de, ji tinaziyan ne bê par bû, destên xwe datanîn pişt guhên xwe û awayê nimêja Mele Selîmî, dikir, newqa xwe diçemand, pişt re xwe ji hevdu vediziland mîna yê ku ji wan bizavên pehlewani biweste, penaberê dil jî di wê neqebê re; dibişirî.

Ha wa tu jî; di êvara zivir de ya ku xaniyên bakur dorpêç dike; ku tu nameya min ji mêvanên xwe re dixwîni, dibişirî, Yabo, tu awirên xwe ber bi rûyên mişt sosret bilind dikî: "Me ew hinartiye ba zîlamê mezin da ku hîn bibe, ewî jî \_ berî her tiştî \_ nameyeke kawikiyane yî nivîsandî ji me re şandiye, tika ye hûn lêngirîn". Û tu bi pitepit dikenî: "Mele Selîm!! Ji bo çî wisa bi berfirehî li ser nûçeyên wî radiweste? Min serbilind dike". Û tu radiperiyayî. Ez raperîna te dibînim Yabo: "Na na nakeve serê min, ez jê ne razî me, lêgerîna wî ya li zîlamê mezin nabe bahane ku wisa pesnê mala zîlamê mezin bide".

Lêbûrîne dixwazim Yabo. Ez dê anîha ji te re nenivîsînim. Kî dizane? Renge piştire; ez tiştêkî ku ligel êşa te û êşa mêvanên te bigunce,

binivîsinim. Lêbelê evî Melayê ku şoreşek li Bedlîsê vêxistibû; şoreşek kêmanûçe; kêmanşewat, kêmanhêvî, min mijûl dike: Peywendiya wî bi Rûsan re çibû? Mane wergêrek ligel nebû da ku vê yekê bizanibim. Lê ewî bixwe Kunsilxaneyê Rûsan hîlbijart; bi hîvdeh tivingên kevnare û bi bêzariyek dijwar parastîbû. Du pasvanan; ji hindur ve, dergehê sûrê vekirin, piştî ku Mele Selîm derbas bû, herdû pasvan, bi hêviya ku yên dîtir jî derbas bibin; piçekî rawestiyan, lê hinekan ji paşmêrên Mele Selîmî nîşana asêkirina dergeh gihandin herdû pasvanan, ewan jî dergeh asêkirin û çavdêriya leşkerên ku nêzî koşeyên avahiya ku di navbera wê û sûrê de, çolek berfireh û tozîni û çend darên gwîzên belawela; peyda dibûn, dikirin.

Her hîvde mirov derbasî Kunsilxaneyê Rûsî nebûn. Lê tevliheviya herdû pasvanên ku bi bazdan rêberiya Mele Selîmî dikirin, gihîşt berzîrîn radeyê; wexta, ku bi dizî, di çemkirinên xwe de; li paş xwe dinerîn; mîna ku kuştîyan dihejmêrin, û di kêlîkekê ji wan kêlîkên ji nişkêve de, yek ji wan rawestiya, mîna ku bixeniqe destê xwe avêt sînga xwe û qîriya: "Na".

Tivingên kevnare li kêleka şaşikên ku digindirîn, ketin, û destên vekirî ku bayê li derve têra wan nedikir, lê di hindurê Kunsilxaneyê de Mele bi ser yana nîgarkirî de, hat xwar, çavgirtî, bîncîkayî. Wexta ku çavên xwe vekirin, dît ku jina Kunsil; a pîr sipî, li ser laliyeke zîvîni perdaxek şerbeta zer pêşkêşî wî dike, bi destên lertzokî perdax hilgirt, hin jê vexwar û perdax bi şûn de zîvirand.

**L**i pêşiya çend karkerên Kunsilxaneyê yên ku tenê dihatin da ku wî bibînin destên xwe vedikirin û silav li wan dikir. Mane têk çûye; ti bahane li cem wî nînin. Mele Selîm têkçû; şikest. Armanca wî yekîtiya Kurdîstanê bû, lê têk çû. Digel vê têkçûna xwe jî; yek bi yek, bi wan re dibişirî, lêbûrîna xwe ji wan dixwest, lêbûrîna ku çima êrişî bêdengiya çermên wan kiriye; lêbûrîna ku çima êrişî bêdengiya "Îkûnên" giranbuha kiriye; Îkûneyên giranbuha \_ yên ku xwe sipartibûn textê nemliyeke reş î kolayî\_ ku di navenda wan de gelek kevanên nûranî peyda dibûn; kevanên nûranî yên ku di destpêkê de nîgarkirina wan, berevajî endamên mirovane, hêsan dixuya, lewra bi pîrbûn diyar dibûn. Mele Selîmî jî wexta ku li van bi gewdekirinên ku xeybê bi awakî pîr dijwar rût dikin; herdû peyvên "Subhane ullah" du caran dúbare dikirin, ev rewîşt ne ji rewîştê ola wî ye; ola wî ya ku pîrozîyê ji dîdariyê re ne ku jî dîtîni re diparêze, û hestiyên mirov bi hemî lûleyên xwe, bazinên xwe, parsûyên xwe, rekeh û gerzelên xwe, kabên xwe, gwîzekên xwe, enîşkên xwe, algûşkên xwe, movikên xwe, qafên xwe, şeh û pê û navmil û qaçik û derzikên xwe, ne ji bo guhdariya wan bi guhan lê ji bo pîfîkirina Israfilî di borîzanê de, amade dike.

Lê gerek Mele Selîm rêzgirtina vî cihî di çavên xwe de jî biparêze, lewra wexta ku çavê wî li tiştêkî kirêt diket, ber bi Kunsil û jina wî ve dizîvirî da

ku nîşanên li ser rûyê yekî ji wan bixwîne û wê nîşanê li ser rûyê xwe jî bi kar bîne. Lê metirsiya wî li hemberî xwarinê hinekî cuda ye; digel wê xweşiya ku li ser rûyan dibîne jî; wexta ku zilamên kunsilxaneyê li ser sifriya kunsilî xwarina xwe dixwin. Masiyên zuhakirî, yên ku bineke tûj ji wan derdiçe, xweparastina wî daçikandin, û perçeyên goşt jî dudiliya wî kûrtir kirin, çinkî dizane ku Rûs di xwarina goştê berêz de jêhatî ne, lewra hergav mirîşk hildibijart an jî nanê xwe yî reş î tarî di nav ava mergê de dadikir. Û mirîşk jî her û her mirîşk e, lê birêjeyî (bi nisbetî) mergê; gelekî nediramiya daku hestên xwe yên li ser veşartek û razên di mergê de, biparêze.

**P**ir kêm dipeyvî, bi peyvîne pir kêm û bi nîşanîne pir hindik. Eger bêdeng dibû jî di cî de hişê wî diçû derveyî kunsilxaneyê, li wir, Tirkan, peyayên wî berhev kirine û bi mirîfî wan bi darên giwîzan ve, daliqandine, lêbelê kêlîkekê jî hêviya wî nedişikest ku dê, ji cihekî, şandeyek (Qasidek) derbasî hindur bibe; ku bi Tirkî û bi Kurdî baş dizane da ku di şûna nîşanên wî yên hejar de peyvîne bi zingînî bipeyive. Ne tenê wisa; bi guhên xwe û bi dilê xwe li her bizava ku ji paş dîwarê kunsilxaneyê dihat, guhdarî dikir, hetanî; hema hema; dikarîbû bi destên xwe kurtepista di navbera Kunsil û jina wî ya çav hingivînî ku ligel sipîbûna wê ya bêserûber naguncin, rawestanda, lê xwe digirt û bi pitepit digot: "la îlaha ile lla".

Piştî ku Mele Selîmî xwe avêt kunsilxaneyê, deng û basên lertzokî, ji bêrikên wan kesên ku derbasî hindurê kunsilxaneyê dibûn, digindirîn, bêyî ku ew mirovê xwedî şaşik ti tiştî têbigihêje. Û wexta ku dixwest bi destê xwe pîrsekê li ser tiştên ku diqewimin ji Kunsilî bipirse, Kunsil eniya xwe bi tiliyên xwe dorpêç dikir, dibişirî, û peyveke dilrûniştinê dûbare dikir; bi herhal daku şirovekirina ku dê ti berhemê nede kurt bike.

Ma ti tişt li cem heye da ku ji Mele Selîmî re şirove bike? Mane Kunsil bi xwe jî, roj bi roj, dibê dîlê kunsilxaneyê xwe, jixwe ti hêviya wî jî, di efsaneyê ku şer di navbera herdû Imperetoriyan de neqewimîne, nîne. Lê di bin bandora merdiya bêzar de, biryara xwe distîne ku mirovê xwedî şaşik vexwîne, lewra, di wê nîveroja kawikî de; mesefên mişt birinc li ser sifriya xwe belav dike, girkokên ji mirîşk û kevokan bilind dike, û berxekî piçûk ku ji qazî ve serê wî bi gewde ve ji bo lêewlwbûna mêvanê xwe yî penaber, hiştibû, li ser masê tê danîn. Di nav wan rûyên melûl ên ku li dora sifra lal kom bûbûn, bi rastî jî, hinekî xwîn bi rûyê mêvên ve hat, destekî xwe bilind kir û rêza ku laliyên birincê li tenişt hev li ser hatibûn raxistin şanî wan kir, û li wan temaşe kir, wexta ku ev bizava xwe kuta kir da ku şopa hevoka xwe yî lal li ser rûyên wan bixwîne, hemî rûtirş dixuyan. Li Kunsil temaşe kir, piştî awira xwe bi ser jina Kunsilî ve zîvirand; piştî bi ser girkokê biçûkê goştê di nîvê sifriyê de, ji ser rûniştêka xwe rabû û rahişt laliya li ber jina Kunsilî, tiliyên xwe dirêjî binê wî girkokî kir û perçeyekî goşt rakişand, pêre



pêre hemî perçeyên dîtir ên ku li ser hevdû edilandî bûn bi alîkî de şemitîn, ligel dûkela xwe yî dilovan li ser mesefê belawela bûn.

**M**ele Selîmî kêlikêkê di nav bêdengiya wan de bêdeng ma, lêbelê perçeyê goşt xiste laliyê û bi destê xwe mistek birinc li kêleka goştî ediland û lalî pêşkêşî jinikê kir; wê jî ji destê wî girt.

Ne rûnişt û ne jî awira xwe ji ser laliya jinikê birî, hetanî ku bi kevçiyê xwe, gepa pêşîn xwar. Wê çaxê wî bixwe rahişt laliya xwe û ji nû ve destê xwe avêt perçeyek goşt û di nav tiliyên xwe yên kinik de hişk zefî kir, di wê kêlikê de Kunsil û yên li gel bi dengê bilind dest bi kenî kirin, û destên xwe yên rût bê kevçî dirêjî goşt û birincê kirin. Îca jina Kunsilî ya sipî, ya bêdeng jî, ji nû ve, kenekî dirêj lê di bin dismala ku li ser devê xwe danîbû, hinekî nizim, ji xwe berda. Lê Mele Selîm her şîpiya ma, yeko yeko li wan temaşe dikir: "hûn zû bi zû hîn dibin", got û bişirî, di şîpiyabûna xwe de, dîsa berdewam kir: "ez bi xwe jî zû hîn bûm", çavên xwe li wan rûyên çavbirçî gerandin: "qiralkê ku ez bi pey ketibûm, di firîna xwe de, pir lawaz bû". Çend caran destên xwe libakirin mîna baskên balendeyekî: "qels bû, ez bi xwe nezanî ma gelo ji ber biçûkbûna temenê wî bû yan ji ber birînekê bû, lêbelê firîna wî qels bû". Bi destekî xwe riha xwe yî pir kurt mist da, pûnişt: "ez bi xwe, di wê çaxê de, ne biçûk bûm da ku liva wî min bixapîne. temenê min têra naskirina dekên balendeyan dikir, bi bazdan ez bi pey qiralk diketim, dihatim ku wî bi destên xwe zefî tbikim, lêbelê bi herdû baskên xwe yên ku bi pirtepirta xwe dihingivîn zemînê xwe ji min vedidizî. Erê dihingivîn zemînê", herdû peyv dûbarekirin û bi hêminî, bi nermikên destên xwe mesefa xwarinê ji jor ve ber bi jêr ve mist dida.. Ji nû ve, çavên xwe ber bi rûyên çavbirçî de bilind kirin, yeko yeko awira xwe li wan gerand: "ma hûn dizanin ku ez çiqasî bi pey wî qiralkî ketibûm? Gavekê, du gavan, sê gavan? Hê?", û bişirî wek ku tinaziyên xwe bi wê bersiva ku dê ti carî negihêje guhên wî yên kurdî, bike, yên ku li dora mesefa xwarinê rûniştibûn jî, kenîyan.

"EZ", û Mele Selîmî tiliya xwe danî ser cênîka xwe: "ez ne ji wî tuxmî me ku qiralk min bixapîne", û laliya xwe; bi destê xwe; piçekî, ber bi pêş de dehf da: "di firîna xwe de dê ti carî qiralk neşê min bixapîne, hetanî bi başokê jî dê nikaribe min bixapîne. Ma hûn vê yekê dizanin?"

Û bi çavên xwe yên bêhêvî, yên ku ji hewldana haşkirina yên rûniştî vala bûn, ew dorpêç kirin: "hûn dê nizanibin", bi lez got û şaşika xwe; şaşika ku ti carî dê xwe ji hawirdora serê wî bernede, ediland, hetanî ku piçekî xwar bû: "min kir". Ev peyv got, û radestî bêdengiyê bavane bû, bêdengiyê ku dixwest hinavên wî û hinavên mazûbanên wî yên ku axavtina wî ténagihêjin, bixwîne. Û hêdî hêdî destên xwe bilind kirin û herdû mistên xwe bi jêr de vekirin: "ez wisa bilind bûm". Wexta ku bêhûdeyîya vê sîrovekirinê tégihîşt, destên xwe daxistin, kir pitepit: "da ku li bin guhê


qiralk nekevî min baskên xwe di ser wî re derbaskirin, min sîbera xwe yî ku wî dinixumand didît, lêbelê min ew derbas kir çinkî mana min î bi herdû baskên min ên hêzdar; li kêleka wî, bizava baskên wî yên lawaz gelekî kêr dikirin". Û bi laşgiranî, li ser rûnişteka xwe rûnişt, ziq; li valahiyekê, li paş komika goştê ku bi ser mesefê de şemitî bû, dinêrî: "di firîna xwe de; min ti carî bawer nedikir ku dê sîbera min ewqasî berdirêj û berfireh be"

**M**ele Selîm firiya; wexta ku bi pey qijalk ket firiya. Du baskên hêzdar ên ji reh û hestî û periyên vekirin û firiya. Ti carî nediket hişê wî yê mirovî ku dê bifire. Bi pey balendeyê xwe ketibû; lê balende digel lawaziya xwe ya eşkere jî radest nebû, lewra Mele Selîm firiya. Biryara xwe di wê kêlîka ku xwîn hilkişiya eniya wî û di wê kêlîka ku terazûna lîskê ne wek hev diyar bû, stend: Du bask li hemberî du lingên mirovane.

"DADPERWERÎ" Mele Selîm qîriya û di cih de bişirî daku vecifilandina mazûbanên xwe tarûmar bike. Laliya xwe piçekî nêzîk kir û bi tiliyên xwe perçeyê goşt ber bi devê xwe de anî, lê nexwar, bi têramandin lê temaşe kir: "ya ku baskan li kesên bêhêvî belav dike dadperwerî ye". Berdewam kir: "ez ne bêhêvî bûm. Min bi xwe dizanibû ku ez dê bi herdû baskên xwe, yên ku berê min ha ji hebûna wan nebû, li pêşiya qiralkê xînim. Kêlîkê ez hîn kirim; kêlîka; ku torebûna min; û têqûna min, li beramberî baskên qiralkê; kir; serkeftina bêrûmetiya xwe yî gengazane". Û keniya: "ez li teniştê wê bêrûmetiya ku du bask dabûn min; bûm; herdû baskên ku ez bi wan firiyam, û bi wan jî; min zora qiralkê bask lawazî bir. Hêêê" , û ji ser kursiya xwe rabû, bi hêrs, ji serê mesefê hetanî dawiya wê şanî wan kir mîna yê ku ramanekê zêft bike û bixwaze wê li ser sînore mesefê bibêje: "li jêra min, zemîn, wisa, nêzîk dixuya, wisa zelal û ron: Mûrî, şînahî, ax, herdû baskên qiralkê, û sîbera min î ku ti carî bi vê mesefê nayê pîvan". Destên xwe ji hev vekirin, dixwaze tiştêkî bibêje, lê sînoren peyvên wî têra wê nakin, lê ji dergehê dûr, ji tengerêyên kunsilxaneyê xirecira êrîşker dest pê kir û her tişt nixumand.

**W**exta ku şer di navbera Tirkiyê û Rûsiyayê de dest pê kir, tirkan êrîşî kunsilxaneyê kirin. Dergehê mezin li paş xwe hiştin û çend pasvanên ku li ber bûn jî dehf dan, pêşî şiverêya ku bi çend pileyan ji sewiyeta erdê nizimtir bû, derba skirin, pêrgî pîrejina ku xwarin çêdikir, bûn, lê bi nîşanî ji destên xwe; ew bêdeng kirin; hetanî ku gihîştin kîlêra ku ber bi hêwanê ve diçû, bi destên xwe dergeh dehf dan, û rû bi rû li hember kesên li dora mesefê rûniştî û di nivê wan de Mele Selîm, rawestiyên.

Kunsilê ku hê jî gepek goşt û birinc di devê wî de bû; ji ser kursiya xwe çeng bû, di wê kêlîkê de ji nişkê ve girtibûn ser, lêbelê hinavên wî



bendewariya vê lîskê dikirin. Berçavka xwe hilanî û bi ser van cenawerên bi singo û tiving de; ku ber bi mirovê xwedî şaşik ve diçûn, kir pitepit.

**M**ele Selîm rakişandin; Kunsil jî bi protestoyeke bêhêvî destê xwe bilind kir; protestoya ku teqiteqa mesefa ku karkerên kunsilxaneyê; bizdayî, ji dora wê radibûn, dinixumand., yekî ji wan tirkên êrîşker bi destê wî girt û ber bi jêr de; hetanî ku hingivî mesefê, daxist, di wê wextê de; çendine dîtir Mele Selîm dikişkişandin derveyî sînorên kunsilxaneyê; derveyî meydana wê; li wir, laşê Mele Selîmî; bi darên giwîzê yên rehdaçikayayî û tund, hate daliqandin, bi destên xwe lingên wî ji gwîzekan ve; çend caran, baş girêdan da ku dilê wan di cî keve; ku dê di hejmartina nefesa wî ya dawîn de jî şaş nebin.

Evi Melayê ku ez dê ti carî; li ser wî, ji te re nenivîsinim, pir mijûl kirime Yabo. Herdû baskên wî; baskên ku sakoyê xwe ji ser wan neda alî da ku bifire; mijûl kirime. Dikarîbû lêbûrînê ji mazûbanên xwe bixwaze: "li min bibuhirin", bigota û yeko yeko li rûyên wan temaşe bikira, û sakoyê xwe yî dirêj ji xwe bikira da ku baskên xwe rizgar bike, û bi xwelibakirineke hêzdar û lihevhatî, di ser mesefê re, ku birinc belawela bibûya û yên rûniştî wî zefî bikirina, bifiriya. Lêbelê nefiriya Yabo, di şûna wê de, di kêlîka ku destên çepel dirêjî milên wî bûn, û hin ji wan destan li şaşika wî ketin û porê wî yê dirêj û kurîşkî xuya bû; li rûyê Kunsilî temaşe kir. Bi sipasî; bi mazûbanê xwe yî dorpêçkirî re dibişirî, bi alî pîreka pîr sipî de jî dizivirî û lêbûrîna xwe jê dixwest, wê jî; bi çariya xwe yî kinik, çavên xwe dinixumandin; bi hêrs kevçî ji destê xwe davêt û lêbûrîna dixwest.

Tu, jî, min mijûl dikî, Yabo. Têkçûna te ya li wir, û têkçûna te ya li vir; min mijûl dikin. Herêmên te; yên li "Erzurûmê", û li "Botan", û li "Bedlîsê", û li "Amedê", û li "Cizîrê", û li "Kermensahê", û li gola "Wanê" û çiyayên ku çavkaniyên çemên mezin in hetanî gir û qelaçên Rûsyayê, min mijûl dikin Yabo.

Ji romana  
**Hêla Çarşemê**



M.Effî  
HUSEYNÎ

## **Ey Cegerxwîn!**

**E**y Cegerxwîn! Ey helbestvanê ku di tenhatî û şevên dirêj ên Skandînavyayê de mişext bûye. Apê min li wir bendewariya te dikir, lê tu neçûyî cem wî, çend darikên cixaran ji te re çêkiribûn û bi bagerê neqîşandibûn, lê tu nehatî.

Dihat ber çavê min ku li kolaneke Stokholmê pêrgî te dibûm.. Ez diçûm serdana gora Palme; laşê vî zilamê nazik, kevirekî bêagah li ser axeke dûz, mabû. Ji min we ye ku tu jî; ji tûnelên mitroyê derdiçî û serdana wî dikî. Tu pişkên sakoyê xwe yî pir qalind girêdidî, hildiperikî mêrdewanan û hewl didî ku çend reklaman bixwînî; lê zimanê Skandînavyayê te dixapîne û tu bi dengêkî bihîstî dibêjî: Zimanekî cuda ye. Tu kolana serekî derbas dikî û ber bi tengerêyekê de dizivirî, tu di ber peykerên kesk ên ji bironzê re dibuhurî, li jêr wan kevok dilerizîn, û çend balendeyên reş ên ku tu ji wan hez nakî, û qîjeqîja tûj a balendeyên deryayê, kewên welatê te tînin bîra te, Mîrzoyê ku carekê çend balendeyên di çeşnê kewan de biribûn Şamê û li bazarê ji xelkê re digot ku ev balende kewên kurdî yên resen in; tê bîra te. Hat bîra te û tu bişirî. Sar bû, te piçekî lezand, seqemeke tîr û hevgerî û rewan bû, mijê jî;

mîna ewrên giran; xwe berdabû kolanan û tengerêyên kevnar ên bajêr . Mijê di vê nîveroja xwelîrengî de bela xwe ji te venedikir, erê Cegerxwîn de bi lez derbasî movikên bêrîkên xwe û sakoyê xwe yî germ bibe. Tu dihatî bîra min, tu li teniştê min bûyî, te jî li gora Palmê temaşe dikir lê te ez nas nekirim, Kulîlkên li ser gorê geş bûn, û ava mûman bi ser keviyê de diherikî, bi ser xwîna Palmê de diherikî. Min piştê xwe dida dîwarê kiniştê da ku cigareyekê bikêsim. Min çavdêriya mirinê û zemînê û şiverêyên bi zixuran raxistî û cigareyên nîvco û pîrejinên zêrînî yên ku temenên xwe dispartin keviyê, dikir . Û destnivîs jî bi min re bû lê te ez nas nekirim. Vê carê hişê te tu xapandî, û ez dûrî te, pir dûrî te, çend gav di navbera min û te de, lê dema di navbera me de berfireh e, û ti carî me hevdû nedî, her tiştê ku dibêjim tê ber çavê min çinkî ji te hez dikim, Apê min hergav digot ma vî peyayî çi bi xwe re biriye tenhatiyê, kê ez rakişandime vê tenhatiyê Cegerxwîn!!? Stockholm, bajarê bi tenhatiyê nixumandî, bajarê ku penaber bajarên xwe yên windayî têde distirên, her û her ber bi birca wê ve dizivirin û mîna sirûdan dinalin, bendewariya guhertinekê li welatên xwe dikin da ku vegerin, lê ti carî kes venegeriyaye.

Ez jî; wisa, nêzî te, ji nişkê ve em hevdû dibînin, û piştî ku ez destnivîsê radestî te dikim tu min nas dikî. Tu pîrsa Apê min û pîrsa Bedirxaniyan dikî. Lê ji tenhatiya dengê min Amûdê derdiçe; tu xemgîntir dibî, em berê xwe didin bajarê kevnare. Li wir tu çayxaneyê nivîskaran dinasî, tu çend pileyan ber bi jêr ve dadikevî û tu berê xwe didî qehweya germ, bi hêrs tu cigareyan dikêşî, wê rojê tu pir westiyayî bûyî, tu sakoyê xwe davêjî ser kursiyê, tu çend helbestan derdixî û tu dixwazî ku ez wan bigihînim Mîrê Bedirxanî. Çend jinên xweşik di ber me re dibuhirin û bîna mêraniyê ji sakoyên me derdiçe. Di neynikên tenhatiya xwe de kumê te dixuye, rêberiya zimên a di nav destên te yên germ û di ximavê de xeniqî, dixuye.

**Ê**vara tîrbûyî dest pê dike Seyda, li vir zivistan dirêj e wek wê nameya dirêj a ku apê min di nava mehekê de ji te re dinivîsand, nameya ku bûbû bi dirêjahiya çend mitroyan; lê ji te re ne hinart. Di wê nameyê de li ser kesên xwe yên ku di esmanê wî de digeriyên, dipeyivî. Hemî babetên ximava (hibra) ku wê çaxê peyda dibûn bi kar anîn. Erê Cegerxwîn wisa ji nişkê ve tu bi ser min de dadikevî. Min ti carî ev hevdîtî bawer nedikir. Carekê li Qamişlokê ez di ber xaniyê te re derbas bûm. Li vir; berya mirina xwe, yê helbestvan jiyabû. Derbasbûneke pir bilez bû. Derbasbûna di ber pencereya ku kulîlkên hovane tê de dihêwirin, ku wêneyeke reş û sipî; pir mezin bi terîşeke rengînî xemilandîbû, dixuya. Lê anuha tu ligel min î ey Cegerxwîn, ez jî li gel te rûniştim e. Tu rûpelên destnivîsê yeko yeko diqulipîni, tu xwe bêdeng dikî. Lê ez bi xwe daxwaza te ya germ jibo vegeerê, dibihîzim.. Leşker .. leşker.. bûnewerne ji cam û hesin û barûdê ne.

Li derve nermebaraneke sar, sîwanine dadayî, balkonine vala, firoşgeheke tûtînê, tûtina celeb celeb. Tu jî bi darkê çixara xwe ya narîn biranînan dikêşî. Li ber lingên te bayekî dirêjkirî, hêdî hêdî ew ba hevdû digre tîr dibe; dibe; lawirekî bejî:

- Rovî ye lawo! anuha ev ji ku hat?.

**L**i rada çend katjimêran, ligel te bûm, lê tu bi min re nedipeyivî. Hêsekê êrîşî laşê te dikir. Ez û tu, li çayxaneyê, li Stokholma kevnar. Li kolana dîtir rûbarekî zirav û peykerê helbestvanekî siwêdî yê di çeşnê B.Ş. Elsewab de:

- Erê Seyda te ew li Bexdayê naskiribû.


Kendavine tenik di me re dibuhirin û ewrên dûmanê, teze, wek çêja pûngê, di me re dibuhirin. Bîn belav bû Seyda! Bîna di çeşnê bîna miriyên me de. Ez û tu, bi sedemên xwe, em hest dikin ku nermebaran me ji hindur ve şil dike. Bircên li derve mîna pirtûkên ku bi ser ximavê de vekirî ne, dixuyin. Li ser birc û keleşan qîjeqîja balendeyên deryayê û xwendina kevokan, li ba dibin. Şahinşahek li ser hespê xwe ye; hespê ku bi mêweyên cengan hatiye neqîşandin, riha Şahinşahî jî, ya tenik, di çeşnê riha Mîrê bedirxanî de ye Seyda. Her tişt di çeşnê tişteki bûrî de ye. Lê axavtin du caran dúbare nabe ey konsilê zimên. Darên hunermendan li ser dîwarên çayxaneyê helawistîne. Lê li vir, ji bilî meydanên mezin ên ku bi kevirên sipî raxistîne, deşt nîn in.

Min ti carî tu nedidîtî. Ji min we ye ku tu bê zar î. Lê wisa ez derbasî goristanê bûm da ku li kuştîyê nazik ê di bin kevir û ax û kulîlkan de, temaşe bikim. Tu jî li wir bûyî, tu bi xweliyê û bi dema têkperane mijûl bûyî, tu bi çermê van rûniştekan ku anuha em li ser rûniştîne, mijûl dibûyî.

Gotin te vedibêjin, sal li dora te teng dibin, tu nêzî sîwaneyên li derve dibî. Tu derbasî bexçê dibî û li ser gora Palmê diponijî.

Zengilên mezin li jor in. Û Şêrîne jî, li wir, li ser darbesta xwe; di bazargeha Amûdê re, bi xwelibakirin dibuhur e.

Tu ey hevalbendê nermebarana li derve û xwendina destnivîsê!. Pirtûka bi ser koçbariyan de vekirî, bi kulîlkan dagirtî, apê min di rojên xwe yê dawîn de hildiperikî girê Şermola, rêberê wî Birîndar bû, pûng û sorgul diçandin, li ser quntara girê Şermola bexçeyekî pêldar ku bi demên wî û bi kesên wî dipêliya, durist kiribû, ligel wan rûdinişt û berê wan dida kulîlkên xwe, ximav û gora yê romanî ku li wir hatibû veşartin. Di navbera xwe û Şêrîne de peywendî ava kir û li wir jî rûpela dawîn kuta kir; malbata Bedirxaniyan yeko yeko dinivîsand, û balende û cejnên nehênî lê zêdekirin, di xêzên wê de agirê 21 ê Adarê vexist û navê "Hec



Evdò" yekem MIHACIRÊ ku berê xwe dabû Amûdê ji bîr nekir. Navê keviran û navê gundên ku navên wan guherandibûn, jî, ji bîr nekirin. Û şewateke dîtir di sala 1960î de lê zêde kir.. sîneme ya ji bûnewerên zarokane.. şoreşên li cihên dûr û agirên ku di laşên me yên biçûk de gur dibin. Tu ligel min î.. ligel te me. Du mirovên ji keştiyan; li peravên kavilbûyî digerin. Kê nifir li me kiribûn da ku em vê tenhatiya hesinî bijîn.

**D**ûlabên 'erebaneyên kevnar. Hespên kumêt, kumên leşkerî, tivingên çapilî. Pênûsên hesinî yên ximavê. Zincîrên hesinî di bazinên destên keşeyî de. Çawa dengê xwe di nimêjên xwe de derdixîne?. Hesin bédengiya me radipêçe, em jî dûbarekirina xwe dispêrin birc û kelehan; dispêrin wê pifkirina karbaniyane ya sazbandê ahengên welatê me yî dûr.

Apê min dinivîsand û Şêrîne dipesinand, gora wê ya ku bûbû terîşne kesk, bi serdanvanan û bi çûk û çivîkan hatibû dorpêçkirin, gorek ji çûk û çivîkên keskîn, min ji apê xwe re got, kêfxweş bû û neynik; dengê Farûqî û sifir lê zêde kirin, destnivîs bi sifir dagirt, balende, bi mîxekî zirav û bi çakûçekî biçûk bi rojan, hêdî hêdî bi hûrgelî li ser dineqîşandin:

-Ey hesinkarê kesk

-Ey helbestvanê nêzîkî gora Olof Palmê; nêzîkî zingîna zengilan, me di wê seqemê de tenhatî hest nedikir, lê belê ev hejmara pîrejinên porzêrînî!?!.

Dem hinavên me bi êşê dadigre, nermebaran jî kolanê bi mîtalekî rihin şildike.

Di hindur de: çayxane.. guldank.. darên bi bêzariyê reşandî. Tu ji nişkê ve hildiperî, tu diwariya bişkojan tînî bîra xwe. Tu dest bi çurusînê dikî ey helbestvanê min. Sakoyê te yî qalind radipere; kumê te jî; tiliyên te yên lertzokî û dengê te yê nerm jî, porê te yê sipî, seeta te ya bêrîkan jî.. çayxane jî diçurise.. sîwaneyên li derve û peykerê Şahînsahî û helbestvan û beştên ronahiyê, te dizanîbû ku dawîya dawî tu yê vegeî Qamişlokê, te peyvên dawîn yên apê min di destnivîsê de dixwendin:

- Ez dê li ser rêça firokexaneya Qamişlokê bendewariya te bikim ey Cegerxwîn.!



### Misto Masto

**F**irat Cewerî bixwe, di çarçewa cihana çand û wêjeya kurdî de diyardeyeke rewşenbîrî yî taybet û balkêş e. Navê wî, dikare bibe, navnîşaneke berfireh bo bareya (haleta)bê sînor a ku wêjeya kurdî bi giştî li tarawgehê (sîrgunê) tê de dijî.

Li vir, em li beramberî ezmûneyeke aferandina pir taybetî radiwestin, ezmûneyeke ku projeya xwe ya nûdemiyê bi şeweyên reklaman ên di çeşnê peydakirina bazarên firotina pêlav û derpî û qutiyên xwarina kûçikan, pêşkêş dike. Beriya ku pirtûka xwe yî kurteçîrokan "Girtî" di sala 1986 an de belav bike, brûşûreke rengîn bi nav û navnîşana xwe û bi nav û navnîşanên sê dezgehên çanda kurdî li Siwêdê û li Elmanyayê û li Firansayê çap dike û belav dike da ku xwendevanên Firat Cewerî pirtûkê ji wan navnîşanan bixwazin. Di birûşûrê de, li ser barûdoxên Kurdistanê bakur ên siyasî û çandeyî ji dema avakirina komara Turkiyê, dipeyive. Nivîskarê

me dest bi girî û giliyên xwe dike, me agahdar dike, ku piştî ber bi Ewropayê ve mişextbûna çend rewşenbîran, û piştî li welatên mişextiyê hebûna wan a çend mehî û derçûna pirtûkên helbest û çîrok û romanên, êdî qonaxeke nû dest pê dike, bi mebesta ku xwe wek pêşengê vê qonaxê bide xuyanî kirin. Piştîrê vê belavoka xwe ya "Suryalî" bi van rêzên jêrîn kuta dike: "pirtûka Girtî ku ji 16 çîrokên modern û ji 348 rûpelan pêkhatiyê yek ji van berhemana e. Rehên hemû çîrokan ji rewş û jiyana gelê kurd ya rojane hatine girtin; perîşanî, belengazî, serbilindî û mîrxasiya wî hatiye zimên.."

Di sala 1992 an de Firat Cewerî li Anqerayê pirtûka xwe ya diwem a kurteçîrokan bi navê Kevoka Sîpî çap dike. Di pirtûkê de careke dî çîroka Xewna Orhanov, ku berî wê di pirtûka Girtî de cî girtibû, çap dibe. Wa dixuye ku arezûya nivîskar, daku navê xwe li ser bergê pirtûkê binivîsîne, arezûya pêşkêşkirina pirtûkeke qalind û stûr û pîrrûpel e. Lê arezû û daxwaza me jî ew e ku em li ser çîrokekê ji çîrokên wê pirtûkê rawestin û em çîroka Kêzika bînav bixwînin daku bibe "mişkê vekolîn" a pirojeya wêjeyî ya Firat Cewerî; bêyî ku em tîrmên rexneyî û çavkaniyên wan, ji bilî di xêzên pan û pêwîst de, bi kar bînin.

Di vê çîrokê de, nivîskar, çîrokbêjîya xwe bi awayê lêvegerîne dixebitîne û bernavê ez bi kar tîne. Wa dixuye ku projeya nivîskarê me, ya nûjeniyê, di warê şewê û avahiyê



de, zimanê wêjeyê yê naskirî, li paş xwe dihêle; ne ji bo nûkirin û peydakirina zimanekî cîgir û hemdem; lê da ku vî zimanî, çend gavên dîtir, ber bi paş de vegefîne; ber bi serdemên tarî yên berî “ Mem û Zîn “ ê!

Lewra çîroka F. Cewerî ti riyê nade xwendevan da ku piçekî bandora alavên nivîsandinê, hest bike, alavên ku gerek ji awayên nivîsandina li ber dest cihê bin. Herwa yê xwendevan ti cihêwaziyê balkêş di strûktûr û delaletê de jî nabîne, Deqekî amadekirî ye, ne ji bo xwendinê hatiye nivîsandin, lê ji boyî (ISTIHLAKÊ) ye. Wek ku R. Part dibêje:

“ Prosesa avakirinê heye, lê avahî nîn e; prosesa berhemkirinê heye, lê berhem nîn e”.

Tiştê dî ya herî balkêş ew e ku mirov di vê liserawestanê de, nikare li ser ezmûneya (tecrubeya) F. Cewerî ya helbestiyane bipeyive. Çinkî di bareya (haleta) nivîskarekî dîtir de, ku berî çiroknivîsînê helbestvan bû; yê rexnegir dikare berhemên wî li ber ronahiya helbestvaniya wî ya berê bixwîne; nemaze ji alî wênebedewiyê û amajeyan ve. Lê bi rêjeyî (nisbetî) F. Cewerî ji bilî deqekî rastnivîsane tu bi desnaxîni, deqekî ku ligel sewiyeta şagirtên dibistana seretayî li Qamişloka ku bûyerên çîrokê li xewxaneyê wê diqewimin jî nagunce.

Vebêjî di çîroka Kêzika bênav de, monolojêke dirêj e; yê xwendevan pêrgî ti diyalogê nabe; berevajî

çîrokên dîtir ên F. Cewerî ên ku xwe dispêrin hevpeyivînên gundiyaneyî pir sade; ku ji hestên hişyariyê û ji kurtkirina hunerî hergav bêpar in.

Di destpêka çîrokê de dixwaze GENTELMANiya xwe bi xwendevanan bide naskirin; wek hilgirê pasporteke swêdî giraniya bê û xwarina “rojhilat” li ser nava xwe ya tenik û ewrupiyane, hest dike; lewra daxwaza mazûbanên xwe, ku li cem wan xew bike, dişikîne; xewxaneyê bajêr(Qamişlo) çêtir dibîne çinkî hînî serşûştina rojane û vehesînê bûye:

“ Qaşo hotel LUKS bû. ji xwe gava mirov ji derve li avahiya hotêlê dinihêrî, hotêl gelekî xweş û luks xuya dikir. Gorî hotêlek rojhilata navîn û bajarekî piçûk, ku em pakijiyê deynin aliyekî, hêwana (salona) wê jî ne xerab bû” Kevoka Sipî R 71.

Di van her çar rêzan de, tenê, mirov dikare çerxa cîhana hunerî û dahênane ya F. Cewerî ji nêzik ve, binase. Ev vebêjî; ne tenê yê xwendevan ber bi herêmine dûtir û nenas ve radikişîne, lê wî bi kotekî\_ yê xwendevan\_ derbasî cihekî teng dike; li jêr banên wî cihê ji bilî “ EZ” a nexweş a nivîskar ti tişteki dî nîne, ku di çarçewa vegeandina wênene nêgativ ji hişekî hest zindankirî, dest nîşan dibe.

Bêguman, di wêjeyê de, bi gewdekirina helwest û ezmûneyên xweyî(Zatî) tiştine pir normal in. Gelek nivîskarên mezin, di vî warî de, ji kurtejiyan û helwestên xwe; sût wergirtine, berhemên xwe bi serbor û serpêhatiyên xwe

xemilandine. Di vî warî de mirov dikare Destoyêvskî wek nimûne dest nişan bike.

Eger Firatê me jî xwestibe biserhatiyeke xwe ji me re bibilîne, ji xwe ti kes ji bo vê yekê lê nagire; lê şeweyê pêşandanê, ziman û mebest û raxistina kelê, nivîsandina bê rêberî, bê fentazî û bê spehîti, lêgirtinê aloztir û diwartir dikin.

Di herçar rêzên jorîn de, çar caran peyva (hotêl) ê dûbare dike. Peyva (luks) du caran. Lê peyva (pakijiyê), bila yê xwendevan hinekî bi sebir be, çinkî liserawestaneke taybetî pêwist e!

Carekê, ji wan carên xweş ên ku ez û nivîskarê mezin F. Cewerî bi hev re civandibûn, min xwest ez sedemên vî awayê nivîsandina (pakijiyê) jê bipirsim. Hêdî hêdî xwe bir û anî û mîna rêzimanzanekî bêminak bersiva min da û got: Ligorî struktûrên zimanê me yê Hindo\_Ewropî, peyva "paqij" serencama lêzêdekirina peyva "pak" e.

Eger erka rexneyê vekolîna regezên peyvan be, em dipirsin, ma gelo nivîskarê me yê nûjen, ew bîrûbawerî ji kû û ji kîjan çavkaniyê wergirtiye!? Em gelekî dûr naçin, peyva "pak" sînonîma çê, rind, qenc, baş e. Tu peywendiya wê ligel lihevsiwariya "paqij" nîne. Gerek F. Cewerî yê ku ji swêdî û ingilîzî werdigerîne, vî tiştî bizanibe, çinkî angoya vê peyvê di herdû zimanan de (clean, ren) lihevsiwariyê napejirîne.

Lê eger em li ser mebesta nivîskar rawestin û em hewl bidin ku

naveroka rêzên çîrokê ronî bikin, dê çi ji me re diyar bibe?

F. Cewerî dixwaze bibêje ku ez vê carê vedigerim "Qamişlo" yê lê bi pasporteke Swêdî; lewra ez bi ba û xwarin û razanê hatime hejandin! Rast e, cara pêşîn wexta ku ez hatibûm vî bajarî min ti tişt ji bilî navê Ewropayê nedinasî, û bêrika min jî ne ewqasî dagirtî bû; na herê "çentekî biçûk û sernavên 25 helbestên xwe yê di bin piziya derpiyê xwe de veşartî..".

Tevna çîrokê li ser xewnê ava dibe; û hemî neqîşandinên ku li hawirdora wê peyda dibin; cûtin in; pitepit in, û "sextekirina" wê xewnê ne; de ka em nêzî bûyerê bibin!

Çîrokbêjê me berya ku radestî xelmaşbûnê bibe, kêzikek seyr êrişî wî dike, xelmaşbûna wî tar û mar dike. Hewl dide ku wê bikuje lê nikare! Vedigere xewê, xewneke seyr dibîne, li ser pêvedana kêzikê ji xewê çeng dibe. Ji wê rojê ve li ser vê kêzikê radiweste, dudil û surdar dibe, ji dostên xwe, ji xelkên Qamişloyê dipirse, hetanî ji kurdên Şam û Helebê jî; her û her yek bersivê dibihîze: "xeyo welleh em nizanin".

Bêyî pêşgotin, deqûrû, dixwazim bibêjim, ku F. Cewerî çîroka xwe ya bi navê Kêzika Bênav ji çîroka Kêzik a nivîskarê rûsî yê navdar Îvan Turgenev, wek form û naverok, wergirtiye.

Dema ku min herdû çîrok li ber hev danîn, min ti lihevrasthatin û bandora ku reng e di warê wêjeyê de peyda bibe, nedîtin, Wek diziyeye riswa ku rûyê mirovan reş dike xwe

destnîşan kir. Mixabin ku bûyerên di  
vê çarçewê de, di cîhana "wêjeya  
kurdî ya li sirgunê", her roj  
berfirehtir dibin!!

Di vî warî de, xwendevanê hûrbîn û  
zîrek dê bibîne ku dirêjahiya herdû  
çîrokan, piştî dawesandina pitepita  
vala ya F. Cewrerî ya ku bi kotekî  
derbasî avahiya deq kiriye, wek hev


in; herweha hevpeyvîna pir kurt di  
herdû çîrokan de. Lêbelê ji bo  
hêsankirina têgihîştina xwende-  
vanan, min xwest ku movikên  
hevbeş di warê tevin û metna  
vêbêjiyê de bi cedwelekê ronî bikim.

### Kêzika bênav(F. Cewerî)

### Kêzik (Î. Turgenev)m

- 1- min xewnek ecêb dît
- 2- kêzik kete qeliştoka dîwêr
- 3- dengê xişexişekê hate min
- 4- kêzik mezin bû
- 5- min ti caran kêzikên wilo  
nedîtibû
- 6- herdû çavên wê sor wek du  
bizotên êgir bûn
- 7- rengê wê sorereş bû
- 8- wek serê moriyekê biçûk bû
- 9- lingên wê baş nedihatîn  
xuyakirin
- 10- ez ji kêzikan ditirsim
- 11- carna bi lez bi dîwêr ve  
radipelikî
- 12- bi çavên xwe yên sor li min  
mêze dikir
- 13- hevalên min hemû şehîd
- 14- şerekî nenas
- 15- merkî dixwaze min bikuje..  
ez şiyar bûm, çavê min  
rimiye;dûvre têgihîştim ku  
ew kêzik bû, û min wê kuştiye

- 1- xewn
- 2-kêzik difire û li ser dîwêr  
datîne
- 3-xuşexuşek derdixist
- 4-kêzikek mezine, seyre, tirsnak  
e
- 5-ti kesî berî niha wek wê  
nedîtîye
- 6- serî, penc sorê tarî ne
- 7- laşê wê qehweyîkî gemarî ye
- 8- mîna ku mûriyek be
- 9- lingên wê vekirî bi pûrt bûn
- 10- em ditirsandin
- 11- wexta ku radipelikî dîwêr  
me xwe diçemand.
- 12- ji nişkêve wek ku kêzikê lê  
mêze dikir
- 13- em nêzî bîst kesan bûn.
- 14-em li ser mijarekî naskirî  
dipeyvîn
- 15-kêzik bi çavê xort vedide;  
wî dukuje, difire û ji odê  
derdikeve, dûvre me hest kir ku  
ew çi mêvan e



Azad Ehmed Elî

**G**ava min romana **Zeviyên Soro** xwend, min hevî dikir ku ezê zû dawiya wê bînim, da wek xwendevanekî ez hin tîbîniyan li ser avahiya wê ya hunerî bidim xuyakirin. Lê mixabin xwendina vê romanê di nav destên min de pir dirêj kir û dem bir. Dawiyê li spêdeke havînî roman li ber serê min bû, ez jî li serê bîn razayî bûm, ez nizanim çawa, bizinek bi pêpelûkan ve derketibû jor, bêhna Zeviyên Soro kiribû, hatibû qap cûtibû û çend pel jê xwaribûn!

Çima ez van peyvên jor li ber çavên xwendevanan diraxim? Çi hevbendiya van gotinan bi vê kurtelêkolînê ve heye? Ez dixwazim bi kurtî di pêşiyê de bibêjim:

Çi çîrok hebe gava xwendevan nekişêne hundirê bûyerên xwe, gava xwendevan bi kêf û dilbijîn nexwaze wê bixwîne, ew hemî dibe nîşana xavîtiya çîrokê. Ew dide xuyakirin ku bûyer ne germ in, yan jî ne hişk bi hev re hûmandî ne.

Bi rastî- wek xwendevanekî gundî- min di bûyerên Zeviyên Soro de ti kiryar û aliyên nuh nedîtin. Ti jîyanên hunerî û avakirî jî min re nehatin xuyakirin. Ji ber ku xêzên stûr, yên bûyerên romanê ev in:

Gundekî Kurdan li bakurê Kurdistanê ye, li devera Serhedê ye. Navê gund Tendûrek e. Navê axayê gund jî Ûsiv e. Sed mal gundî hene. Di bin sîbera axatiya Ûsiv de cotyariyê dikin. Dem derbas dibe. Ûsiv axa dixwaze traktorê bêne gund û zeviyên di destê gundiyan de pê hilke û bajo. Ev kiryar dibe egera dijminatîyê di navbera cotyar û Ûsiv axa de. Raberzîn û daberzîn çêdibin. Şer di navbera wan de çêdibe, germ dibe. Soro, Mîro û hin gundiyan din dikevin zindanê. Gundî didin xuyakirin, ku zevî yên wan in. Lê ti qoçan û kaxez li ser vê yekê di dest gundiyan de nebûn. Piştî demekê Soro û Mîro ji girtîxaneyê têne berdan.

Dîse rikeberî di nav gundiyan û Ûsiv axa û berdestî û xulaman de peyda dibe. Şevêkê Sîno û kesên din fişekan di pencerê re diberdine Ûsiv axa, lê mixabin ew birîndar dibe û mêhvanê wî, xwediyê traktorê tête kuştin. Piştî demeke ne dirêj Ûsiv axa dirabe ser lîngan, ji xwe re traktorekê dikire. EW kirîn dibe egera şer pêketinê. Soro seroktî û serkêşiya gundiyan dike. Kurê Ûsiv axa di bin dar û çowan de tînine ber kuştinê. Qumandar û walî aliyê Ûsiv axa digirin. Piraniya gundiyan zindan û bindar dikin. Cotyarên gund avokat ji doza xwe re digrin. Lê di wê demê de cendirme bi dizî

alîkariya gundiyan dikin. Kevala bûyerên romanê dide xuyakirin, ku axa, walî û qumandar li alîkî ne û cotyar û cendirme li aliyê din in. Ev tabloyeke bêre çêkirî ye. Li dawiyê kurê Ûsiv axa bi ser xwe ve têt, sax dibe. Girtiyên gund têne berdan. Cotyar xwe dikin yek, nahêlin ku axa zeviyan bi traktorê hilke. Êrîşî traktorê dikin, bi ser mala axê ve diçin. Kufletê axê ji gund derdixin. Mala wî didin barkirin. Gundî bi ser dikevin. Axa bi lez ji gund direve, sixêfan dike, fortan dike, dide xuyakirin, ku dê zû vegere.

Romana Zeviyên Soro çîrokeke ne tenê li ser gund û gundayetiya Kurdan e, lêbelê ew bi xwe jî bi regekî gundîfî hatiye nivîsandin! Çima?

Berî her tiştî mirov tê de hûr avakirina hunerî-dramî nabînit. Ji ber ku piraniya romanê wek tomarkirinê ye, wek fotokopîkirina jiyana gundê Tendurekê ye. Ti guhertinan li rêveçûna wê jiyane nake. Ango ti tûjçudayî di navbera peyva gundiyeke û diyaloga hundirê romanê de tine. Hestek bi xwêner re peyda dibe, ku nivîskar ti bêjîngirin û guvaştin li bûyeran nekirine. Bûyeran welê rast bi rast dinivîse, serpêhatiyên Serhedê tomar û kopî dike. Her çî ku nivîsandina bûyerên romanê ew bi xwe bûyerên jiyane bin, bêyî ku nivîskar tevgerê bike, ji bo guhertina wan salox û serpêhatiyên ber bi bûyerin wêjeyî-dramî ve, beloqkirin û tûjkirin nehatine kirin, di derheqa wan serpêhatiyên siruştî û normal de ti spehîkirin çênebûye. Li gundên

Kurdan, li hemî gundan herdem ev rewş li dar e. Vêce çima tenê çîroka vî gundî dê bibite roman? Careke din ev e pirs.

Ji ber vê tevî mirov dişiye bibêje ku: Nimûnekirina bûyer û kesan gelekî sist e. Ji gelemperiyê, ji nêrîna tevayî û giştî nivîser negehayê radeya çêkirina nimûneke wêjeyî taybetî. Ew wek bi navê gundiyan tevan dipeyive. Welê ji dixwazê hest û rewşa hemîyan bi hev re bide xuyakirn...

Mixabin nivîskar di nav rêza gundiyan de nikarîbû ji gelemperiya fikrî xwe bigihîne nimûnekirina taybetî. Ji ber vê yekê û berî wê jî ji ber doza kopîkirinê, roman dimîne li tixûbê serpêhatiyên gundên Kurdan û gelekî çetin e, ku derbasî zeviya wêjeya hunerî bibe.

Li gor baweriya min roman ne tenê li ser çêkirin û ristina bûyerên jiyane ava dibin. Lêbelê ya pêdivî û giring ew e, ku gelek ta, pir xêzên romanê ji nik nivîskar bin. Ew tayên ji tûrê xewn û teswîra nivîskar bi xwe hûnandî bin. Ew dezîyên ji wir derkevin dê çîrokê geştir û xweştir bikin. Radeya hunerî ya bilind, ya romanê ji wê cudayî û jilhevdukirinê çêdibe, ew veqetandina di navbera serpêhatiyên û çîrokên folklorî û romana hunerî de. Romana li ser zeviya drama û bingehên bûyerên taybetî avakirî, helbet dê zimanê wê cihê be ji zimanê jiyana rojane.

Bêgoman piraniya huneriya romanê di zimanê çîrokbêjiyê de tete dîtî û pir bi hunerê çîrokbêjiyê ve girêdayî ye. Ew hunera ku binavê (hunera

vebêjyê) têt binavkirin çiqasî nivîskar xwe ji dava diyologê xilas bike, dê hewqasî xwe nêzikî hunerê çirokbêjyê bike. Di romana kurdî de pêdivî ye, em ji bîr nekin ku astengeke din heye, ew asteng girêdayî ye bi dema çîrokbêjyê ve. Dema çîroknivîsîn li cem nivîskar têtê xuyakirin û veqetandin ji dema bûyeran û li gor hevberdiyên herdû deman di rîsê çîrokê de valahiya romanê têtê avakirin. Wek nimûne di Zeviyên Soro de gelek dem bi kar hatine û dema çîrokbêjyê tevî dema bûyeran bûye. Carna dema bûrî bi kar têt, carin din dema niha. Wek: 'Niha traktor dişewite', 'Niha şik tevî hêviyan bûbû' r.97. Di gel ku di diyalogê de dem ne wisa xuya dike, çiku piştî her peyvekê dinivîse 'Soro got'. Di rîsê dema çîrokê de 'bû' li dijî 'got' têtê berçavkirin, li cihekî din dinivîse: Wan salan heft hezar û pêncsed paqnot, gelek pere bû' r.67. Li vir basa dema bûrî dike, ango dema nivîsandina çîrokê ji dema çêbûna bûyeran vediqetîne û dûr dike. Ji ber vê yekê nivîskar xwe ji romanê derdixe der û li derveyî bûyeran diraweste. Di gel ku li pir deverên din di nav bûyeran de dijî...Ev hemî dibin egera tevlihevkirinê. Roman seranser bi yek awayî bi rê ve naçe û nayê ristin, nemaze ku pirê caran yekser diket nav rûpelên çîrokê... Bi rastî gelek eger û binas li dijî bilindbûna

radeya hunerî ya romanê gihan hev: Peyvên pir gundî û rojane, bikaranîna peyvik û gotinên taybetî 'herêmî', pirkirina kesan di romanê de, li dawiyê dirêjkirineke bêtixûb ya çîrokê û basa doza kurdî û li çend deveran şoreşa Şex Seîd hatiye kirin. Dîse wek kamêre ji ser romanê here ser meseleyên din. Îdara Dewleta tirk: 'Civatê de tiştên wilo, bi cure cure hatine qisekirinê. Lê belê ne erd didane gundiyan, ne jî eşîrên koçer li gundan dihatine biçîkirinê... ya rastî hukumatê neheqî dikir û ewê jî bi xwe re rehetî nehanî' r.141.


Digel vê hemiyê jî em nikarin paşdemana romanê, ji aliyên hunerî ve tenê bikin binasê nivîskar. Û giring e gava em romana kurdî bixwînin, em wê li gor romana cihanî nepîvin...

Dîse ez dibêjim û bawer dikin ku romana Zeviyên Soro karekî mezin e. Ji ber ku romana Zêviyên Soro li demekî hatiye nivîsandin, li wî çaxî huner dihat sarkirin, û mirov bi kotekî dihatin sorkirin! Lê tenê xwezî berî bîst salan bihata nivîsandin û belavkirin...û her û her nivîsandina bi kurdî têrkirina wêjeya kurdî ye û rengînkirina kevala hunerê miletekî kêmhuner e.

-----  
\*Zeviyên Soro. Nûrî Şemîdîn. Wesanxana Kurdistan. Stockholm 1988-313 rûpel.

# Dewleta Dostikî

Di warê huner û wêje û helbestê de



Fehedê Mustefa

## II

**D**ostikî, weku dîroknivîs didin xuanîkirin, mirovine wêjehez bûn. Dikarîbûn di navbera wêjeya hêja û nehêja de cudahiyê hest bikin. Ev bixwe jî bi jiyana wan ve girêdayîye; jiyana ku bi narînî û tenikahiyê hatibû rapêçandin.

Ebû Ezreqê Fariqî dîroknivîsê dewleta Dostikî dibêje: ((Wexta ku Nesir Eldewle guhdariya çend ristên Ebû Newasî kir, ji mêvanên dîwanxaneya xwe re got; Tê bê qey evî helbestvanî li ser jiyana me helbesta xwe ristiye)).

Di dewleta Dostikî de, mirovên zana û hişmend, ramyar û dahêner xwedan cihekî taybetî bûn.

Herwisa Dîwanxaneya mîrên

Dostikiyan ji hozan û helbestvanan vala nedibû. Yek ji wan

helbestvanên ku hergav li wan dîwanxaneyan amade bû; helbestvan Mîr Husên Pêşnewî bû; yek ji helbestvanê herî hezkirî û hîlbijarte yê dewleta Dostikî bû. Helbesta wî ya di pesindana şerê (Bacilayayê) de ku hem pesnê Mîr Bad û leşkerên kurd ên dewleta Dostikî dide û hem jî bi şîngirî li ser kuştina wî radiweste; helbesteke navdar û li ber dilê Dostikiyan pir şêrn û bejinbilind bû.

Helbestvanên biyanî ji hemî herêman dihatin û li dîwanxaneyên Dostikiyan dihêwirîn. Xweşjiyana wan di helbestên xwe de bi gewde dikirin û pesnê Mîr û şahên wan didan. gelek caran rîstevanê Misrê yê herî bi navûdeng Ebû Hesenê Tûhamî xwe li welatê Dostikiyan digirt û helbestên hêja li ser xweşîkbûna xwerist û mirov û jiyana wan diafirandin û xelatên giranbuha ji destê Dostikiyan werdigirtin.

Di warê saz û mûzîkê de, Dostikiyan çêj û sermestiyêke berfireh hest dikirin, bi awakî kûr û balkêşane; hem guhdidanê û hem jî hewl didan ku bi pêş de bibin. Ibin Elesîr dibêje ku di dîwanxaneyê Nesir Eldewle de; nêzî 200 alavên mûzîkê bi hev re beşdarî şevbuhêrkan dibûn.

Mehrebanî û dilovaniya bêhempa ya Dostikiyan ne tenê ji bo mirovan lê ji bo balendeyan jî, dihat bi kar anîn, weku Ibin Elfariqî di pirtûka ((Dîroka Meyafarqîn)) de dibêje: ((Ji Nesir Eldewle re hatibû ragihandin ku balende di zivistanê de ji birçîna dimirin, ewî jî fermana ku gencîneyan vekin û balendeyan bi xwerin bikin, dabû))

Herwisa dibêjin ku Nesir Eldewle bixwe mirovên dewleta xwe dişandin derveyî welêt da ku hînî çêkirina xwarinan bibin û wan xwarinan di metvexên dewletê de bi kar binin ((Serûpê ji Misrê tanîn)) '8'.

#### **Dewleta Dostikî û pirsê penaberan:**

Şaristaniya Dostikiyan û mirovheziya wan û geşbûn û rawestana rewşa siyasî û aborî û civakî û dadperweriya wan jî; û wekheviya hemî ol û rawestana wan a li dijî regezperestî û olperestiyê,

hiştibû ku misilman û êzîdî û fileh di perên vê dewletê de bi kêfxweşî bijîn: Di dewleta wan de, berevajî hemî dewletên misilman ên herêmê '9', gelek serleşker û siyasetmendên mezin ji filehan cî digertin.

Vê yekê hiştiye ku dewleta Dostikî hemî serleşker û siyasetmend û mirovên revyayî, himbêz bike, meh bi meh alîkariya wan a aborî bike, û rîya kar li pêşiya wan veke, ta ku hin ji wan kesan bixwe bûne wezîr; wek wezîrê ((Mexribî)) yê ku ji ber sedemên siyasî ji nav destê Ebasiyan reviyabû. Herwiha yek ji wan penaberên navdar ku xwe avêtibû bextê dostikiyan ((Elmuqtedir billah û diya xwe bûn; ku pişt re dibe xelîfeyê Ebasiyan. Û gelek serokên siyasî yên Romê, û Axa Xan ê Seljûqî, û çendîn zanyar û xelkên dîtir '10')).

Digel biçûkbûna vê dewletê jî, em dibînin, ku gihiştiye asta şarevaniya dewletên wê demê. Ta dema ku Selcokiyan dest bi êrîşa xwe ya li ser herêmê kirin û hemî navçe dagîrkirin hetanî bi xîlafeta Ebasî jî, em dibînin ku Nesir Eldewle peywendiyên xwe yên xweş bi Selcokiyan re neberrîn, bi şarezayî û




bi hişmendî şiyabû dewleta xwe ji êrîşa wan biparêze û rêzdariya xwe jî li ser wan ferz bike. Herwisa hemî Mîrên Dostikiyan piştî mirina Nesir Eldewle jî, hewl didan ku van peywendîyan berdewam bikin û welatê xwe ji dilbijandina Selcokîyan biparêzin.

Lê dema ku Nasir Eldewle Mensûrî şahê dawîn ê Dostikiyan, dema ku şahîtiya dewletê wergirt û lawaziya dewletê di wexta wî de dest pê kir, Selcûkiyan jî dest pê kirin û çavên xwe berdan dagîrkirina wê. Bi taybetî piştî ku Sultan Melekşah ê xwe razî kirin û ew agahdarî dolmendiya dewleta Dostikiyan dikirin, li ser gencîneyên wê, zêrên wê jê re dipeyivîn.

Kêsên ku li dagîrkirina dewleta Dostikî, ji Selcokîyan, sergerm bûbûn, bi hemî awayî hewl didan ku Sultanê xwe ber bi wergirtina biryara êrîşê de, dehf bidin. Jê re digotin: Tu, Sultanê Selcokîyan, tu yê payedar û bêhempa yî, ku deşt û çiya di bin lingên leşkerên te de dihejin, çawan dê ((tizbiya)) Nesir Eldewle aniha ne di destê te de be, çawan dê şûrê ((Mûsik)) aniha teniştê te nexemilîne?




# Ji Weşanên APEC'ê pirtûkên nû



Biha 80 kron




Biha 80 kron



Biha 80 kron



Biha 40 kron



Biha 150 kron



Biha 40 kron

Her kes û dezgehên ku ji 10'an zêdetir pirtûkan  
bikirin, ji % 20 ji wan re erzanî heye.

Her weşanxane an jî kitêbfiroşên ku ji 100 daneyî  
zêdetir pirtûkan bikirin, ji % 40 ji wan re erzanî heye.

Navnîşana xwestinê:  
APEC-Tryck & Förlag  
Box 3318  
S-163 03 Spanga/Sweden


Navnîşana seredanê:  
Spangavägen 345  
Tel: 08-761 81 18  
Fax: 08-761 24 90



Musa!

*Wisa ji nişkê ve  
Tu koça xwe ya  
dawîn ber bi axa sar ve  
bar dikî  
Ji nişkê ve tu birîna kevnare,  
hesreta xoşewîstan di cergê  
xerîban de, hişyar dikî  
Bê xatir xwastin,  
Tu min û bîranînên kovanê  
li ber şûrê mirina xwe diljar dikî*

Pismamê te Xelîl û hevalên wî



## DUGIR

Kurdisk litteratur tidskrift

Box 3437, S-165 23 Hässelby -Sweden

Welato... Ey wêrana me o!

Bi navê te serjêkingeh û girtîxane pir dibin

Û li ser gerdena te bazirgan û golik û derewînên serkeftinê cirêdê dikin.

Tu birçîbûn û stuxwariyê, bêrûmetiyê pêşkêşî me dikî

Em jî helbestvanan û koleyan û miriyan:

zarokan û şehîdan û sirûdên dibistanê

Stiranê û kulîlkê, diyarî te dikin...

Û her tiştî welato!

Û her tiştî welato!

Û her tiştî welato!

Em xwîna xwe li hevûdû dabeş dikin

Û em goristanên te jî,

toza te jî,

zikreşiya celadên te jî,

li hevûdû dabeş dikin

Ey welat!

Ey afirandina narîn;

Ey aferandina ku ji alî dizan ve

bi bêbextî ketiye hustê me, daku me pê dagîr bikin

Alên xwe ji çermên me çêdikin

Û ji xwîna te jî sterk û medaliyên li ser sîngên xwe çêdikin .



**Angelo SANTO**